# Mele Ehmedê Qoxî

## RÊBERÊ SANÎ

## ŞERHA EQÎDEYA EHMEDÊ XANÎ



Guhêrtin Ji Tîpên Erebî:

ZEYNELABÎDÎN ZÎNAR

Weşanên Dengê Yekitiyê

YEKÎTÎYA DEMOKRATÊN KURDÎSTAN

Institut kurde de Paris

LIV. K. L. 1642
18/04/2017
240 QOX REB

Weşanên Dengê Yekitiyê

Navnîşana Xwestinê:

UDK e.V.
PF 3219
4030 Ratingen 3

West-Germany

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

Weşanên Dengê Yekitiyê, Beşê Wêjeyî 2
Şibat 1990 , Düsseldorf-ĞElmanyaya-Fed.
Weşanxone: Weşanxana Xweyî - Düsseldorf
Verlag : Selbstverlag-Düsseldorf

MELE EHMEDÊ QOXÎ

RÊBERÊ SANÎ

ŞERHA EQÎDEYA EHMEDÊ X A N Î

Guhêrtin Ji Tîpên Erebî:

ZEYNELABÎDÎN ZÎNAR

Institut kurde de Paris

Weşanên Dengê Yekitiyî

YEKÎTÎYA DEMOKRATÊN KURDÎSTAN

Wêneya Serpêçê: Matrakçı Nasuh, Sedsal 16.
Bedlis, Beyan-ı Menazil-i
Sefer-i İrakeyn, Xwerû li
Topkapı Müzesi İstanbul

TITELBILD: Eine Ansicht von Bedlis, 16 Jhd.
A Wıev from Bedlis, 16 th Centry

# PÊŞGOTÎN

Nivîskarê hêja kek **Zeynelabîdîn** di meha şibatê,sala 1953 de li Qubînê/Beşîrî hatiye dinê. Di wê demê de,bavê wî li wir meletî kiriye. Ta deh-danzdeh saliya xwe li ba bavê xwe xwendiye û paşê di medreseyên din de jî li ber destên zaneyên bi navûdeng,wek Mele **Sedredîn** û Mele **Evdirehmanê Nisro** feqitiya xwe domandiye. Di 24 hezîranê 1968 de ezmûna (îmtihan) dibistana bingehîn daye û li Diyarbekirê çûye dibistana "îmam hatîbê". Piştî 12 avdarê 1971 ji dibistanê hatiye avêtin. Li Batmanê dest bi dibistana "navîn a petrolê" dikê. Ligel xwendina xwe jî,di gundan de meletiyê dike.

Di 25.7.1974 de,li Batmanê,di bele-
diyê de dibe tehsîldar. Di navbera
salên 1976 ta 1980,li Batmanê
xwendina lîseya êvaran dike û di
belediye û maliyê de jî berpir-
siyarine giring heldigre ser xwe.
Piştî serdestiya leşkerî,di 12 îlonê
1980 de ta 1984,ew heyşt caran
dihête girtin. Bi tenê,di sê gir-
tinan de 178 rojan dihête îşken-
cekirin. Di 1 avdarê 1984 de,bi
biryara dadgeha leşkerî,li Diyar-
bekirê,hêjmar 1,sizayê 5 salan gir-
tîgeh û 20 rojan jî dûrxistin
distîne.. Jiber metirsiya girtin û
lêdanê nivîskarê me bêgav (mecbûr)
dibe ku derkeve derveyî welêt. Niha
li Siwêdê dijî..
Tîpguhartina "RÊBERÊ SA-
NÎ"ya Mele Ehmedê
Qoxî,ku li ser
"EQÎDE"ya EHMEDÊ
XANÎ hatiye nivîsin, ji tîpên
erebî bo latînî,xebateke gellekî
giranbiha ye û bi hezaran kes dê
bigêhin dilxweşiya xwendina vê ber-

Institut kurde de Paris

hema hêja.

Bêguman,ev tîpguhêr û yên din zor giranbiha û pêwîst in. Ev karûbarana wêjeya gelê me ji wendabûyinê diparêzin û dewlemendtir jî dikin. Em li vir,bi dilgermî spasî nivîskarê hêja kek **Zeynelabîdîn** dikin ku serfiraziya weşandin û derxistina vê berhemê pêşkeşî me kir.

Abidîn Sönmez

""""""""""""""""""""""""""""""""""""""""""""""

Pirtûkên ku Nivîskar **bi xwe** nivisîne:

1)İşkencede 178 Gün,KOMKAR,Köln 1, sala 1987

2)Xweçe I,II,III,bend I,di çape de ye û 287 rûpel e.

3)Mîrate,Leyztikên Kurdî,hêj çap nebûye.

-Yên ku ji tîpên **erebî** guhêr-tine tîpên **latînî**:

1)Mewlûda **Melê Batê**,Roja Nû Stockholm,1987

2)Mewlûda **Mele Zahîdê** Diyarbekrî

3)Nûbara **Ehmedê Xanî**,Roja Nû,1986

4)Eqîdeya **Ehmedê Xanî**,digel şerha Rehberê Sanî,Yekitiya Demokratên Kurdistan,1989

5)Sirmehser,Yekitiya D.Kurdistan, 1989

6)Mirsd-ul Etfal a Şêxê Kerbela

7)Dîwançeya Şêx Eskerî

8)İqdê Durfam a Şêx Eskerî

9)Dîwana Pertew Begê Hekarî

10)Nehc-ul Enam a Mele Xelîlê Sêrtî Weşanx.Kurdistan,Stockholm,1988

11)Nimûne,Ji Gemcîneya Çanda Qedexekirî

---

Yên ku ligel Mîrza M.Emîn **Narozî** guhêrtine latînî:

1)Dîwana Meleyê Cizîrî,Roja Nû,1987

2)Dîwana Ruhî ya Şêx Evdirehmanê Axtepî,Jîna Nû,Uppsala,1988

3)Rewdneima Şêx Evdirehmanê Axtepî

4)Dîwana Şêx Kerbela

---

Institut kurde de Paris

## PÊŞGOTIN

Ev pirtûka bi navê RÊBERÊ SANÎ, şerhek e ku ji aliyê Mele Ehmedê Qoxî ve li ser EQÎDEya Ehmedê Xanî hatiy nivîsîn.
Rêberê Kurd û Kurdistanê Xaniyê nemir li pey xwe ji me re sê heb pirtûkên granbiha diyarî hiştine. Pêşî E.Xanî ji bo fêrbûna zarûkan di rêça zimên de NÛBARê, ji bo libîranîn û pêagahdarkirina mezinan ji serpêhatiyên berê û danasîna çanda Kurdî MEM Û ZÎNê û ji bo têgihîştina oldaran û danasîna baweriya ola îslamê jî EQÎDE, nivîsîne. Herweha tê gotin ku, wî dîwaneke hebestan jî nivîsîye. Lê mixabin heta bi îro jî, ew dîwan nehatiye dîtin.

Ehmedê Xanî, di sala 1651 ê de ji dayik bûye û di sala 1706 an de jî çûye dilovaniya xwe. Navê bavê wî Ilyas e, navê bapîrê wî Rostem e û tê gotin ku li gundê Xanê hatiye dinê, ku li herêma Hekariyê ye. Herweha eşîra wî jî bi navê "Eşîra Xanîyan" navdar e. Lê malbata wî, yan jî tê gotin ku eşîra wî, ji wir koç kiriye û çûye li Bazîdê bi cî bûye.

Dema ku Xanî dest bi nivîsandina eseran kiriye, temenê wî 14 sal bûye. Û ji malikeka wî tê zanîn, ku wî di nozdesaliya xwe de dest bi berpirsyariya doza netewî kiriye. Weha gotiye:

**"Ez çar û neh û şeş bûm**
**Min tekye bi balîn da"**

Xanî, bi xwe li Bazîdê rûdinişt û li wir mizgeft û xwendegeh ava kirine. Di Xwendegehê de dersa feqe û şagirtan

Institut kurde de Paris

daye û ji kîsê xwe, ew xwedî kirine.
Di pey dilovaniya wî de jî, di xwendegeha wî de li dersdan û xwendinê hatiye domandin û peyrewan li pey şopa wî domandine.
Gora Xaniyê nemir, li tenişta Mizgefta wî ye û heta bi roja îro jî, ew der ji gelê Kurd re ziyaretgaheke bi nirx û granbiha ye û pir jî bi nav û deng e.

Belam Xanî, çewa ku di welêt de herweha li derve jî pir nav û deng daye. Ji Kurdan çi piçûk, çi mezin tev wî dinasin û jê re serî ditewînin. Herweha gelek dîrokvan û lêkolên dinê qala wî kirine û rojnamevan, nivîskar û rewşenbîran li serê nivîsîne. Hin ji wan ev in, ku me li jêr nivîsîn:

Nivîskarê Kurd mamoste Eladîn Secadî weha gotiye:
"Pêxemberê hozana milelî, serokaniya edebê Kurdî û baweriya Kurdî ji Kurdan, Xanî ye."

Herekol Ezîzan weha gotiye:
"Xanî digote Kurdan 'Berî her tiştî hûn Kurd in, nekevin bin destê miletê dî'. Neku li Rohilata Navîn û Navrast, lê li Ewrûpayê jî xelk hêj li milet û li nijadê hişyar nebûbûn."

Orbîlî weha gotiye:
"Eger em hizr û bîra welatparêziya hozanvanan bikin, bêhemdê xwe emê navê sê heban bêjin. 1- Firdewsiyê Iranî, 2- Rostavilê Gurcî, 3- Xaniyê Kurd."

Seydayê Hemze Beg weha gotiye:
"Seydayê Xanî, xwedanê bîrtijî û huşmendî, desthatin û jêhatî, şehsiwarî û fêrisiyê di zanistêt olî û ayînî de, di layêt fîlozofiyê da, ku çendî bêjî di nav miletê Kurd da navdar

Institut kurde de Paris

e."

Basili Nikîtîn weha gotiye:
"Eger Ehmedê Xanî di şûna qirnê ku tê de jiyaye, di qirnê 11-12 an de bûna, wê Kurd ne di rewşa ku îro tê de dijîn de bûna, belkî wê di rewşeke xweştir û baştir de bûna."

Mamoste Sadiq Behaedînê Amêdî weha gotiye:
"Seydayê Xanî hindî bêjî zana, rewşenbîr, dana, hêja, şehreza û pispor bûye; di kultûr, di tewr û şehristayiya Rojhilatê de, ji Farisî û Erebî bigre heta ku digehiye zimanê Tirkî. E.Xanî gelek ji Heyva Çardeşevî di meha kewçirê da rohn û rewşentir e di asîmanekî qal û şîn de."

Bêguman Ehmedê Xanî ji bo gelê xwe pir derd û kul kişandine û bi zimanê netewê xwe pir tişt nivîsîne, hanîne zimên. Xasma di Mem û Zînê de bi rewşeka vekirî û aşîkar gotiye:

**"Kurmancî ne pir di bêkemal in**
**Emma di yetîm û bêmecal in**

**Bîl cumle ne cahil û nezan in**
**Belkî di sefîl û bêxwedan in**

**Ger dê me jî hebuya xwedanek**
**Alî keremek letîfe danek**

**Çi bikim qewî kesad e bazar!**
**Nîne ji qumaşî ra xerîdar!"**

EQÎDEya Ehmedê Xanî, bi temamî 73 beyt in. Tevê malikan bi kêş û qafiye ne û rêz bi yazde kiteyan dikişin. Çewa

ku di Kurdistanê de, herweha di nav miletên din ên bisilman de jî, Eqîde giranbihatiya xwe diparêze û her kes qedr û qîmet didin wê.

Me, Eqîdeyê digel şerha wê, bi temamî ji tîpên Erebî wergerane tîpên Latênî. Û wergerandina nivîsara beytên Eqîdê, li ber du çapan tekûz kir.
Çapek, destnivîsa Mele Mihemedê Wanî ye, ku wî di sala 1885 an de nivîsîbû û di sala 1903 an de jî, ku ji aliyê dewleta Elmanîya Rojava ve, di meha Çiriya Paşî de bi navê "Kurdisch Texte" li çapê ketiye. Di wê çapê de, beytên Eqîdê 73 ê ne. Herweha gelek destnivîsên din jî tê de hene. Ew destnivîsên Kurdî, tev bi wênekêşiya xwe ya orîjînal hatine çapkirin.
Çapa din jî, ya Mele Ehmedê Qoxî ye. Qoxî, li ser wê ev Şerh nivîsîye û di 16 ê Sibata 1984 an de çap kiriye. Lê belê di çapa wî de sê beyt ji Eqîdê kêm in, yanî 70 beyt in û 78 rûpel e.

Lê belê ew hersê beytên ku di çapa Qoxî de nîn in, me wan ji Çapa Destnivîs wergirt û her yekê, li gor rêzê, di şûna wê de nivîsî. Û me ji tevên malikan re reqem nivîsîne. Ew hersêkên ku di Şerhê de nîn in ev in: Nimra 6, 40 û 49.
Û me beytên di herdu çapan de, rûqalê hevdu kirin. Di navbera wan de, newekhevî pir hindik heye. Yên ku hene jî, me herdu awayan nivîsî. Lê me ji xwe re di vî karî de, Çapa Qoxî asas girtiye. Çimkî wî şerheke drêj li ser helbestên Eqîdê nivîsîye û yeko-yeko mana wan beyan kiriye.

Mamoste Qoxî, nivîsandina Şerha xwe weha saz kiriye: Bêjeyek yan hevokek ji beytên Eqîdê girtiye nav kevanekan û mane kirine (Lê belê me di nivîsara xwe de, wan ji nav kevanekan derxist û bi tîpên cuda nivîsî). Li ser rastgotina

Xanî, ji hin pirtûkên Şerî'etê, hedîsan, tefsîran û hwd jêderk anîne û gelek peyvên merivên navdar û delîlên eqlî jî nivîsîne. Û navê gelek pirtûkan û nimra rûpelên wan nivîsîye.

Lê Qoxî, di Şerha xwe de gelek bêjeyên Erebî bikaraniye. Me jî, mana hin ji wan nivîsî û xiste nav kevanekan. Li pişt wanên wisa, tîpa "w" heye. Ji bo xwendevan zanibin, ku ew not ên me ne

Di Şerhê de hin hevok û bêjeyên ku pir hatine tekrarkirin û bi zmanê Erebî ne, me kinatiya wan bi tîpên Latênî weha nivîsîye:

"Sellellahu 'eleyhî we selle" (Selat û silavên Xwedê lê bin, yan lê be) bi "sew".

"'Eleyhîs'selam" (Silav lê be, yan li wan be) bi "es".

"Rediyel'lahu 'enhu" (Razîbûna Xwedê lê be, yan li wan be) bi "re".

"Kerremel'lahu wechehu" (Xasê bi Hz. Elî ve ye, bi mana Xwedê ruwê wî qenc bidêre) bi "kw".

Belam di nivîsarên bi tîpên Erebî de, qaydeyekî resmî tune. Ev pirtûk bi xwe jî, wisa ye. Herweha îşaretên niqteşaniyê jî tune ne, yan pirkêm in. Îcar tiştên wisa ku di vê nivîsa me ya bi tîpên Latênî de hene, bi piranî me ew danîne. Û dibe ku wan bi xwe re hin şaşî jî hanîbin! Eger tiştên were hebin, hêvîdar im ku xwendevan li me biborin.

Herweha ji bo giranbihatiya Xanîyê nemir, me beytên Eqî-

Institut kurde de Paris

dê -tenê helbest, ji Çapa Destnivîs fotoqopî kir û pê re da çapkirin.

Amaca me ji wergerandina pirtûkê, ji tîpên Erebî bi tîpên Latênî ev e, ku em wê pêşkêşê xwendevanên Kurd bikin û bi xortên nûhatî bidin naskirin. Herweha, pirtûkê ji mirina timî jî bifilitînin.
Ev karê me, her çiqas hindik û piçûk e, bi umîd im ku wê hin tîrêj bide çand û zimanê Kurdî. Lewra hem pirtûkek bi tîpên Latênî nû derdikeve holê û hem jî pirtûkxana Kurdistanê dewlemedtir dibe.

20.12.1986
**Zeynelabidîn Zinar**

Institut kurde de Paris

## REHBERÊ SANÎ
## ŞERHA EQÎDA XANÎ

Bîsmîllahîrrehmanirrehîm
El hemdu lîllahî rebbîl 'alemîn. Wes'selatu wes'selamu 'ela seyyidîna Muhemmedîn xatem-ul enbiyaî wel murselîn. We 'ela alîhî we sehbîhî ecme'în. Amîn ya Rebb-el alemîn.
(Xeysetên rind ji wî Xwedayî re bin, ku mezinê her tiştî ye. Daxistina xwşiyê digel mezinahîyê û qencî li ser mezinê me yê Mihemed bin, ku ew yê dawî ye ji tevê pêxemberan û resûlan re û li ser al û sehabiyên wî tevan be. Xwedê heşra me di bin siya mehdertiya wî de roja qiyametê bike. Tu qebûl kî ya xwedanê her tiştî-w)

1- Li ba te muheqqeq bitin ev cewab
Duhî gote min hatifî bê hîcab:

2- Se Ehmed sena ke bi qewlê sehîh
Li tewhîdê Barî bi lefzê fesîh

LI BA TE: Li nik te, ya kesê ku ez jê re xeber didim.
MUHEQQEQ BITIN: Bira muheqeq be, şubhe tê de nebe.
EV: Yanî ev telîfa min û nezma ku di 'Ilmê Tewhîdê de ye.
CEWAB: Yanî ev nezma bi vî terzî, cewab e. Ez pê cewaba sailekî xeybanî didim. Lewra
BÊ HÎCAB: Bê perde. Yanî bê şibhe.

SE EHMED: Em rastê mana "se" nehatine. Lê meqam

Institut kurde de Paris

dixwaze ku bi mana "Ya" be. (Di zmanê Hind-Ewrûpî de "se-sa" propozisyonek e, ji dema ku hêbê re tê bikaranîn-w).
SENA KE: Xeber û peyva qenc bike.
BI QEWLÊ SEHÎH: bi gotinê muteber, ku zeif tê de nibin.
LI TEWHÎDÊ BARÎ: Li ser tewhîda Xwedayê ku xaliqê 'alemê ye. Yanî qenc xeber de di heqê îsbata wehdaniyetê de.
BI LEFZÊ FESÎH: Bi lefzê ku xweşik e di bihîstinê de.

Tu bizan! "Tewhîd" di luxet de, bi mana hikimkirina bi yekîtîya tiştê ye. Di şerîet de, bi mana xaskirina 'îbadetê bi Xwedê ve digel î'tîqada yekîtîya wî û tesdîqa ku Xwedê te'ala di zat û sîfat û 'efwa xwe de yek e. Tewhîd, di îstîlaha Ehlê Kelamê de: 'Ilmek e îqtîdar pê çêdibe li ser îsbata 'eqîdeyên dînîye, ku têne kesbkirin ji delîlên yeqînî.

3- Xwedê yêk e bê hevrî û bê heval
Ne me'zûlî ye ne mirin ne zewal

4- Ne esl û ne fesl û ne da û ne bab
Heyîn wî heyîna wî nabit hîsab

(Di Çapa Destnivîs de: "Heye û heyîna wî nabit hîsab" e-w).

HEVRÎ: Heval.
NE ME'ZÛLÎ YE: 'Ezilbûn ji Xwedê te'ala re tune, her xweda bû, wê her xweda be.
NE ZEWAL: Ji kemaliyetê zail nabe, nuqsanî lê çênabe.

Institut Kurde de Paris

NE ESL: Kokeka ku Xwedê te'ala jê be tune, çi madde çi sulale.
NE FESL: Tiştkî ku ji Xwedê te'ala be tune, çi zuriyet çi xeyrê wê.
HEYÎN WÎ: Yanî hene jê re.
Ev lefz, bi menzila xeberê ye ji bo heft nefyê pêşî. Yanî vana tev ji Xwedê re ne hene, yek ji wan jî jê re nînin.
HEYÎNA WÎ NABIT HÎSAB: Yanî hebûn û wucûda Xwedê te'ala bê hîsab e. Tefsîla bêhîsabiyê di van hersê beytê hatî de ye.

**5- Ji bo wî çu nîne cîhat û mekan**
**Ne manend û misl û ne hemta, nîşan**

**6- Mekanan mebîne ji bo wî rewa**
**Nîhayet 'elel 'erşî qed îstewa**

**7- Li wî ra neborîne weqt û zeman**
**Ne sal û ne mah û ne hîn û ne an**

**8- Ebed wê hebîtin ezel her heye**
**Di dunya û 'uqba xwedanê me ye**

CÎHAT: Aliyan, (Yanî, teref-w).
MEKAN: Cih, der.
Ferqa "cîhat" û "mekan" ev e: Cîhet, tê qesdkirin ku nêzbûn bi bal ve çêdibe. Mekan, tê qesdkirin ku hisûl û qerargirtin tê de çêdibe. Cîhet cihê paşiya hereketê ye, ne ku hereket tê de sehîh e. Kitêbê Eqîdê dibêjin:
- Gotina 'amiyan ku dibêjin "Xwedê li her derê heye", lazim e men' bibe. Lewra wehma hulûlê jê tê kirin ah. 'Amî jî nezan in, wê zen bikin ku Xwedê bi zatê xwe li her derê

Institut Kurde de Paris

ye. Bîr nabin ku me'na wê: Xwedê te'ala bi 'ilm û zanîna xwe li her derê ye, yanî 'ilmê Xwedê bi her tiştî heye. Çewa ku murada Mecnûn jî wusa ye:

"Eya Rebbe Leyla ente fî kullî mewtînîn
We entel'lezî fî rehmetîl'lahî etme'û"

Îmamê Bergewî ji "Tatarxanî"yê neqil kiriye:
- Kesê ku bêje: Ya Reb, ne tu xaliyê ji tu mekan î, ne tu mekan ji te xalî ne, ew kafir dibe. Lewra îsbata mekan ji Xwedê re dike ah.

Mu'tezîlî dibêjin:
- Xwedê di temamê mekana de ye bi zatê xwe!
Delîla wan, ayeta "......" Yanî wî xwedayê wisa, ku di asîman de îlah e û di erdê de îlah e.

Ehlê Sunnetê dibêjin:
- Mana ayetê, yanî eserên rebîtîyê û meşandina emrê Xwedê te'ala di asîman û erdê de ye. Ema bilinkirina destan bi jor ve, lewra asîman qîbleya du'a ye. Çewa ku Ke'be qîbleya limêjê ye. Yanî lewra qehra Xwedê li ser 'îbadê wî heye, xwe zelîl nîşan didin shh.

'Izz Binu Ebdus'selam gotiye:
- Ne kafir e, kesê ku cîhetekê ji Xwedê re îsbat bike!
Bacûrî jî pê razî bûye.

Newewî gotiye:
- Eger ew kes ji 'amîya be, ne kafir e!

Hinka gotiye:
- Eger ew cîhet, ê jor be ne kafir e. Eger ê jêr be, kafir

dibe. Lewra kêmanî tê de heye.

NE MANEND: N îne misil.
HEMTA: Nezîr.
Firqa "misl" û "nezîr"ê ev e: Mislê tişt, ê ku wek wî ye bi her hawayî. Nezîrê wî, ê ku wek wî ye di zatê wî de.
NÎŞAN: Ji Xwedê te'ala re nîşan tune. Lewra nîşan ji bo naskirina tiştekî ji navê emsalê wî ye. Ji Xwedê te'ala re emsal nîn in.

(6- Ev beyt di REHBERÊ SANÎ de tune. Dibe ku di çapê de hatibe jbêrkirin. Me ew ji Çapa Destnivîs wergirt. Sedemê tunebûna wê di Çapa Qoxî de, gumana zêdetirîn ev e: Xaniyê nemir ku tê de gotiye "Nîhayet 'elel 'erşî qed îstewa", yani Xwedê li ser asîman misêwa-sekinî ye. Li gor dîtina hinek rêçikên olî, bi vê beytê cih ji Xwedê re kifş dibe. Û dibêjin ku ciyekî kifş jê re tune. Ji ber hindê ez bawer in, ku ev beyt bi zanîn jê hatiye derxistin-w)

LI WÎ RA: Di ser Xwedê re, WEQT Û ZEMAN:
Elî Qarî gotiye:
- Me'na herduwan yek e. Lakin belkî Şeyx (Ehmedê Xanî - w) îrade kiribe bi wext, zemanekî mu'eyen û bi zeman zemanên muxtelif e.

Se'dedînê Teftezanî (Tevdezanî-w) gotiye:
- Zeman li ba me îbaretê ji mutecedidkî ye, ku mutecedidkî dî pê tê teqdîrkirin.
Mutecedid: Tiştê ku dibe. Wekî niha "Ez rojhilat hatim", hatin mutecedidekî wehmî ye. Hilatina rojê mutecedidekî me'lûm e. Hatin bi hilatinê hate teqdîrkirin ah, beraberiya hatinê bi hilatinê re zeman e.

Institut kurde de Paris

Feylesof dibêjin:
- Zeman, gera felekê ye, li kullê hala, zeman mexlûqê Xwedê ye di ser mexlûqa de diçe, di ser çi de here muxeyer dibe, Xwedê ji tu zemana cuda nabe naqete, nabe ku di ser de herin.

EZEL: Tiştê ku serî ji ewilê wî re tune, wek qedîmî. Lewra di luxet de navê wî tişt ku dilê meriv ji teqdîrkirina bedayeta wî teng dibe hatiye girtin ji ezelî bi mana tengîyê.
EBED: Tiştê ku paşî ji axirê wî re tune, wek beqayê. Lewra di luxet de, navê wî tiştê ku dil direve ji teqdîrkirina nîhayeta wî, hatiye girtin ji "'Ubûdî"yê, bi mana nefret. Temamê 'alemê ne ezelî ye, ne ebedî ye. Însan û milyaket ebedî ne, ne ezelî ne. Î'dama hewadisa ezelî ye, ne ebedî ye. Xwedê te'ala ezelî ye û ebedî ye.

Eb-ul Beqa gotiye:
- Nebêjin, Xwedê di ezel de hebû! Lewra divê ku Xwedê te'ala zemanî be.
Yani ji wicuda wî re zeman hebe, haşa wekela!

**9- Ewî aferandin em û cumle xelq**
**Nehin xeyrê wî qet çu xaliq bi heq**

**10- Resûlê di wî cumle heq in temam**
**Xusûsa Muhemmed 'eleyhîs'selam**

**11- Ku serdefterê cumle 'alem ew e**
**Nubuwwet xwe mektûb e xatem ew e**

**(Di Çapa Destnivîs de ev malik weha ne:**
**9- "Ewî aferînand me û cumle xelq**

Nehin xeyrê wî qet tu xaliq bi heq".
11- "Nubuwwet e mektûb û xatem ew e"-w)

AFERANDIN: Îcad kirin, xuliqandin. "Nûn" ji bo cem'ê ye bi î'tîbara ecnas û efradê 'alemê ne.
NEHIN: Nîn in.

RESÛLÊ DI WÎ: Wacib e ku em tesdîqa temamê resûlan bikin û î'tîqad bikin ku Xwedê te'ala wan şandiye ji bo meslîheta îbada, hem dînî hem dinyewî. Lewra kesek bi eqlê xwe nizane sewabdana ehlê ta'etê bi cennetê û 'ezabdana gunehkaran bi cehennemê beyan bike, ku resûl nebêjin. Hem wacib e em î'tîqad bikin ku şandina resûla li ser Xwedê te'ala caiz e, ne wacib e. Welakin hikmeta Îlahî dixwaze şandina wan. Lewra meslîhet tê de heye. Gerçî Xwedê te'ala ne muhtacê wî qasî ye.
XUSÛSA MUHEMMED: Nexasim Mumemmed-ul Mustefa sew, naskirina wî bi resûltiyê û hiskirina wî û zanîna wî, heyata wî digel mu'cîzat û şemailê wî li me lazim e bêhtir ji naskirina hemî resûlê dî. Lewra eşrefê mexlûqa ye.

Çewa ku (Ehmedê Xanî-w) gotiye:
SERDEFTERÊ: Yanî kesê ku navê wî di serê defterê de nivîsandî ye, berîya navê her kesî. Ji ber ku şerefa wî bêhtir e.
Xwedê te'ala gotiye: "......" Yanî hûn ya Muhemmed, qenctirê ummeta bûn li nik Xwedê.
Qenctiriya vê ummetê, ji bo kemaliyeta dînê wê ye. Ew jî bi sebeb kemaliyeta Pêxember e sew.

(Pêxember-w) gotiye: "Ena ekrem-ul ewwelîne wel axerîne 'elel'lahî we la fexre". Rewah-ul Tirmizî.

Gotiye: "Ma mîn nebîyyîn yewmeîzîn Ademu fe men sîwahu îlla tehte liwaî". Muslim û Ebû Dawud.

NUBUWWET XWE MEKTÛB E: Nebîtîya wî (Mihemed Pêxember-w) nivîsandî ye. Yanî 'elametê nebîtiya wî muhrek e, bi terzekî 'ecêb hatibû nivîsandin, nexşkirî bû, di nav milê wî de li alê çep, di hember dil e. Di şiklê wê de xîlaf heye, bi vî terzî:
Wek esera hicamê, yan wek bişkoja çadirê, yan bişkoja sitara text, yan wek hêka kevokê, yan wek çar tiliyê girtî di kefê de. Yanî şanekî reş yan kesk bû, li ser nivîsandî bû: "Muhemmedun Resûlul'lahî", yan "Ellahu wehdehu la şerîke lehû", yan "Sir, fe entel mensûru".
Sebebê îxtîlafê ev e: Ku Muhra Nubûwwetê carna bilind dibû, carna nizm dibû, carna fireh dibû, carna diciviya, carna xet lê pir dibûn, carna kêm dibûn, li gora haletan û tecellîyatan her yekê di haletekî de didît.
Sebebê ku li alê çep bû ev e: Ku şeytan xirtoma xwe di nav milê însan radike ji alê çep digehîne dil. Wexta meriv zikrê Xwedê dike bi paş ve diçe. Muhra Nubuwwetê, sîpera wî mel'ûnî bû.

'Iletê ku Muhra Nubûwwetê di nav herdu mila de ye, tê zanîn ji neqla Îmamê Dumeyrî di "Heyat-ul Heywan"ê de: Ku yekî ji weliyan ji Xwedê te'ala xwest, ku Xwedê nîşanê wî bide ka çewa şeytan weswese dike.
Xwedê te'ala heykelê însanekî nîşanê wî da, di sûretê cama bilûrê da di nav milê wî de şaneke reş hebû wek hêlînê. Şeytan hat di sûretê xinzîr de, xirtoma wî wek a fîl bû, her terefê wî heykelî teftêş kir, hat navbeyna herdu milê wî, Xirtoma xwe tê rakir ji hember dilê wî ve.
Dema zikir kir, şeytan bi paş ve çû. Ji wî qasî (Şeytan-w) hatiye navdan bi "Xennas". Yanî yê ku bi paş ve diçe. Lew-

ra dema nûra zikrê dil di dil de çêdibe, şeytan bi paş ve diçe. Ji ber ku nav mila, cihê têrakirina şeytan e.
Pêxember sew. hicam li nav milê xwe dixist û emrê xelqê pê dikir. Cebraîl es ew wesîyet lê kir, ji bo madda şeytan zeîf bike û rê lê teng bike. Lewra weswesa wî di cihê xwînê de diherike.

Çewa ku hedîs dibêjin:
"Înneş'şeytane yecrî mîn îbnî Ademe mecr-el demî". (Şeytan di ademiyan de diçe, di ciyê xwînê de dikeve nava wan-w). Rewahu-l Şeyxan.
Pêxember sew hate hifzkirin ji weswesa wî. Çewa ku gotiye:
"E'anenîyel'lahu 'eleyhî fe esleme". We fî rîwayetîn (Di rîwayetê de-w): "Hetta esleme". Rewahû Muslim."

Li ser rîwayeta ewel, yanî "Şeytanê min misilman bû, êdî weswesê çênake". Li ser rîwayeta dawî, yanî "Mûtî' bû ji weswesê geriya, bi sebebê Muhra Îlahî".
Ema Şeytanê Adem, misilman nebû, weswese lê çêkir. Lewra (Namila Adem Pêxember-w) nehatibû muhrkirin.
(Pêxember gotiye-w): "Kane Şeytanî karfîren fe esleme, we kane ezwacî 'ewnen lî. We kaneş'şeytanû Ademe kafîren, we kanet zewcetuhu 'ewnen 'ela xetîetîhî". Rewah-ul Beyheqî, "Rûh-ul Beyan" 7/190, "Tac" 5/233.

XATEM EW E: Yanî yê ku di paşiya pêxembera teva de hatiye, tev pê xetim (kuta-w) bûn û tekmîl bûn her Muhemed e sew. Lewra Xwedê te'ala gotiye: "We xatemen'nebiyyîne".
"Xatem" bi fetha (ziber-w) "t"ê, aletê xitimkirinê ye. Yanî tiştê ku xitimkirin pê çêdibe. Bi kesra (zêr-w) "t"ê, li şeş qîraetê xeyrê 'asim îsmufa'il e. Yanî Muhemmed sew li her-

du qîraetan jî, bi mana ku Muhemmed axirê nebiya teva ye, piştî wî tu pêxember tune.
Çewa ku di Hedîsa Sehîh de gotiye:
"Înne meselî we mesel-ul enbiyaî mîn qeblî, ke meselî recûlîn bena beyten fe ehsenehû we ecmelehû îlla mewdî'e lebenetîn mîn zawîyetîn fe ce'elen'nasû yetufûne bîhî we yu'cîbûne lehû we yeqûlûne hellen wudî'et hazîhî el lebînetu. Qale, fe ena el lebînetu we ena xatem-ul nebîyyîne". "Tac" 3/229.

Sebebê ku Pêxember xatemê enbiya ye ev e: Ku bibe rehmet ji bo temamê 'alemê, umeta wî pir di bin erdê de nemîne, tu umet dê bi ehwalê wan nizanibin, şerî'eta wî nesx nebe.

Werhasil ev ayet fayde dide, ku şefqeta wî li ser umetê zêde ye û umet jî zêde wî mezin didêre. Lewra nebiyê ku piştî wî nebî hebin, dibe ku hinek ji nesîhet û beyana bihêle. Lewra piştî wî têne tedarikkirin. Ema ê ku piştî wî nebî nîn in, hingê şefa'eta wî pir e tiştkî nahêle, tevî beyan dike da ku umet zanibe êdî nebî ranabin.

Kesê ku de'wa nebîtîyê bike, kezab e (derewker-w) û Decal e. Gerçî xarîq-ul'adeta derîne, wekî Şu'bez û enwa'ê sihr û tilisma çewa ku Eswedê Ensî û Museylemetê Kezab dertanîn.
Weharenge hemî kesê ku wisa bike heta roja qiyametê, heta ku temamê kezaba bêne xetimkirin bi Decal, ku wê pir 'ecêb û xewariqan (Piraniya xarîqulade-w) drîne, hemî aliman û muminan şehde bidin bi derewê wî.

Tu bizan! Di "Hel'l-ul Rumûz"ê de gotiye: Kes nikare kîtaba muhrkirî veke ji xeyrî xatimî pê ve. Yanî ê ku muhr lê

daye. Weharenge kes nikare heqîqeta 'ulûmê Quranê beyan ke, îla Xatem-ul Enbiya (Mihemed Pêxember-w).

Hem dema ku xezîna paşa muhrkirî be, kes nikare veke îla xeznedarê ku nîşana paşatiyê lê hebe. Quran jî xezîna hemî kîtabên ku ji cem Xwedê te'ala hatine, hem xezîna hemî 'ulûmê heqîqetên Îlahîye ye. Lewra Xatem-ul Enbiya jê re hate hazirkirin û amadekirin. Ji bo vî hikmetî Muhra Nubûwetê li nav milê wî bû. Lewra xezîna paşa ji alê der ve tê muhrkirin, ji bo mûhafeza hundur.

Xwedê te'ala di Hedîsa Qudsî de gotiye: "Ez xezînekî xefî bûm. Lazim e ji xezînê re mufte û muhr".

Pêxember sew hate navdan bi "Xatem". Lewra Muhra Xwedê te'ala ye li ser xizneya wucûdê. Hem hate navdan bi "Fatîh". Lewra mifteya xizna ezelîye pê tê muhrkirin û tê vekirin. Nayê zanîn çi di xezînê de heye, îla bi xatemê ku mifte ye (Di nivîsa Erebî de "Mifye" nivîsî bû. Diyar e ku rastiya wê "mifte" ye-w).

Xwedê te'ala gotiye: "Min va, ku ez bême naskirin".

Naskirin, hasil bû bi feyza hissî li ser zmanê Hebîb (M.Pêxember-w). Lewra "Xatem" hate navdan bi Hebîbul'lah. Lewra esara Muhrê li ser xizna paşa sûretê hiskirina wî ye, ji bo tiştê ku di xezînê de ye.

Gotine, mana "Xatemun'nebîyyîn" ev e: Ku Xwedê te'ala nebîtîya hemî enbiya kom kir û dilê Mustefa (M.Pêxember-w) gerande me'dena wan û Muhra Nubûwetê lê danî. Da ku dijmin rê nebin ser cihê Nubûwetê, ne hewa nefsê, ne şeytan, ne xeterên xirab.

Ev Muhr ji pêxemberê dî re nibû, ew ji xeteran emîn nibûn. Paşî Rebê alemê ji bo kemala şerefa Mustefa bi danîna Muhrê di dilê wî de bitenê qayil nebû. Belkî di nav milê

Institut kurde de Paris

wî de eşkere kir, ku her kes bibîne. "Ruh-ul Beyan" 7/187-191.

**12- Xwedê aferandin ji bo wî felek**
**Ji bo xizmeta wî şihandin melek**

**13- Ku Qun'an ji 'erşan digel wan hinar**
**Ji bo wî hebîbê xwe yê bextiyar**

**(Dî Çapa Destnivîs de weha ne:**
**12- "Xwedê aferînand..."**
**13- "Ku Qur'an ji 'erşan digel wî hinar**
**Ji bo wî hebîbê xwe yê îxtiyar"-w)**

AFERANDIN: Xuliqand û îcad kir.
FELEK: Bi mana dewr e. Yanî gerra di xeteke grover de, bûye navê tebeqê asîman.
Ev beyt îşaret e bi bal Hedîsa Qudsî ve: "Lewlake lewlake lemma xeleqt-ul eflake". Yanî Xwedê te'ala dibêje: Eger tu nebûna ya Muhemmed, min van erd û asîmanan îcad nedikir.

KU QUR'AN..: Yanî xizmeta milyaketa ji Pêxember re sew bi vî terzî bû, ku jê re "Wehî" anîn, Qur'an nazilê ser kirin, Boraq jê re anîn wî birin Mî'racê û xeyrê wan.
'ERŞAN: Cem'a 'erş e, bi mana tiştê bilind di ser meriv re û bi mana textê padîşah e, bû nav ji 'erşê Xwedê te'ala re. Mirad bi 'erşan, tebeqatê asîman û 'Erş û Kursî û Lewh-ul Mehfûz e, bi î'tîbar texlîba 'Erşê 'Ezîm.
HINAR: Şihand.
BEXTIYAR: Mûbarek, se'îd, xweypara qen.

Institut kurde de Paris

Tu bizan! Tefsîr dibêje:
- Temamê Qur'anê bi hev re di şeva Leyletulqedrê de ji Lewhilmehfûzê nazilê asîmanê ewel bûye. Cibraîl tevî ji milyaketa re xwend, wan jî nivîsand di sehîfan de. Wan sehîfan tev di cihekî de bûn. Jê re (Ji wî cihî re-w) tê gotin "Beyta 'Izzetê". Paşî Cibraîl Emîn es, di zerfê 23 salan de ayet bi ayet nazilê ser Pêxember kir.
Hikmeta wê ev e: Ku asîmanê ewel, muşterek e di navbeyna alema jor û jêr de. Kur'an tev bi hev re hate wê der. Ji bo ku kêfxweşiya Pêxember sew, ku wê tev jê re were. Ji wê der, ayet bi ayet hat, ji bo hogiriya dilê wî û yê umeta wî û rihetiya nefsa wan, teltîfa bi wan. Eger bi hev re bihata, zêdeyê taqetê bû.

**14- Ji bal xwe boraqek ji bo raşihand**
**Lê zînek muresse' ewî rûnihand**

**(Di Çapa Destnivîs de ev maik weha ye:**
**"Ji bal xwe boraqek ji wî ra şiyand**
**Lê zînek mûzeyyen ewî rûniyand"-w)**

BORAQ: Heywanek e ji kerê mestir e, ji hêstirê biçûktir e, navê wê "Boraq" e. Lewra zû diçe wekî berqê (Brûsk-w), yan lewra şewq dida û birq jê diçû hingî spî bû; wechê wê (mîna-w) wechê însan bû, dûvê wê (mîna-w) dûvê xezalê bû, lingê wê (mîna-w) lingê ga bûn, yan deve bûn. Li gor îxtîlafê; cesedê wê cesedê hespê bû, simê wê simê ga bûn, serpişta wê weke durreka spî bû, du bazik hebûn di hêtê wê de, çavê wê kê der didît lingê xwe davête wê der, çewa ku di Hedîsa Sehîh de ye.
Boraq milyaketek e li vî şiklî, ji bo hilgirtina enbiya, çewa ku di yek 'erşî milyaketek e. Yan Boraq heywaneka cenetê

ye, wê dîsa here cenetê.
Gotine: Wê hinek heywanê erdê jî bikevine cenetê. Wuha nezim kirine, "Şehab 'Eleş'şîfa" 1/96:

**"Boraqu şefî-'il xelqî Naqetu Salînîn**
**We 'Îclun lî Îbrahîne Kebşun lî neclîhî**
**We Hudhudu Belqîsîn we Nemletu be'lîha**
**Hîmaru 'Uzeyrîn, Kelbû Kehfîn lî mîslîhî**
**We Hût-ubnî Meta summe Baqûretun lî men**
**Yeburru bî ummîn fî rexahu we mehlîhî**
**Fe hazîhî 'eşrun fîl cînanî we xeyruha**
**Yekûnû turaben yewme heşrîn lî kullîhî"**

(Boraqu şefî-'il xelqî): Yanî Boraqa Pêxemberê me sew, ku şefa'etkroxê temamê xelqê ye di qiyametê de. (Naqetu Salîhîn): Deveya Salih Pêxember e es, pir mezin bû.

Qewmê wî Semûd gotin: "Mûcîzekê nîşanê me bide, devekê ji vî Zinarî derxe".
Salih Pêxember du'a kir, dengê Zinar hat wek dengê deveya ku dizê. Deveka bi hemle (avis-w) jê derket. Paşê za, weledekî wek wê mezin jê re çêbû. Navê wê Deveyê "Kaîbet" bû, ava Bîrê temam vedixwar. Av rojekê ji wê re bû, rojekê ji wan re bû. Roja ku av ji wê re bû, bi şîrê wê îdare dikirin. Lewra wê didotin, firaxê xwe tije şîr dikirin.
Yekî wê (Deve-w) kuşt. Navê wî Qedar bû. Weledê wê (Devê-w) reviya çû, ew Zinar jê re vebû kete hundurê wî (Zinarî-w), lê hate hev. Xwedê wan bire helakê.
('Îclun lî Îbrahîm) Golika Îbrahîmxelîl es. Weqta ku Cibraîl û Mikaîl û Israfîl bûn mêvanê wî, nizanibû ku milyaket in. Ji wan re Golik serjêkir, li ser kevir biraşt û danî ber wan. Dît ku naxwin! Tirsiya go: Qey xaîn in!
Lewra kesê xwarina meriv nexwe, fikra wî xirab e.

(Milyaketan-w) Gotin:
- Netirse! Em milyaket in hatine, ku qewmê Lût bibine hîlakê.
Herema wî (Brahîm-w) Saret (Sarê-w) kêfxweş bû bi hîlaka qewmê Lût û keniya. Milyaketa gotin:
- Mizgînî li te be, wê kurek ji te re çêbibe! Navê wî Îshaq e.
Saret got:
- 'Umrê min not û neh sal e, zilamê min sedsalî ye?
"Ev 'ecêb e" gotin:
- Çewa tu ji emrê Xwedê te'ala 'ecêbmay dimînî?

(Kebşun lî neclîhî) Beranê kurê Îbrahîmxelîl Pêxember e es, Cibraîl anî, ji bo bibe fidya kurê wî yê Îsmaîl es, weqta ku kurê xwe dabû erdê ji bo wî serjê ke. Lewra Şeva Terwiyê di xew de dît, ku yek jê re dibêje: "Xwedê emrê te kiriye, ku tu kurê xwe serjê kî."
Bû sibe, (Brahîm Pêxember-w) vegeriya got: "Ev rehmanî bû, ya şeytanî bû?"
Şeva 'Erefê dîsa wusa dît. Êdî nas kir, ku ji terefê Xwedê ye. Şeva Îdê dîsa wusa dît, qesda serjêkirina kurê xwe kir. Loma navê wan roja bû "Terwiye" û "'Erefe" û "Nehr". Yanî tefekur, naskirin û serjêkirin.

Ew Beran, qurbana Habîl (Kurê Adem Pêxember-w) bû. Cebraîl wî ji cennetê anî. Goştê wî cenawer û teyra xwar. Lewra agir goştê heywanê cennetê napêje. Serê wî (Beran-w) bi Mezrîna Ke'bê ve daleqandin, ma heta zemanê Îbnu Zubeyr, ku Ke'be şewitî.

(Hudhudu Belqîsîn) Dewdewka wê, bûtbûtka wê, ku xebera Belqîs ji Nebî Silêman re anî (Bi Kurmancî ji hudhud re dawidok, silêmanê dinikul jî tên gotin-w).

(We Nemetu be'lîha) Gêrika (mûrî-w) zilamê Belqîs. Yanî Mûrîstanga ku bi Nebî Silêman re xeber dabû li Taîfê, yan li Şamê wexta ku diçû alê Yemenê.
Gotine: Ew Gêrik reîsê gêrika bû, kulek bû du bazikê wê hebûn. Û gotine: Ew Gêrik ji wanê sorê mezin ê siwarî bû, ku bi lez dimeşîn. Kuştina wan heram e, lewra zirara nakin. Ne ji ê reşê ku hêdî diçin, kuştina wan durust e, lewra zirara dikin.

(Hîmaru 'Uzeyrîn) Kerê 'Uzeyr Pêxember es.
Buxtun'neseriyê Zalim girte ser bajarê wan ê Qudsê, zilam kuştin jin û zarûk bi xwe re birin Babîlê. Wê demê 'Uzeyr zarûk bû, tevî wan çû. Piştî ku mezin bû, li kerê xwe siwar bû hat Nehîrê, ku bajar xirabe ye. Dilê wî li serê êşiya, got: Wê çewa Xwedê vî bajarî ava ke! Pirî ku hisret kişand û bêhêvî bû.

Yanî meriv nizane Xwedê te'ala bi çi şeklê şuxla dike û wê bi çi haway ava ke. Lewra qudreta wî pir e, bi her haway heye. Ne ku şik jê re çêbû. Paşî têr fikirî ji dara xwar û selika xwe tije hêjîr kir. Firaqek wî hebû, şîra tirî tê de esirand, kerê xwe grêda û raza. Xwedê ruhê wî û ruhê Kerê wî tev sitend. Heftê salî mirî ma.

Xwedê te'ala paşakî ji Faris bi eskerê wî ve muselet kir hatin bajarê Qudsê ava kirin, ji berê çêtir. Benu Îsraîla dîsa hatin der û dorê bajêr ava kirin, sih salî jî wisa ma. Xwedê nehişt çavê kesî 'Uzeyr es bibîne, cesedê wî muhafeze kir.
Paşî Xwedê te'ala wî sax kir û got:
- Ev çiqas e tu li vir sekinî?
'Uzeyr got:
- Yan rojek e, yan hinik ji rojê ye!

Institut kurde de Paris

Xwedê got:
- Ev sed sal e. Binêre li hêjîrê û şîra te xira nebûne, hem binêre li Kerê xwe.
Nerî ku hestiyê wî spî dikin. Xwedê te'ala Kerê wî sax kir, rabû ziriya. 'Uzeyr got:
- Ez dizanim qudreta Xwedê li ser her tiştî heye.

(Kelbê Kehf) Sehê Şkeftê, ku Qitmîr e. (Lî mîslîhî) ji ê wek xwe re. Yanî ew Sehê wan kesa bû, ku wek wî ehlê Şkeftê bûn, meşhûr in bi navê Eshab-ul Kehf.

(Hûtê Îbnû Meta) Masiyê Yûnisê kurê Meta. Yanî Masiyê ku Yûnis Pêxember es dabeliandibû. Ji qewmê xwe re got, wexta ku îman pê nanîn: "Wê piştî çil rojan 'ezab were ser we."
Qewmê wî piştî sih û pênc rojan 'elametê 'ezab dîtin, tewbe kirin 'ezab ji ser wan hilat. Yûnis Pêxember es dît ku ezab nayê, yekcar ji wan xeyidî, reviya çû li Gemiyê siwar bû û Gemî di pêlê avê de sekinî.
Sebebê wê pirsîn. Yûnis got: "Yekî revoke tê de heye".
Sê cara qur'e kirin. Qur'e li wî ket. Wî avêtin Çemê Dîcle. Masîkî wî dabeliand.

(Baqûretun) Cem'a beqeret e, yanî çêlek. Mirad pê yek e. (Lî men) ji wî kesî re ye.

(Yeburrû bî ummîn) Qencî bi diya xwe dikir, bê gotina wê tiştek nedikir.
(Fî rexahû we mehlîhî) Di halê fireyî û tengiyê tev de qencî dikir. Wî Xortî du cara çêleka xwe bir sûkê ku bifroşe. Fîetê wê ne wek hev bû. Dihat ku ji Diya xwe re bêje: Ez bidim, nedim? Cara sisiya, milyaketekî jê re got:
- Ji Diya xwe re bêje, vê Çêlekê bihêle. Wê Nebî Mûsa es

bikire ji bo saxkirina yekî, ku wê bê kuştin. Bira nede heta ku çermê wê tije zêr bikin.

Dewlemendekî Benû Îsraîla hebû, navê wî 'Amil bû, warisê wî tune bûn ji xwyrê du heb kurmamê wî yê feqîr. Herduwan wî kuştin, ji bo malê wî. Û wî avêtin ber derê gundekî. Paşî dawa heyfa wî (Li wî gundî-w) kirin. Ehlê Gund înkar kirin. Mûsa es du'a kir, got:
- Ya Reb, tu vê ji me re keşf bikî.
Xwedê te'ala got:
- Goştê wê Çêleka wî Xortî li wîyê kuştî bidin, wê sax bibe.

Çûn ew Çêlek kirîn. Çermê wê tije zêr kirin dan xweyê wê. Digel ku qîmetê çêleka, wî zemanî sê (3) zêr bûn. Zimanê wê (Çêlekê-w) weya qaçika wê, lê (Li mirî-w) dan. Sax bû, got: "Herdu kurmamê min, min kuştin". Herdu jî kuştin û wan ji weresê mehrûm kirin.

(Fe hazîhî 'eşrun) ev deh heywan in. (Fîl cennetî) wê bikevin cenetê. (We xeyruha) herçî heywanê dî ji van deha, (yakûnû tûraben) wê bibin ax û xwelî, (yawme heşrîn, lî kullîhî) roja heşra hemî heywanata, ku roja qîyametê ye.

Tu bizan! Xwedê te'ala karibû bê wasîta tişkî, Pêxember sew bighîne hizûra xwe. Welakin melaîketên mezin şand û Boraqê şand ji bo hogiriya wî bi derbasbûna ser adetê û ji bo kerameta wî bide nîşandan. Lewra adetê milûkan ku dişînin pey dostê xwe, hinek xewas û eşrefan dişînin digel heywaneka xweyqîmet bi temamê cihêzên siwariyê ve.
Boraq ne şiklê hespê bû, lewra haletê selametê bû. Ne yê herbê bû. Hem ji bo lezubeza wê ya pir xuya bibe.

LÊ ZÎNEK MURESSE': Li ser Boraqê zînekî neqşandî bi

enwa'ê cewahiran hebû.
EWÎ: Pêxember sew. RÛNIHANDd: Danî ser. Yani Xwedê te'ala Pêxember sew danî ser pişta wê û lê siwar kir.

Tu guhdêre! Hedîsa ku Qazî 'Eyad di "Şîfaê" de rîwayet kiriye ji Enes Binu Malik re di heqê Boraqê d:
"Înne el Nebîyye sew ûtîye bîl Boraqî". Yanî bi tehqîq Pêxember sew Boraq jê re hat, Cibraîl Emîn es jê re anî bi emrê Xwedê te'ala, "leylete 'usrîye bîhî" şeva ku wî birin Mî'racê, "muleccemen" Boraq gemkirî bû, "muserrecen" zînkirî bû.

Îmamê Suheylî gotiye:
- Beriya Pêxember sew, enbiya li wê Boraqê siwar dibûn. Çewa ku Nesaî û Qurtebî û Îbnu Hişam rîwayet kirine. Li gor gotinan ev sabit û sehîh e. Welakin Îmamê Newewî û Îbnu Hecer qebûl nekirine - li ser gotina wan her pêxemberek jê re boraqeke xisûsî hebû. "Festes'ebe 'eleyhî" yanî siwariya wê li ser Pêxember esw zehmet geriya. Lewra Boraqê xwe şimûz kir, piriya ku kêfa wê hat. Yanî ji tirsa ku, wê texsîratî bike di heqê Pêxember sew de. Yan ji bo pê re soz bide, ku di cennetê de jî lê siwar be.

Lê li gor gotina Newewî û Îbnu Hecer: Kes lê siwar nebûbû. Lewra hînî siwariyê nebûbû, loma şimuzî kir. Yan sebebê şimuzîyê ew e, ku Pêxember sew di ber senemekî de derbas bûbû, paşê di fetha Mekê de wî şikand.

"Fe qale Cibrîl" Cebraîl es ji Boraqê re got:
"E bî Mûhemmedîn tef'elû haza?" Tu çewa vê şimûsiyê dikî di heqê Mihemed da?
"Fe marekîbeke ehedun?" Li te siwar nebuye kes? "Ekreme 'elel'lahî mînhu!" ku li cem Xwedê çêtir be ji wî!

Yanî kesekî ku ji Muhemed sew çêtir be li te siwar nebuye?
"Fe erfedde 'ereqen" xwîdan ji Boraqê herikî, ji şerma paşî sekinî, mutih bû.

**15- Boraqê digel Refrefê dest bi dest**
**Bi emrê xwedê ew birin pêşî dest**

BORAQÊ Û REFREFÊ, Pêxember sew dane destê hev û wî birin hizûrê. Boraqê wî teslîmê Refrefê kir, Refrefê wî bire hizûra Xwedê te'ala.

Ev gotina Şeyxê Xanî, wek gotina Şehab e di "Şerha Şîfaê" de, 1/99:
- Ku Pêxember sew dema ji Camiya Qudsê çû asîmana, li ser Refrefê hilkişiya.
Yanî li ser mî'raceke ji nûrê
Ev gotina Şehab divê ku "Refref", Mî'rac e. Yanî nerdiwana nûranî. Eger em wiha nebêjin, wê Şeyxê Xanî bibe tabi'ê wan kesan, ku dibêjin: Pêxember sew tevî Boraqê hilkişiyaye asîmana, heta asîmanê hefta.

Çewa ku Îbnu Munîr gotiye:
- Boraq ji erdê heta asîmanê ewil bi gavekî çû, bi heft gava çû ser heft asîman. Bi mûcibê hedîsa: "Yede'û rîclehû 'înde munteha terfîhî" Rewahu Muslim.

"Zirqanî" gotiye 6/36:
- Gotina Îbnu Munîr, divê ku tevî siwariya Boraqê hilkişiyaye. Ev ne sehîh e.

Şehab û Îbnu Kesîr û Alûsî gotine:

- Qewlê sehîh ew e, ku tevî Boraqê hilkişiyaye, belkî Boraqê li Camiyê (Qudsê-w) grêdayî hiştiye.

REFREF: Di luxet de "bîsat" e. Yanî tiştê ku tê raxistin. Yanî bîsata kesk e, hatiye tefsîrkirin bi tej û xaliya. Mirad pê di vir de, raxistineka kesk e, ji nûrê ye, mezinaya wê ji şerq heta xerb e, di şiklê secadê de ye, hatiye xaskirin bi wezîfa nêzkirina tişta bi bal Xwedê û bi şuxlên ku waqi' dibin di cihê nêz de.
Refrefên ewliya di cennetê de, ji vê Refrefê ne. Yanî bîsatê kesk in. Gava ku li ser qerar (rûdinin-w) digrin, difirin heta cihê ku dixwazin.

Ev Refref, di hedîsa Mî'racê de tune, îla Hedîsa Bezar û Beyheqî ku Îbnu Kesîr di Tefsîra xwe de 3/5 nivîsîye:
"We lutte dûne-l hîcabî Refrefud'durrî we-l yaqûtî" û gotiye:
- Eger ev sehîh be, divê ku Şeva Mî'racê be. Ancax ev Refref di eserê eshaba de ye, ku ayeta tefsîr kirine wekî Ebdullah Binu Mes'ûd.

Di ayeta "......" de gotiye. Yanî Muhemmed sew Refrefa kesk dît; temamê terefa girtibû, hem wekî ku Ebdullah di ayeta: "......" de gotiye. Yanî Refref ji Muhemmed re sew berjêr bû di Şeva Mî'racê de, li ser rûnişt paşê bilind bû, nêzê Rebê xwe bû û (M.Pêxember-w) got: Cibrîl ji min qetiya û temamê denga ji min hatin birrîn û min kelamê Rebê xwe bihîzt. "Qestelanî" 7/320, "Şehab" 2/334.

Tu bizan! Siwarbûna Pêxember sew li Refrefa kesk a nûranî, li Sîdretumuntehayê çêbûye. Çewa ku ji gotina Îbnu Mes'ûd tê zanîn û "Rîsaleyê Mî'racê" dibêjin.

Çewa ku Şehab neqil kiriye, 2/334:
- Pêxember sew dema gihîşte Sîdretulmuntehayê, Cebraîl es jê re Refref anî, wî hilanî û firand bi bal 'Erş ve. Refref merkeba wî ye, çewa ku Boraq merkeb e ah.

Eger em Refrefê bi vî terzî tefsîr bikin, wê gotina Şeyxê Xanî bibe xîlafa sehîhê. Lewra qewlê sehîh li gor hedîsa ev e:
- Pêxember sew ji Camiya Heremê li Boraqê siwar bû, heta Camiya Qudsê li wir peya bû. Boraqa xwe bi Xeleka Derê Camiyê ve grêda.

Çewa ku Muslim dibêje:
- Paşê Cibraîl wê ji Xelekê vekir, anî hat ber Kevirê Mezin, ku di nîvê Camiyê de ye. Cibraîl tiliya xwe di Kevir re kir qul kir û Boraqê pê ve grêda.

Çewa ku Hedîsa Bezzar û Tirmizî û Îbnu Heban dibêje:
- (M.Pêxember-w) Çû hindurê Camiyê, hemî enbiya lê civiyan, li pêşiya wan limêj kir. Paşê Cibraîl es wî hilkişand asîmana heta bire Sîdretulmuntehayê.

Li gor zahirê Hedîsa Buxarî: Weya jê re nerdiwanek anî, pê ve hilkişiyan heta asîmanê ewel, paşê heta asîmanê hefta.

Li gor zahirê Hedîsa Beyheqî û Tibrî:
- Paşê çû Sîdretulmunteha li cihkî bilind û fireh, ku dengê qilmînê milyaketa bihist. Li wir Cibraîl jê qetiya. Wehî jê re hat, Xwedê pê re tekelum kir û limêj li serê ferz kir.

Çewa ku Hedîsa Muslim û Bixarî dibêje:
- Weya li nik Sîdretulmuntehayê Refref jê re hat, lê siwar

Institut kurde de Paris

bû çû hizûra Xwedê.

Çewa Eserê eshaba dibêjin, li kulê hala gotina Şeyx (E.Xanî-w) ne muwafiq e. Îla ku em bêjin: Mana gotina wî "Dest bi dest", yanî Boraqê û Refrefê wezîfa xw rast û durust kirin, ku bi wasîta herduwa Pêxember sew çû hizûra Xwedê, çewa ku kelîma DIGEL (jî-w) dixwaze.

**16- Di heft asîmanan ewî êwerand**
**Bi qabê du qewsan vi bal xwe gihand**

(Di Çapa Destnivîs de weha ye:
"Di heft asîmanan Xwedê ew gerand
Bi qabê du qewsan bi bal xwe gehand"-w)

ÊWERAND: Wenda kir. Bi sebeb ku kete pişt heft asîmana.
BI QABÊ DU QEWSAN: Yanî bi qasê drêjiya du kevana. Îşaret dike ku "Qabeqewseynî" di ayetê de bi mana "Bi qasê du kevana". Yanî "Qab" bi mana qas û mîqdar e. Yanî Xwedê te'ala Muhemmed sew wis nêzê xwe kir, ku di navbeyna wan de bi qasê drêjiya du kevana ma.

Şeyx Fexredînê Razî di "Tefsîra Kebîr" de gotiye:
- Ev li gor adetê Ereba ye. Dema ku du heb mezinê wan sulh dibin, her yek ji wan terefê kevanê xwe dide terefê kevanê hevalê xwe. Di navbeyna herduwan de miqdarê du kevana dimîne. Qewmê wan jî, destê xwe didin hev ah.

Mûcahîd û Hesen-ul Besrî gotine:
- "Qab" navbeyna jîka kevan û qevda wî ye.
Li ser gotina Xufacî îşaret e bi bal adetê Ereban, ku silh

dikirin di beriya îslamê de, ku kevan dertanîn herduwa bi hev dikirin qabê wan bi hev ve dibûn heta ku herdu kevan dibûn bi qabekî tenê, paşê bi herduwan tîrekê berdidan.


Mana wê ev bû, ku yek ji wan ji çi razî be, ê dî jî razî ye. Eger ne razî be, ê dî jî ne razî ye. Li ser vê gotinê, her kevanekî du qabê wî hene, çewa ku Qurtebî gotiye. Hem gotiye: Qab, navbeyna kevan û sîyeta wî ye ah.

Hinka gotine:
- Mirad bi ayetê, yanî bi qasê du qabê kevan e.
"Sîyet" xwarayiya ku di herdu aliyê kevan de ye. Sîyeta jor, destê kevan e. Sîyeta jêr, lingê wî ye.

Şeyx Ebdurehman gotiye:
- "Qabê Qewseyn" yanî miqdarê navbeyna herdu bruwê însan e ah.

Ev gotinê Ehlê Tefsîrê ne. Hinek gotinê dî jî hene, em pê nepeyivîn. Lê çi 'ecêb ku kesek ji 'ulemayê Tefsîrê nîşan nedaye, ku mirad ji "Qabîqewseynî" yanî miqdarê nêzbûna qabê du kevana, ku herdu terefê wan ji alê jîka wan de bigehînî hev heta ku bibe wekî daîrekê, ku nizûl û 'urûc, daketin û hilkişandin tê de bête tesewirkirin. Nîvê daîreyê 'îbaretê ji qewsa wacib-îl wucûd be, nîvê dî 'îbaretê ji qewsa mumkin-ul wucûd be.
Wekî ku Îbrahîm Heqqî beyan kiriye, sûretê wî di dawiya kitêbê de ye. Wê demê merteba "Ew edna" tête tesewirkirin bi derbaskirina serê herdu kevana di hev ra, heta ku jîka herduwa di hember hev de bibe wek xetekê di nezera çav de. Ev tewîl, ji gotinê ehlê Tesewufê tê zanîn. Bihneka wê, ji kelamê Şeyxê Razî tê. Qencê tewîla, ev e.

Institut kurde de Paris



( wêneyê kevan )

Faîdetun! Tefsîra ayeta "......" Ev Ayet, gelek aiman gotine:
- Beyana nêzbûna Xwedê te'ala ji Pêxember re ye.

Lê Cimhûr, aliman otine:
- Beyana nêzbûna Cibraîl ji Pêxember re dike.
"......" Xwedê te'ala nêz bû, yan Cibraîl Emîn nêz bû bi alê Pêxember ve sew. "......" daket bi alê wî ve, weya bêhtir nêz bû.
Eslê "......"yê, dirêjbûna ji jor ve, çi hissî çi manewî. Tedeliya Cibraîl: Dema ku Muhemmed esw wî li ser sûretê heqîqî dît, jê tirsiya. Cibraîl ket sûretê însan û hat, wî da ber singa xwe heta tirsa wî sekinî. Yan "dena", yanî Muhemmed sew nêzî Rebê xwe bû.
Çewa ku Îbnu Ebbas gotiye:
- "....." bêhtir nêz bû. "Fe kane qabe qewseynî" miqdarê mesafa nêzbûna wî, bû wek miqdarê mesafa qabê du kevana, yan wek miqdarê mesafa du kevana.
"Ew edna" yan nêztir.
"Ew" ji bo tehqîqa qederê mesafê ye, ne ji bo şikê ye. Wek ayeta: "......" Yanî ne kêmê sed hezarî bûn, belkî zêde bûn.

Ema nêzbûna Xwedê te'ala bi bal Pêxember ve sew tê tewîlkirin bi nêzbûna manewî û qedandina meqsûd û metlûbê wî û bilindkirina merteba wî û beyankirina marîfeta Îlahî û îta'a li ser heqîqetê ji teref Xwedê te'ala ve. Wek

Institut kurde de Paris

tewîla hedîsa: "Men teqerrebe mînnî şîbren teqerrebtu mîn hu zîra'en, we men etanî yemşî eteytu hu herweleten" ku nêzbûna qebûla tewbê û dayina îhsanê û ecelekirina bi memûrata ye.
Ema nêzbûna hissî, ew tê tewîlkirin bi lutf û îhsan û îkramê. Wek tewîla hedîsa: "Yenzulû Rebbûna îles'semaîd'dunya."
Ku murad bi nizûlê, nizûla în'ama û fi'lên qenc û qebûla tewba xelkê û îhsana bi bal wan ve ye. Ema nêzbûna Pêxember sew bi bal Xwedê te'ala ve, tê tewîlkirin bi îzhara menzila mezin û teşrîfa merteba wî û îşraqa enwarê marîfeta Xwedê û muşaheda îsrarê xeybî û qudreta wî. "Şehab Elel Şîfa"

**17- Hilanî Xwedê perde, rakir nîqab**
**Cemala Xwedê dît ewî bê hîcab**

**18- Du caran bi çehvan cemala wî dît**
**Li derrê, melayên dibêjin, nedît**

**19- Mebe bê sebeb munkirî "qed rea!"**
**Ji xelqê tumarûn 'ela "ma yera"**

(Di Çapa Destnivîs de, malika 19 an, rêza pêşî weha ye: "Mebe sebebê munkirî, qed rea"-w)

RAKIR NÎQAB: Xwedê te'ala perde rakir, ji navbera xwe û Pêxember sew.
Ev tekrar, mubalexa di keşfê de ye ji bo îsbat û teqrîra ku Pêxember sew Xwedê te'ala dîtîye.
BÊ HÎCAB: Bê perde. Lewra "hîcab" bi mana men' e, mirad pê perde ye.

Tu bizan! Perde di vir de, mezinayiya Xwedê te'ala ye û tîrêjê nûra wî ne. Perde di heqê mexlûqa de ye, ne di heqê Xwedê de ye. Wehareng e hedîsa: "Hîcabû hû en'nûru". Yanî perdeya ku men'a mexlûqa dike ji dîtina Xwedê te'ala nûra mezin e, besera mexlûqa zeîf e xwe ranagire li ber rijandina nûrê. Mîsala ku Xwedê her tiştî dibîne, lewra perde jê re tune, lê tiştek wî nabîne ev e:
Quleka kûr, tê de gêrik (mûrî-w) hebe, çiqas tûj awur here qulukê jî gêrikê nabîne, lê gêrik wî dibîne.

DU CARAN: Carekê li Sîdretulmuntehayê, carekê jî li nik Qabîqewseyna. Çewa ku Şehab gotiye, 2/310.
Lê Dawudê Qersî di "Şerha Nûniya Xudur Beg" de gotiye:
- Carekê Şeva Mi'racê, carekê jî li Medîna munewer, ku temamê tiştan jê re kifş bûne. Çewa ku ji Îbrahîm es re kifş bûn: "We kezalîke nûrî Îbrahîme melekûtes'semawatî wel erdî."

BI ÇEHVAN CEMALA WÎ DÎT: Çewa ku Îbnu Ebbas gotiye di "Rîwayeta Meşhûr" de, hem Hakim û Nesaî û Tibranî jê (Ji Îbnu Ebbas-w) rîwayet kirine, ku (Îbnu Ebbas-w) gotiye:
- Xwedê te'ala Mûsa es xas kiriye bi "Kelam" û Îbrahîm es bi "Xelîl" û Muhemmed sew bi "Dîtinê".
Hiceta wê ev hersê ayet in:
1- "......" Yanî dilê wî tesdîqa Pêxember înkar nekir, î'tîqada xîlafa wî nekir, bi hev re muwafiq bûn di dîtina Xwedê te'ala de.
Lewra sabit bûye bi Hedîsa Sehîh. çewa ku Şehab gotiye, 2/310.
2- "......" Yanî dîtina wî ya ku Xwedayê xwe dît. Xîtaba Îlahî

ji muşrika re ye. Lewra înkara dîtinê dikirin bi temamî.
3- "......" Yanî Xwedayê xwe dît carek dî, elettehqîq!

Ebu Zerrê Xifarî û Mu'az bîn Cebel, wek Îbnu Ebas gotine. Hem ji 'Ikreme û Îbnu Mes'ûd jî wisa hatiye rîwayetkirin.
Hesen-ul Besrî sond xwariye bi Xwedê, ku Muhemmed sew Rebê xwe dîtîye!

Îmamê Henbelî gotiye:
- Ez wek Îbnu Ebbas dibêjim "dîtîye", dîtîye, dîtîye.

Îmamê Eş'erî û komek hevalê wî gotine:
- Bi çavê xwe dîtîye.

Û (Îmamê Eş'erî-w) gotiye:
- Xwedê te'ala temamê mûcîzatê enbiya daye Pêxember sew. Hem wî xas kiriye bi dîtinê. "Şîfa".

LI DERRÊ: Di zerer û xisaretê de ne, MELAYÊ DIBÊJIN NEDÎT: Civat û cemaetê ku dibêjin: Muhemmed sew Rebê xwe nedîtîye. Wek Mu'tezîlîyan û hinek ji ehlê Hedîsê û 'Ilmê Fiqhê û ehlê 'Ilmê 'Eqîdê.
Çewa ku Qazî 'Eyad di "Şîfa"ê de gotiye, 158 :
- Sebebê ku wana di zirarê de ne, lewra hindik in, hiceta wan zeîf e.

Îmamê Newewî di "Şerha Muslim" de, 2/92 gotiye:
- Qewlê raci' li nik ekserê alima ev e ku, Pêxember sew Rebê xwe dîtîye bi çavê serê xwe Şeva Mî'racê.

Îbnu Hecer jî di "Fetawa Hedîsîye" de, 108, gotiye:
- Cumhûr û Ehlê Sunnetê wisa gotine ah.

Muxalefeta Cumhûr, ne xalî ye ji zirarê. Lewra mutabe'eta pira, lazim e bi hukmê Hedîsa Sehîh. Kesê ku ji Pêxebmer hes bike, bira xwe bi gotina Cumhûr bigre.

Çewa ku Şeyx (E.Xanî-w) tewsiye kiriye, ku gotiye:
MEBE BÊ SEBEB MUNKIRÎ, QED REA! Bê sebeb înkar neke dîtina ku ayeta "......" delalet dike li serê.
JI XELQÊ TUMARÛNE 'ELA MA YERA: Yanî nebe munkirekî ji wan xelqê ku ayeta: "......" li ser wan carî dibe.

Murada Şeyxê Xanî ev e: Ku zahirê ayeta "......" dîtina bi çav dixwaze. Dema ku wisa ye, mîra û cîdalê neke di vê meselê de, nebêje ku nedîtîye. Da tu nebî hedef ji bo tîra 'îtaba Îlahî, ku ji kevanê ayeta celîle dertê. Yanî ayeta "......" e.
Murada wî ne ev e: Ku munkirê dîtinê digerin ji wan kesên ku ayet di heqê wan de nazil bûye. Lewra xîtaba ayetê, bi muşrika re ye. Çewa ku "Tefsîra Celal" dibêje, bi sebeb ku înkara dîtinê dikirin bi her hawayî.

Tenbîh! Diya me 'Aîşe û hinek ji eshaba, wek Îbnu Mes'ûd û xeyrê wî, ku bûne tabi'ê wê rê, gotine:
- Murad ji ayeta "......" û ayeta "......" ev e: Ku Pêxember sew, Cibrîl es dîtîye du cara li ser sûretê wî yê heqîqî. Carekê li erdê di ewelê rîsaletê de, carekê jî li Sîdretulmuntehayê. Navbeyna herdu dîtina deh sal e. "Cemel".

'Aîşe û hevalê wê dibêjin:
- Pêxember sew bi çavê serê xwe, Xwedê te'ala nedîtîye!
Bi delîla ayeta: "......". Hem dibêjin: Lakin bi dilê xwe, Xwedê te'ala dîtîye.
Du rîwayetê Îbnu Ebbas jî wisa dibêjin, çewa ku di Hedîsa

Institut kurde de Paris

Muslim de ne. Lê ne wek ya pêşî meşhûr in.

Tibranî ji Îbnu Ebbas rîwayet kiriye, ku:
- Carekê bi çavê xwe dîtîye, carekê jî bi dilê xwe.
Bi vê rîwayetê, hemû gotinê Îbnu Ebbas li hev dertên.

Çewa ku Îbnu Xuzeyme beyan kiriye:
- Murad bi dîtina dil ev e, ku Xwedê te'ala di dilê wî (M.Pêxember-w) de dîtinekê xuliqand, çewa ku di çav de xuliqandiye.
Lewra ji dîtinê re ne şert e çav bi tenê, cihê xisûsî jê re ne lazim in. Gerçî li gor adetê, dîtin bi çava ye.

Tu bizan! Îmamê Newewî gotiye:
- 'Aîşe gotina xwe sade ji ayetê deraniye. Tu hedîs di destê wê de nîn in. Gotina wê qet nabe hicet ji nedîtinê re. Digel ku Îbnu Ebbas muxalefeta wê kiriye di Rîwayeta Meşhûr de.

Hem Îmamê Henbelî gotiye:
- Gotina 'Aîşe, tê def'kirin bi hedîsa "Reeytu Rebbî".
Yanî min Rebê xwe bi çavê xwe dît. Hedîs ji gotina wê mezintir e ah. "Zirqanî" 7/110-119.

Şehab gotiye, 2/312:
- Ev hedîsa Îmamê Henbelî sehîh e.
Lefzê wê ev e: "Selleytul'leylete ma qudîye lî summe wede'tu cenûbî feetanî Rebbî fî ehsenî sûretîn fe qale: 'Ya Muhemmedo fîme yextesîm-ul meleu-l e'la'?
Fe qultu: 'Ey Rebbî ente e'lemu!"
Ema hedîsa: "Reeytu bî fuadî merreteynî we lem erehu bî 'eynî" zeîf e. "Zirqanî", 118.

Xatîmetun. Seîd Binu Cubeyr gotiye:
- Ez nabêjim ku Pêxember sew Xwedê te'ala dîtîye û ez nabêjim ku nedîtîye! Yanî tewequf kiriye. Ş/313.

Qurtebî di "Şerha Muslim" de ev qewl tercîh kiriye û nisbeta wî daye bi bal cema'eteke muheqqeqîna ve û teqwiye kiriye, ku di vî babî de delîlek qet'î tune. Delîla herdu taîfa, zahirê hinik ayetan û hedîsan in, hev nagirin, tewîl li wan dikevin . Zr/120.

Qadî 'Iyad di "Şîfaê" de 1/162 gotiye:
- Dîtina Xwedê te'ala caîz e, şubhe tê de tune. Lewra ayeta ku bi sûretê qet'î men'a dîtinê bikin nîn in ah.
Ev heq e. Lewra ayeta: "......" û "......" û "......" di Tefsîra wan de îxtîlaf pir e. Her yek bi hawakî tewîl li wan daye. Xeberdan li ser wan dirêj e, di virê hilnayê. Hem gotiye:
- Ema îsbata dîtina bi çava ji Pêxemberê me re sew, delîla qet'î di wê de jî tune.
Lewra mutemedê vê meselê du ayet in: "......" û "......" Di herduwan de jî nîza' heye, çewa ku buhurî. Hedîseka qet'î jî ku dîtinê îsbat bike, tune. Lewra hemî hedîsê ku anîne û kirine hucet ji bo dîtinê qencê wan, hedîsa Îmamê Henbelî ye, ku vêga buhurî. Di wê de jî îztîrab heye, yanî îxtîaf û xelel di sened û metnê wê de heye. Lewra carekê ji me'az Binu Cebel rîwayet kiriye, carekê jî ji Îbnu Ebbasê Xudremî. Metnê wê jî rîwayetek, ew bû ku buhurî. Rîwayetek jî ev e: "Qumtu mînel'leylî fe selleytu ma quddîre lî fe ne'estu fis'selatî hetta îsteyqeztu feîzen ena bî Rebbî" ah.

Hinka gotiye:
- Ev Hedîs, madem ku Tirmizî jî sehîh dêrandiye, xelel tê de tune. Ema Hedîsa ku Îbnu Ebbas dibêje "Bi çav dîtîye", ew xebereke ji î'tîqada xwe gotiye, îsnad nedaye bi bal

Pêxember ve sew çewa ku Qadî 'Iyad gotiye. Lakin Îmamê Newewî di Şerha Muslim de 2/92, ji xweyê "Tehrîrê" neqil kiriye, ku esil di vê mesellê de Hedîsa Îbnu Ebbas e, ku 'alimê vê umetê ye û bi bal wî ve ricû' tê kirin di meselê hişk û zor de - wî hella wan kiriye. Dema rîwayet jê sabit bibe, lazim e bê qebûlkirin. Lewra rîwayetê wiha bi eqlê xwe û bi zenna xwe nabêje. Ancax ji bihîstinê distîne. Ne durust e ku kesek zen bike, ku Îbnu Ebbas bi zenn û îctîhada xwe di vê meselê de xeber daye ah.

Qadî 'Iyad gotiye:
- Ema Hedîsa Ebî Zerr, ew jî wek hedîsa Îbnu Ebbas e. Yanî ne delîleke qet'î ye di îsbata dîtinê de.
Hedîsa wî ev e:
"Seeltu hu sew , hel reeyte Rebbeke?", "Fe qale, reeytu nûren!". Yanî ji nûrê pê ve min tişkî nedît. Mehal e ku zatê Xwedê te'ala nûr be. Lewra nûr cism e.
Ema ayeta "......" ew mewelehu - çewa ku buhurî.

Şehab di "Şerha Şîfaê" de 2/324, piştî neqla kelamê gelek aliman, di vê behsê de gotiye:
- Ev tev xeberê neqişandî ne, mayê ku Îmamê Xezalî pê razî bûye ev e, ku ji Xwedê te'ala re tê gotin "Nûr" heqîqeten.
Lewra mana wê: "Ez'zahîrû bî nefsîhî, el muzhîru lî xeyrîhî".

Kelamê Eş'erî jî muwafiqê wê ye, ku gotiye:
- Xwedê nûrekî ne wek nûra ye.
Bînaa li ser vêya: "Xwedê nûra nûrê ye", xefî ye ji puriya zihûrê. Eger tu fehm bikî, Xwedê "Nûrun 'ela nûrîn".

Gotina Qadî ku: "Nûr cism e", em teslîm nabin jê re ah.

Qadî 'Iyad gotiye:
- Ema Hedîsa Ebî Zeradî, elfazê wê muxtelif in. Îhtîmala dîtin û nedîtinê tev dixwaze, hem muşkil e. Lewra zatê Xwedê te'ala gerandiye "Nûr". Lefzê wê ev e: "Seeltu Resûlellahî sew, hel reeyte Rebbeke?", "Qale, nûrun enna erahû!", ruwiye haza wel'lezî qeblehû, Muslim.
Yanî Xwedî te'ala nûr e, ezê çewa wî bibînim? Yanî min nûrek dît, bû perde li besera min nehişt ku ez Xwedê bibînim.
Ev wek hedîsa "hîcabûhun'nûru" ku Buxarî û Muslim rîwayet kirine ah.
Temamê vê hedîsê ev e: "Înnel'lahe la yenamu we la yenbexî en yename yehfed-ul qîste we yerfe'uhû yerfe'u 'emelel'leyle qeblen'neharî we 'emelen'neharî qeblel'leylî hîcabûhun'nûru lew keşefehu le ehreqet sebehatu wechîhî ma enteha îleyhî beseruhû mîn xelqîhî."
(Di Hedîsê de li ser bêjeya "Qist" -terazû, mêzîn- muelifî neh rêz bi zimanê Erebî nivîsîne. Me pêwîstiya wergerandina wan nedît-w)

Şehab gotiye:
- Qadî li gor fehma xwe Hedîsa Ebû Zerr mane kiriye. Hinek pê razî nebûne ah.

Senbatî gotiye:
- Tiştê ku ji me xuya dibe, li gor ku em î'tîqada dîtinê dikin, mana Hedîsa Ebû Zerr wiha ye: "Nûr", yanî Xwedê te'ala xweynûr e. Paşê Pêxember sew nîşan da, ku dîtina Xwedê te'ala û muşaheda zatê 'elîyyet pir tişkî mezin e. Got: "Enna erahû?", ezê çewa bibînim? Yanî zatê ku min dît pirî ku mezin bû, ez ne di dereca dîtina wî de bûm.
Çewa ku ayeta: "......" wisa hatiye tefsîrkirin. Ema hedîsa: "Reeytu nûren", ew ness e (delîl-w) di dîtinê de. "Zirqanî"

6/118.

Îmamê Newewî neqil kiriye 2/92, ku:
- Delîl û hiccetê vê meselê pir in. Lakin emê xwe bigrin bi ya qewîntir ji teva, ku Hedîsa Îbnu Ebbas e re: "E te'cebûne en tekûn-el xulletu lî Îbrahîme wel kelamû lî Mûsa wel rûyetu li Muhemmedîn sew".
Hem gotiye, 93: Îbnu Ebbas û hevalê wî tiştê wiha îsbat nakin, îla bi bihîstina ji Resûlê Xwedê te'ala sew. Ev, tiştekî wisa ye ku ne layiq e şik tê de çêbibe ah.

Şehab gotiye, 2/323:
- Îmamê Xezalî jî, tesrîh pê kiriye, Musennif jî -Qadî 'Iyad-, bi bal ve meşiyane.

**20- Eger tu dibêjî "Li ku dî Xuda?"**
**Xwedê go: "Li nuk Sîdret-ul Munteha"**

**21- Muheqqeq bizan wî Xwedê dîtîye**
**Welêkin nizanit heqîqet çi ye**

**22- Ji bo wî çu nîn e nezîr û şebîh**
**Kesê wesfî kit dê çi bêjit bedîh**

**(Di Çapa Destnivîs de weha ne:**
**21-"Muheqqeq bizan wî Xwedê dîtîye**
**Nîhayet nizanit heqîqet çi ye".**
**22-"Ji bo wî tu nîn e ne mîsl û şebîh**
**Kesê wesfî kit dê çi bêjit bedîh"-w)**

EGER TU DIBÊJÎ: Eger bipirsî, bibêjî: Pêxember sew li kê derê bû, dema ku Xwedayê xwe dît?

Emê bêjin: Zehmetî di cewaba vê pirsê de tune! Lewra Xwedê te'ala bi xwe gotiye ku: "Li nik Sîdret-ul Munteha dîtîye: "......"
Yanî bi tehqîq carek dî jî, wî dît li nik Dara ku navê wê "Sîdret-ul Munteha" ye.

Şeyxê Xanî bi mûcibê vê ayetê, ku zemîra "Reahû" raciê bi bal Xwedê ve ye, gotiye: "Muheqqeq bizan!"
Ji gotina Îmamê Newewî jî wisa tê îstîfadekirin.

Kesê ku hikim dikin bi dîtinê ku du car in, di cara ewel de xîlaf kirine, ka li kê derê bû? Çewa ku buhurî di s.13 de (Rûpela çapa bi tîpên Erebî-w). Lê di cara dawî de xîlaf tune, ku li nik Sîdreyê bû. Lewma Şeyx (E.Xanî-w) behsa wê (Dîtina di cara paşî-w) tenê kir.

ŞEBÎH: Bi mana misl e. Firqa "Misl" û "Nezîr"ê di s. 3 de buhurî. Dema ku nezîr û şebîh jê re (Ji Xwedê re-w) nîn in, jxwe heqîqeta wê nayê zanîn.
DÊ ÇI BÊJIT BEDÎH: Wê çi tiştê bedîhî bêje di wesfê Xwedê te'ala de?

(Mana "Bedîh"ê di luxet de bi zimanê Erebî: Hatina ji nedî ve, despêk, şûfandina yekî bi tiştekî, bersîva hazir, ve hazirbûna ji nedî ve li nik yekî û hwd-w). Yanî kes nikare wesfekî "Bedîhî" jê re îsbat ke.
Wesfê Bedîhî, wesfê ku têne naskirin bê tefekur. Lewra bedahet, naskirina bi sebeb tefekurê ye. Wekî niha yek, nîvê diduwa ye. Dema ku heqîqeta wî nayê zanîn, wesfê bedîhî jê re nîn in. Ancax sîfatê wî têne îsbatkirin bi deîla, heta yekîtîya wî jî bi delîla ye.

ÇAR ESAS! Ev her çar esas, me ji "Soza Sî û Yekê" sten-

Institut Kurde de Paris

diye. Bi sûretekî kurt ji Kîtaba Bedî'uzzeman (Mele Seîdê Kurdî-w) re. "Sozler Mecmu'asi":

Esas-1: Sira ku Mî'racê kiriye lazimê xwe çi ye?
Xwedê te'ala ji her tiştî nêztirê her tiştî ye. "......" cîsm û mekan jê re nîn in.
Ji bo çi, wîlayeta Ehmedîye bûye netîca Mî'raca ku dûr î dirêj e, piştî wê (Mî'racê-w) hê qismê weliyan muwefeq bûne, ku di qelbê xwe de munacatê bikin?
El Cewab: Ev sirê ha bi du temsîla nêzî fehmê dibe.
Temsîla Ewel: Suhbet û xîtaba sultan bi du şikla ye. Yek, xîtaba ji dûr ve bi yekî 'amî re ji bo şuxlekî xusûsî bi telefonê. Ya dî, xîtaba bi amirkî mezin re di hizûra xwe de ji bo ku emrê wî li etrafa bela ke û mezinayiya wî nîşan bide. Ha Mî'rac ji bo nîşandana ku wîlayeta Pêxember di ser hemî wîlayeta re û ji bo muşerefbûna bi suhbet û munacata bi Rebê kaînatê re, "......"
Temsîla Diduwa: Eynikek li ber rojê bête danîn, ji eksa rojê di eynikê de tîrêjik here hundurkî, însanek di hundur de bi wê tîrêjê re suhbet bike, ancax bi qasê qabiliyeta eynikê îstîfade dibîne.
Yekî dî eynikê biterikîne, di derî ve meznaya rojê bibîne, paşê here di banê xaniyê xwe de pencerekê veke, bi ruhnaya rojê re suhbet bike, kare bêje: Ya nazenîna asîman xwişka dinyayê, ku te ruwê erdê tev ruhnî kir û temamê kulîlka da kenandin, te wisa xaniyê min û bexçê min germ kir û ruhnî kir. Ema xweyîyê eynikê nikare wisa bêje, di bin qeyda wê de dimîne.
Ha, sultan roja ezel û ebed di zatê Ehed û Semed teceliyatê wî bi du sûreta xuya dibin:
Yek, teceliya sîfatî ye. Ku di eynika qelb de xuya dibe bi nisbeteke rebbanî re, her kes dibe mezher ji bo tecelîya îsma û sîfata li gor îstî'dada xwe û seyr û slûka xwe. Ewan

kesan, di bin siha xalibê îsma de diçin - yanî ê ku tecelî nekin- . Derecatê wîlayetê ji vî qismî ne.
Ya Diduwa, tecellîya zatî ye. Yanî tecellîya zatê Heq te'ala di fêkiyê dara kaînatê de, ku mana Ferdê E'zem e ji new'ê însan re, ku kare hemî Esma-ul Husna bi hev re di eynika ruhê xwe de nîşan bide. Lewra mezherê Îsmê E'zem e. Ev xuyabûn û tecellî, sirra Mî'racê ye. Welayeta Pêxember sew mebdeyê Rîsaletê ye, ji siyê derbas bûye, di Rîsaletê de sih tune, rastarast li zatê Zulcelal dinihêre.
Mî'rac kerameta kubra ye û merteba 'ulya ye, ji welayeta Ehmedîye re înqîlab bûye bi Rîsaletê. Batinê Mî'racê welayet e, ji xelq çûye Heq. Zahirê wê Rîsalet e, ji Heq çûye xelq. Welayet silûk e, muhtacê zeman û teyya muratiba ye. Rîsalet, nûra E'zem e li înkîşafa sirra qurbîyeta Îlahî dinihêre, zemanekî hindik jê re kafî ye. Lewra Mî'rac zû qediya -ji virê hê nivînê wî germ bûn, sar nebûbûn.
(Tê gotin dema ku M.Pêxember, bi şev ji nav nivînê xwe rabû çû nik Xwedê û vegeriya hat ser ciyê xwe, hêj livînê wê germ bûn. Yanî di demeke wisa kin de çû û zû zivirî-w)

Esas-2: Heqîqeta Mî'racêçi ye?
El Cewab:
Mî'rac, îbaretê ji seyr û silûka zatê Ehmedî ye di muratibê kemalata de. Yanî cenabê Heq te'ala di tertîba mexlûqata de tecelî kir, ku her yekê navekî li wan danî bi 'inwanekî, wî da naskirin û di selteneta xwe de daîreyê tedbîrî teşkîl kir. Di wan daîra de tebeqat danîn, ku her yek medarê 'erşekî rubûbîyetê û merkezekî tesrîfîye di hemî tebeqa de asarê rebîtîyê danî. Yeko-yeko ji wî 'ebdê xwe yê mexsûs (M.Pêxember-w) re nîşan da. Cenabî Heq ji bo ku wî 'ebdê xwe bigerîne camî'ê kemalatê însaniye û mezherê hemî teceliyatê îlahîye û nazirê hemî tebeqatê kaînata û meblexê hemî merdîyatê îlahîye û keşşafê tilism û kaînata,

wî siwarê Boraqê kir, wekî berqê, wî di asîmana de da seyrkirin, di meratiba de derbas ki, menzil-menzil, daîre-daîre rubûbiyeta îlahî pê (Bi M.Pêxember-w) da temaşakirin. Enbiyayê birayê wî, her yek di meqamê wan de yeka-yeka pê da nîşandan, di daîreyê asîmana de heta wî derxiste "Qabeqewseynî" û wî gerande mezherê kelam û dîtina xwe. Ev 'ebdê mexsûs ku Muhemmed e sew.
Madem ku cenabî Heq wî xas kiriye bi van wesfan, elbete wê di nav efradê însana de jê re seyr û silûka me'newî çêbibe û di alema cismanî de wê jê re Mî'racik di sûretê seyahetê de bibe. Hem wê li pişt berzexa esmaa û teceliyata û sîfata û ef'ala û tebeqatê mewcûdata, ku îbaratê ji heftê hezar perde ye di hemî meratiba de derbas bibe. Mî'rac Ev e!

SÛAL: Piştî mesafa ku bi hezar sala ye qedand û di heftê hezar perde de derbas bû hê bi Rebê xwe re xeberda, digel ku Xwedê te'ala ji her tiştî nêztir e?

CEWAB: Erê, Xwedê te'ala ji her tiştî nêztirê her tiştî ye. Feqet her tişt bê nîhayet û bê hîsab jê dûr e. Çewa ku eger şu'ûr û xeberdan ji rojê re hebûna, wê bi wasîta eynikê bi însan re xeberdana, bi kêfa xwe di însan de teseruf bikira, digel ku însan mesafa çar hezar (4000) sal jê dûr e, bi tu şekî nikare nêzî wê bibe!

SÛAL: Însan ancax bi wasîta teyarê çend kîlometre bilind dibe, digel çiqasê muşkîlata. Çewa însanek di çend deqîqa de mesafa hezar sala diqedîne?

CEWAB: Ev erda ku cismekî pir giran e, bi hereketa senewiye di deqîqekê de teqrîba mesafa sed û heştê û heşt (188) sala diqedîne. Di salekê de teqrîba mesafa bîst û

pênc hezar (25000) sal diqedîne. Madem ku weha ye, ecêba Qedîrê Zulcelal nikare însanekî bigihîne 'Erşê xwe di çend deqîqeyê hindik de?

Esas-3: Hikmeta Mî'racê çi ye?
El Cewab: Hikmeta Mî'racê pir kûr e. Fikra beşer nagihîjê. Feqet heqaiqê wê eger neyên zanîn, lê hebûna wan bi hinik îşareta dibe ku bête zanîn bi vî terzî:
Xaliqê van kaînata ji bo ku nûra wehdeta xwe û teceliya ehediyeta xwe di van tebeqatê pir de nîşan bide, ji muntehayê tebeqata heta mebdeyê wehdetê bi mî'racekê di sûretê "Tayê îttîsalî" de ferdekî mumtaz li ser hîsabê hemî mexlûqa ji xwe re gerande muxateb, bi navê hemî zîşu'ûra meqasidê xwe yê îlahîye pê (M.Pêxember-w) da zanîn û fehmkirin, cemala sin'etê xwe û kemala rebîtîya xwe di eynika mexlûqata de pê da dîtin û muşahedekirin. Hem cemal û kemala sani'ê hekîm bê hed û hîsab in, herdu bîzzat mehbûb in, xweyê wan jî pir ji wan hes dike. Ew hiskirin bi gelek terza di mesnû'ata de xuya dibe, ji mesnû'atê xwe hesdike. Lewra cemal û kemala xwe di wan de dibîne, di nav wan de yê pir heskirî û 'alî ruhber in, di ruhbera de zîşu'ûr in. Di zîşu'ûran de yê ku pir tê heskirin bi î'tîbar camî'îyetê di nav însana de peyda dibe.
Ew ferdê ku di nav însana de îstî'dada wî bi temamî înkîşaf bûye, nimûna kemalatê xwe nîşan daye di mesnû'ata de munteşir û mutecelî (Kemalat-w) bûne, her ew e yê ku pir tê heskirin ji nav însana. Sani'ê hekîm ji bo ku hemî enwa'ê teceliya muhebeta xwe ya ku munteşir e, di hemî mewcûdata de di yek nuqtekê de di yek eynekê de dît û ji bo ku enwa'ê cemala xwe bi sira ehediyetê nîşan bide, zatekî di dereca fêkiyê munewer de ji dara xulqetê - Dara Xulqetê: dara kaînatê. Yanî kaînatê ku dişibihin dara Tûbayê, ku koka wê li jor e, şaxê wê li jêr in, şeqekî koka wê

alema suflî (jêr-w) ye, ku ji hîvê û berjêr e. Şaxê wê 'enasir in - û qebê wî di hukmê dendika heqaîqê esasîye yê wê darê îstî'ab dike.
Ji mebdeyê ewel ku dendik e, heta muntehayê ku fêkî ye, bire mî'racekê, ku wek xeyta îttîsala mebdeyê bi muntehayê ve ye - Xeyta îttîsalê: Yanî tayê bi hevvekirinê. Murad pê, munasebeta hemî mexlûqa bi hev re, tev munasibê hev in: "......" Da ku wî zatê ferd celbê hizûra xwe bike, bi navê kaînatê mehbûbiyeta wî nîşan bide, bi dîtina cemala xwe muşeref bike haletê qudsîye yê ku tê de hene, di xeyrê wî de jî bide sîrayetkirin.
Bi wê Mî'racê, wî teltîf kir bi kelamê xwe, da wezîfekirin bi fermana xwe. Hîkmeta Mî'racê ev e!

Elhasil. Mî'rac ji bo dîtina netaicê mexzenê alema erdê ye û dîtina dezge û makîneyê asarê ku tê de ne.

Esas-4: Semerat û faydeyê Mî'racê çi ne?
El Cewab: Fêkiyê Dara Tûbaya ku Mî'rac e, ji pêncsedî zêde ne. Lê emê pênc zikir bikin.

Yek: Heqayiqê erkanê îmanê bi çav dît, milyaketa, cinna, axretê, heta zatê Zulcelal jî bi çav muşahede kir. Wisa xezînekî, nûreka ezelî û ebedî ji beşer û kaînata re anî û hedye kir. Vê kaînatê ji wed'îyyeta mewhûme ku perîşan û fanî ye deranî. Hem heqîqeta kaînatê nîşan da, ku di wed'îyyeta mektûbatê qudsîye yê semedanîye de û 'eynekî bedew ji cemala ehedîye re hemî kaînat û zîşu'ûra kêfxweş kir.

Didu: Esasatê îslamîye ku merdiyatê sani' ê alemê, hakimê ezel û ebed in. Di serî de limêj ji cin û însana re hedye anî. Ew merdiyat bê hîsab têne meraqkirin. Lewra her kes me-

raqdar û arezûkêş e ji dûr ve, ji bo ni'metê welîkî mezin, weya ji bo arzûya paşakî muhsin, ku wê erzûyê fehm bike çiqas memnûn dibe û temennî dike, ku: Xwezî wasîtekî muxaberî hebuwa rastarast min bi wî zatî re xeber bida, ji min çi divê min fehm bikira, çi li xweşa wî diçe min zanibûna! Evana mexlûq in. Încar temeniya merdiyatê Xaliq, jxwe nayên hisabê.

Sisi: Defîneya se'adeta ebedîye dît, mifta wê girt û anî ji cin û însana re hediye kir bi wasîta Mî'racê. Cenetê bi çav dît, cîlweyên baqî yê rehmeta rehmanê Zulcelal muşahede kir, se'adeta ebediye heq-ul yeqîn fehm kir û mizgîna hebûna wê da cin û însana.
Lewra cin û însanê bêçare di dunya bêqerar de mewcûdatê di nêv zelzela û fîraqê de, di dema qebûlkirina fîraqa ebedî bi seylê zeman û herekatê zerrata û di hingamê ku dew'îyeta mewhûmeya canferaşane de ne - Yanî ku erwahê wan wek minminîkê ku di firê de ne
Cinn û însanê ku bi zenna xwe mehkûmê 'edema ebedî ne, wê demê ku mizgîna heyata ebedîye li guhê wan keve, çiqas qîmetdar, û se'adeta were nayê tarîfkirin.
Mesela: Yekî ku î'dam jê re hatiye qerardan, paşî bête 'efûkirin. Wê çiqas kêfxweş bibe!

Çar: Fêkiyê dîtina cemala Xwedê girt û mumkinbûna wî fêkîyî, ji her muminî re -di axretê de- hedîye anî ji cinn û însana re. Lezzeta wî fêkî, tê wiha zanibî:
Her însan, ji zatekî xweycemal û xweykemal û xweyîhsan hes dike. Ew heskirin li gor dereceyê cemal û kemal û îhsanê zêde dibe, muhebetekê grêdide di dereca ku canê xwe feda bike, ji bo dîtina yek carekê diçe dereca ku dinya xwe feda bike.
Hal ew hal e, cemal û kemal û îhsana hemî mewcûdata bi

nisbet cemal û kemal û îhsana Xwedê te'ala wek tîrêjeke biçûçik bi nisbet ruhnaya rojê nayên. Ku wusa ye, layiqê mebhes û îştîyaqa bênîhayet yek zatê Zucelal û el kemal e. Muwefeqbûna dîtina wî, di heyata ebedîye de çiqas medarê surûrê ye, ku tu însan bî tê fehm bikî.

Pênc: Însan ku fêkîkî qîmetdar e û mehbûbê sani'ê kaînata ye, bi Mî'racê hate zanîn. Însanê zîşu'ûr ku mexlûqekî biçûk e, zeîf e, bêçar e, wekî ku bi sur'eta xeyala xwe û se'adeta ruhê xwe û cewelana eqlê xwe û hemî arzûyê qelbê xwe muwefeq bibe ji bo tenezzuh û seyrana di mulkê melekût de, bi yek carê di ceneta baqî de bibe mezherê rehmeta Xwedayê rehîm û kerîm di se'adeta ebediye de muwefeq bibe ji bo dîtina cemala wî re.
Însanê ku ji însaniyetê neketibe dema ku vêya bibhîze, wê çiqas di qelbê xwe de bi susûr û kêfxweşiyê bihise, tu karî texîl bikî.

**23- Sîfatê di seb'e ji bo Zulcelal**
**Bizan heft in ey 'arifê pirkemal:**

**24- Xweşî, Şên û Zanîn û Vîn û Kelam**
**Bihîstin, digel Dîtinê bûn temam**

**25- Qedîm in wekî zatî, cumle sîfat**
**Ne 'eynê di zatî ne, ne xeyrê zat**

**(Di Çapa Destnivîs de weha ne:**
**24-"Heyat û Zanîn, Qudret û Vîn, Kelam**
**Bihîstin digel dîtinê bû temam".**
**25-"Ne eynî yê di zat in, ne xeyrê zat"-w)**

SÎFATÊ DI SEB'E: Sîfatê ku meşhûr in bi lefzê "Sîfatê Seb'e", di luxetê Erebî de HEFT IN, li nik Eş'eriya. Heşt in, li nik Matûrîdîya. Ew dibêin "Sîfatê Semaniye" (8).

"Sîfatê di Seb'e" mubteda ye, lefzê "heft in" xeberê wê ye, masedeqê herduwan yek e. Eger bigota: "Bizane ev in, ey hevaê delal", weya tiştekî wek wê. Ji yekîtîya mubteda (Yani Sîfatê Seb'e-w) û xeberê (Yani heft in-w), xilas dibû. Ellahumme, îla ku em bêjin: 'Ewamê Kurmanca mana Sîfatê Seb'e nizanin, dema ku got "Heft in", dizanin ku heft sîfatê Xwedê te'ala hene, ji wan re tê gotin "Sîfatê Seb'e". Zanîna wan li her kesî wacib e:

XWEŞÎ: Yek ji wan heft sîfatan "Xweşî" ye. Yanî saxî û heyat.
ŞÊN: Karbûn: Qudret.

Tu bizan! Qudreta Xwedê te'ala li ser her tiştî mumkin heye, wek îcadkirina mexlûqa û fenakirina wan. Lê li serê (wî-w) tiştê wacib û mehal tune.
"Wacib" wek zat û sîfatê Xwedê û 'edema ezelî. Qudreta Xwedê te'ala ne li ser îcada zat û sîfatê wî heye, ne li ser fenakirina wan heye. Wehareng e tinebûna ezelî ne îcad dibe, ne fena dibe.
"Mehal" wek şerîkê Xwedê te'ala û deranîna mexlûqa ji mulkê wî.

Hem tu bizan! Îmamê Eş'erî gotiye:
- Qudreta Xwedê te'ala, xwe bi fenakirina mexlûqata ve nagire, piştî wucûda wan. Dema ku Xwedê te'ala îrada fenakirina tişkî bike, xwe jê dibire, bi xwe (ew tişt-w) fena dibe. Çewa ku duhnê fitîlê diqede (çira-w) bi xwe ditefe.

Hem tu bizan! Tesîra heqîqî ji zatê Xwedê re ye, ji qudretê re mecazî ye. Heram e ku meriv bêje: Qudret tişta dike. Belkî kufr e. Eger qise bike ku, qudret heqîqeten tişta dike, çewa ku kafir dibe, kesê ku î'tîqad bike: Agir tişta dişewitîne, kêr tişta dibire. Ema ku qesda wî: Agir, sebebê şewitandinê ye û kêr sebebê birrînê ye, durust e.

Îblîsê le'n ji Idrîs es pirsî:
- Xwedê kare dinyayê têxe qaçilê bindeqê?

Idrîs es çavê wî bi derziyê dirrand, nûra çavê wî tefand. Lewra Îblîs îrada tefandina nûra îmanê kiribû. Ceza ji cinsê 'emela ye. Hem (Idrîs-w) cewab da ku:
- Xwedê te'ala kare dinyayê di qula derziyê de derbaske, bêweku qula wê fireh bike weya dinyayê biçûk bike.
(Idrîs-w) cewabê tefsîl nekir. Lewra heqê xweyê înadê, terk û men' e.

ZANÎN: 'Ilm. 'Ilmê Xwedê te'ala zatî ye, hem ne zerûrî ye û ne bedîhî ye. Lewra gerçî herdu jî, ne mewqûfê ser delîlê ne, lê zerûrî carna tê gotin ji wî tiştî re ku, zerûret pê re beraberî dike, wek bihna gulû ku em dibin ber pozê xwe derhal bihn dide. Bedîhî jî tê gotin, ji bo zanîna ku ji nişka ve çêdibe.
Ji ber wehma van herdu mana, nayê gotin: Ilmê Xwedê zerûrî ye, ya bedîhî ye.
VÎN: Îrade.
KELAM: Xeberdana li ser kelamê lefzî û nefsî, di "Rehberê 'Ewam" de bihurî.
BIHÎSTIN Û DÎTIN: Sem' û beser.
Bihîstin û dîtina Xwedê te'ala, ne bi guh û çava ye. Çewa ku zanîna wî ne bi qelb û mejî ye. Hemî denga dibihîze, heta dengê lingê gêrika (Mûrî-w) hûrik a ku dibêjinê "Zer-

Institut kurde de Paris

re" dibihîze. Dema ku dimeşe li ser kevirê mermer ê hilû, û (Xwedê-w) her tiştî dibîne heta wehm û xetera di qelb de, hem deng û sewta jî dibîne (dibihîze-w). Çewa ku sabit e di 'Ilmê 'Eqîdê de.
Ji vê tê zanîn ku, dengê piştî ji dev ku dertê, naçe 'edemê. Çewa ku sabit e di "Nezeriyatê Hikmeta Nû" de. Lewra li dengê Dawud û Mûsa es digerin.

QEDÎM IN WEKÎ ZATÎ CUMLE SÎFAT: Yanî hemî sîfatê Xwedê qedîm in bêxîlaf, çewa ku zatê Xwedê qedîm e. Çi Sîfatê Zatîye, ku "Sîfatê Seb'e" ne, çi Sîfatê Selbîye. Lewra tev qaim in bi zatê (Xwedê-w) ve, jê naqetin.
Eger (ew sîfat-w) hadis (nûpeydabûy-w) bin, lazim tê ku tiştê hadis qaîm bin bi zatê Xwedê ve. Ew qet nabe.
Hem esmayê wî jî, tev qedîm in bê xîlaf: "We esma-ul husna" mesela. Ema sîfatê ef'ala wek "'Ihya" û "Emate" û "Îbda'" û "Înşa" û "Ehbat" û "Înnema" û "Texlîq" û "Terzîq" û xeyrê wan, li nik me Eş'erîya hadis in, li nik Matûrîdîya qedîm im. Ji bo wî qasî (Matûrîdîyan-w) gotine: "Sîfatê zatîye heşt in", heft ê ku buhurîn, ê heşta "Tekwîn" e, ku şamilê ser teva tê. Lewra ku xwe bi saxkirina ve bigre dibe "Ehya", bi mirandina ve bigire dibe "Emate", bi riziqandinê ve dibe "Terzîq" û hakeza (herweha-w).

Tu bizan! Sîfatê Zatî, ew in ku ji nefya wan lazim tê neqîdê wan. Mesela: Ji nfya "Heyat"ê lazim tê ziddê wê, ku mirin e. Û ji nefya "'Ilm"ê lazim tê, cehl. Ema "Sîfatê Ef'ala" ji nefya wan, zidê wan lazim nayê. Mesela: Ku "Ehya" û "Emate" û "Texlîq" nefî bibin, nuqsanî çênabe. Ferqa wan ev e.
Ferqa îsm û sîfet: Îsm, mayê ku dîlalet dike li ser zat, yan bi nefsa xwe tenê, wek "Ellah" û "Xweda", weya bi î'tîbara sîfetê, wek "'Alim" û "Qadir" û "Murîd" û "Mutekellim" me-

sela.
Sîfetê, mayê ku dîlalet dike li ser manakî zêde li ser zat, wekî van "Sîfatê Seb'e".
Ferqa zat û sîfet: Zat, mayê ku tê tesewirkirin bîl îstîqlal. Sîfet, mayê ku nayê tesewirkirin, îla bi tebî'îyeta zatî.

NE EYN IN: Sîfatê Seb'e ne eynê zatê Xwedê ne. Ev, reda ser Hukema û Mu'tezîîyn e, ku dibêjin: "Sîfatê Xwedê, eynê zatê wî ne".
Dibêjin ku: "Ne eynê wî bin, wê qedîm pir bibin. Lewra sîfat û mewsûf ne yek in."

NE XEYRÊ ZAT:ê  Xwedê ne. Lewra tucar jê naqetin ezelen û ebeden.
Ev, reda ser Kîramîyan e, ku dibêin: "Sîfatê Xwedê, xeyrê wî ne û hadis in. Eger qedîm bin, wê qedîmî pir bibin."

Tu bizan! Ji Sîfatê Seb'e re tê gotin: "Zatiye" û "Subûtiye" û "Wucûdiye". Lewra qaîm in bi zatê Xwedê ve û sabit in tê de, bê tewequfa ser tişkî -shh- û dîlalet dikin li ser tiştê mewcûd, ne wek ê selbiye ku tewequf digerin li ser meslûbê û delalet dikin li ser selba (birin-w) tiştê ne layiq.
Hem tê gotin: "Sîfatê Me'anî". Lewra van sîfatan hinek me'anî ne zêde ne li ser zat, qaîm in pê ve, lazim in jê re bi terzekî wisa ku jê naqetin. Mana ku "Ne eyn in, ne xeyr in" ev e.

Tu bizan! "Sîfatê Seb'e" di te'eluqgirtinê de wuha ne: "Heyat", xwe bi tişkî ve nagire. "Qudret" û "Îradet", bi her tiştê mumkin ve te'eluq digirin bi te'eluqa tesîrê.
Yanî di mexlûqa de tesîr dikin tewra-tewra wan ji halekî dixine halekî, lê xwe bi tiştê wacib û mehal ve nagirin, ne wezîfa wan e. Eger xwe bi wan ve bigirin, lazim e ku Xwe-

dê karibe xwe fena ke. Hal ew hal e, qudreta Xwedê li ser sê tişta tune: Nikare şerîk ji xwe re çêke, nikare kesî ji milkê xwe der xe, nikare di xwe de teseruf bike wekî di mexlûqa de dike.
Ev nikarbûn medh û kemal e, ne nuqsanî ye.
"Kelam", xwe bi her tiştî ve digire çi wacib, çi mumkin, çi mehal bi te'eluqa delaletê, ne bi ya keşfê. Xwe bi çi ve bigire, dibe eynê wî. Eger xwe bi emrê ve bigire dibe emrê xwe, bi nehyê ve bigire dibe nehyê xwe, bi wed'ê ve bigire dibe wed' û hakeza.
"'Ilm" û "Sem'" û "Beser", te'eluqa wan keşfî ye. Temamê tişta bi wan keşf dibin ji Xwedê re. Te'eluqa wan ne tesîrî ye bi hawayê "Qudret" û "Îradê". Ema "Sem'" û "Beser", xwe bi wacib û mumkinê ve digirin, lê xwe bi mehalê ve nagirin. Lakin te'eluqa wan ji ya 'ilmê zêde ye.
Ema 'ilm, xwe bi her tiştî ve digire, çi wacib wekî zat û sîfatê Xwedê te'ala, çi mumkin wekî mexlûqa, çi mehal wekî şerîkê Xwedê te'ala. Lewra zane ku şerîk jê re tune. 'Ilmê Xwedê bi her tiştî heye, ji ezel heta ebed.
Çewa ku (Xwedê-w) gotiye: "......" Yanî di her weqtekî de Xwedê te'ala şanekî dertîne li gor 'ilm û îrada xwe ya ezelî.

FAÎDE! Îbnu Şecerî li ser kursiyê we'zê tefsîra vê ayetê dixwend. Zilamek rabû di ser re sekinî û got:
- Xwedayê te, vêga çi dike?

Îbnu Şecerî sikût kir û bi mehzûnî raza, di xew de Pêxember sew dît û ev mesele jê pirsî. Pêxember sew got:
- Ew zilam Xudr e, wê careke dî jî were. Jê re bêje: "Tiştê ku Xwedê te'ala dike ev e: "Şuûnun yubdîha we la yebtedîha yehfîdu eqwamen we yerfe'û axerîne."
Yanî hinek ehwal in dertîne û nîşan dide, ne ku 'ilmê wî yê nû bi wan çêdibe, hinek qewman datîne hinekan radike.

Institut kurde de Paris

Îbnu Şecerî bi kêf lê bû sibe. Xudur es dîsa hat û pirsî. Îbnu Şecerî cewaba wî da. Xudur es got:
- Selewata bide ser wîyê ku te 'elimandiye.
Û zû ziviri. "Bacûrî 'Ela Senewîyetî"

**26- Xwedê nîne cewher, ne cîsm û 'ered**
**Ne kull e ne be'd e bizan bê xered**

CEWHER: Tiştê ku li hember 'erezê ye. Yanî tiştê ku muhtac e bi bal valayiyekê ku meşxûl bike, yanî tiştê ku di derekê de cih digire, yanî tiştê ku jê re cuse heye, yanî tiştê ku qebûla 'ereza li xwe dike.
Cewherê ferd: "Cuzê layetecezza" (Pareyê napar, atom-w) ye. Cewher bi van mana teva ew tişt e, ku dikeve cîhetekê û qebûla haleta li xwe dike, wek hereket û sukûnê bo mumkinî. "Nexyet-ul Lalî"
Ji cewher re nîhayet û mekan heye. Hineka gotiye:
Cewherê mewcûdî ku ne hewceyê mekan e, bi vê manayê ji Xwedê te'ala (re-w) tê gotin "cewher". Lê ne durust e. Lewra îzna şer'ê pê tune.
Cewher, carna ji tiştê eslî re tê gotin. Wekî niha, filan tişt cewher tê de heye, yanî qenc e. Weya tê de tune, yanî xirab e.

CISM: Tiştê ku di derekê (de-w) cih digire û murekebê ji du cuza ye. Weya zêdetir tê teqsîmkirin û nîhayet û mekan jê re hene.

'ERED: ('Erez, ariz: nûpeydabûy-w) Tiştê ne qaimê bi zatê xwe ye, muhtacê cihekî ye ku wî ragire. Bû tabi'ê cismê.

NE KULL E NE BE'D E: Kul: Wekî nanê sax. Cuz: Wekî parîkî.

BIZAN BÊ XEREZ: Yanî tu zanibe bê xereza 'înadî ku Xwedê ne yek ji van tişta ye. Lewra van tişta tev mexlûq in û ewsafê (Xeyset-w) mexlûqa ne.

**27- Eger bê guneh me mu'ezzeb bikit**
**Ji wî ra heye me mueddeb dikit.**

**28- Rewayet bikit ew li xelqê meşaq**
**Bi qehra xwe teklîfa "Malayutaq"**

**29- Erê, key bi zulmê tekelluf dikit**
**Di mulkê xwe de ew teserruf dikit**

**(Di Çapa Destnivîs de weha ne:**
**27-"Eger bê guneh me mu'ezzeb biket**
**Ji bo wî heye me muweddeb biket".**
**28-"Rewayet biket ew li 'ebdê meşaq".**
**29-"Bi zulmê eger ew tekelluf biket"-w)**

Institut Kurde de Paris

EGER BÊ GUNEH: Yanî durust e ku xaliqê alemê Xwedê te'ala "me" mexlûqa bide 'ezabdan, ne bi sebebê ku mexlûqan berê gunehkarî û sûc kirine û ne bi sebebê ku paşî wê sewabê bide wan û mukafatê li wan bike.
Çewa ku (E.Xanî-w) gotiye: JI WÎ RA HEYE, caiz e û durust e di nezera eqil de ku Xwedê te'ala vî hawa bike, çi di dunyayê de, çi di axretê de.
Yanî eqil durust didêre ku Xwedê te'ala mexlûqê xwe yê masûm ê bêguneh bide 'ezabdan di dunyayê de bi enwa'ê

bela û mûsîbeta, çewa ku zarok û tifala nexweş dike bi êşê gran, hemî heywana nexweş dike û hinik hinka dikujin û dixwin û îzna însana li wan daye, ku wan dikujin û serjê dikin.
Dîsa eqil durust didêre, ku Xwedê te'ala îbadê xwe yê masûm ê bêguneh têxe cehennemê û tê de ebedî bihêle bide 'ezabdan.
Lakin ev tişt di nezera şer'ê de ne durust e, yanî Xwedê te'ala wusa nake. Lewra we'de daye, ku mumina têxe cenetê û ebedî bihêle.
Lewra gotiye: "......" Xwedê te'ala we'da xwe naşikêne. Lewra gotiye: "......" Xulfa (Xîlaf-w) di we'dê de nuqsanî ye, wacib e ku jê bête tenzîhkirin (Yanî ji Xwedê bê dûrkirin-w).
Dîsa eqil durust didêre, ku Xwedê te'ala kafiran û gunehkaran têxe cenetê, tê de ebedî ni'metê li wan bike.
Ev jî, di nezera şer'ê de ne durust e. Lewra Xwedê te'ala wan (Kafir û gunekaran-w) we'îd û tehdîd kiriye, ku bi cehenemê wan bide 'ezabdan.
Çewa ku gotiye: "......" û gotiye: "......" û gotiye: "......".
Lakin tenzîf û bicihanîna we'îd û tehdîdê ancax lazim e şer'en di heqqê kafira de. Lewra kufra kafiran ne durust e şer'en, ku bête efûkirin. Lê gunehê mumina çiqas pir bin jî, 'efûkirina wan durust e.
Çewa ku Xwedê te'ala gotiye: "......" , "......" , "......" , "......", ne di heqê muminê gunehkar de.

Xulfa di we'îdê de ji Xwedê te'ala re durust e, di heqê mumina de, ger çiqas gunehê kebair kiribin. Lewra nabe nuqsanî, belkî kerem û îhsan e, çewa ku adetê Ereba wusa ye. Şairê wan gotiye:

"We înnî îza ewde'tuhu ew we'edtuhu

Lî muxlîfu î'adî we muczîu mew'îdî"

Celaledîn Dewanî gotiye:
- Ev tişt qenc e, li nik her kesî.

Çewa ku Surrîyê Mûsilî gotiye:
"Îza we'edes'serrae enceze we'dehu
We în ew'edederrae fel 'efû manî'uhu"

Yehya Bîn Mu'az gotiye:
- We'd -ku îxbara bi menfî'etê ye- heqê 'îbada ye li Xwedê te'ala, bûye damin ku îta'a wî bikin, wê filan qenciyê bi wan bike. Kes weke Xwedê wefadar tune. Lê we'îd -ku îxbara bi zererê ye- heqê Xwedê ye li 'îbada ku ji wan re bêje, filan tiştî nekin ezê we ceza bikim. Wan jî kir. Wê demê Xwedê bi kêfa xwe ye. Yan 'efw e yan 'ezab e. A qenc 'efw e. Lewra xefûr û rehîm e ah.

Tu bizan! Î'tîraz çêbûye li ser caiziya xulfa di we'îdê de, ku lazim tê derew bikeve kelamê Xwedê te'ala, haşa wekela! Hem lazim tê tebedula wî, haşa summe haşa!

Cewaba Ewel: Ê Kerîm (Xwedê-w) ku îxbar bike bi we'îdê, layiqê bi kerema wî ew e ku îxbarê bîna bike li ser meşîetê. Gerçî tesrîh pê nake. Kerîm dema ku bêje: Ezê filankes bidim 'ezabdan, niyeta wî, yanî ku ez îrade bikim ezê wî bidim 'ezabdan. Lê îxbara bi we'dê layiq e ku qet'î be.

Pêxember sew gotiye: "Men we'edehullahu 'ela 'emelîhî sewaben, fe huwe muncîzun lehû, we men ew'edehu 'ela 'emelîhî 'îqaben fe huwe bîl xîyarî, înşae e'ezzebehu we înşae xefere lehu." Rewah-ul Esfehanî.

Institut kurde de Paris

Cewaba Diduwa: Tebdîla qewlî ne durust e, bi mûcibê ayeta: "......" Lê murad bi "qewl"ê di ayetê de: We'îda ku di heqê kafira de ye û di heqê wan gunehkara de ye, ku Xwedê te'ala îrada 'efwa wan nekiriye. "Tuhfet-ul Murîd".

ME MUEDDEB DIKIT: Yanî ku Xwedê te'ala vî tiştî bi me bike, ne ji bo tu 'ilet û xereza ye, belkî sade ji bo ku me bide edebkirin.

"Edeb" çewa ku Seyid Şerîf gotiye: Naskirina wî tiştê ku meriv pê tê hifzkirin ji sûc û xeta.
Faîda edebkirinê ev e: Ku 'îbadê wî qehr û 'ezemeta wî nas bikin, ji bo rî'ayeta emr û nehyê wî bikin.

Wê demê diçe ber bi Mezhebê Matûrîdîya ve. Lewra gotina wî (E.Xanî-w):
ME MU'EZZEB BIKIT: Yanî li dinyayê. Ema di axretê de yeqîn hasil dibe, gunehkarî çênabe 'ezabdana bi cehenemê nabe sebebê muhafeza ji guneha.
Ellahumme îlla ku em bêjin: Ayeta "......" divê ku her kes 'îbadetê Xwedê te'ala bike. Kesê ku li dunyayê neke, wê di cehenemê de bike. Lewra ehlê wî tev zarîn dikin û gazîyê Xwedê te'ala dikin. Ev jî, zikr û 'îbadet e. Çewa ku ji gotina hinik sadatê tesewufê tê zanîn: "Nesîtu mercî'e haza". Lakin hemla 'îbaret li ser vê manayê dûrî zihnê ye.

REWAYET: Durust e. Yanî caîz û durust e di nezera eqil de, ku Xwedê te'ala bi qehra xwe û qeweta cibrîye zehmet û meşiqetê wisa li 'îbadê xwe bike, ku bibe "Teklîfa malayutaq". Yanî teklîfa tiştê ku taqeta însan jê re tune, wek hilgirtina çiya û firîna bi bal asîman ve û îcadkirina tişta. Durust e ku Xwedê te'ala bide 'ezabdan li ser nekirina van

tişta. Lakin ev teklîf nekiriye û nake. Lewra (Xwedê-w) gotiye: "......"

Tu bizan! "Malayutaq" (Tiştê ji biriyê der-w) sê tişt in:
1- Mehalê Zatî: Bi zatê xwe mumteni' e. Yanî çêbûna wê di nefsa wê de qet nabe, wek fenakirina qedîmî û îcadkirina wê, wergerandina hadisî ku bibe qedîm, yan qedîm ku bibe hadis, berhevkirina du zidda wek agir û avê, weya îman û kufrê.
2- Mehalê 'Adî: Ku li gor adetê ji însan re ne mumkin e nikare bike, lê çêbûna wî di nefsa wî de munkin e, wek hilgirtina çiya, mesela ku buhurî.
3- Mehalê 'Erzî: Ku însan kare bike, lê 'ilm û îrada Xwedê te'ala xwe bi 'edemê û nebûna wê ve girtine, wek îmananîna kafiran û ta'etkirina gunehkaran, ku daîm di guneha de ne heta mirinê. Teklîfa vî qismî, li nik her kesî caiz e, hem eqlen hem şer'en. Lewra her kes dizane ku Xwedê te'ala teklîfa Ebûcehil û Ebûleheb kiriye bi îmanê digel ku di 'Ilmê Ezelî de îmana wan tune.

Ev qisim li nik Eş'eriyan mehal e, li nik xeyrê wan mumkin e. Delîlê wan di vir hilnayên. Ji bo wî qasî gotin çêbûye, ku teklîfa bi mehalê li nik Eş'erî hem caiz e hem eqlen waqi' bûye. Çewa ku Xeyalî û Seylekûtî gotine:
- Îbnu Hemam di "Mûsayerê" s. 128 de gotiye: Qewlê racih ji herdu qewlê Eş'eriyan ew e, ku waqi' nebûye ah.

Tê zanîn ku ev qisim li nik wan jî ne muhal e. Şernebî di "Haşiya Cem'-ul Cewami'"ê s. 207 de gotiye:
- Hinka navê wê danî "Muhal", Eş'erî jî wî daxilê "Mehal"ê kir da ku redda wan bike.

Ema qismê ewel hinek ji Eş'eriyan gotine: Teklîfa wê

eqlen durust e. Hinka gotine: Na. Delîla ku teklîfa muhalê caiz e, ayeta: "......" Eger caiz nebûna, wê negotina: Ya Reb, tu wê li me bar nekî.
Lewra suala def'kirina tiştê ku nabe, ne karê eqilmenda ye. Faîda wê teklîfê tecrîba 'îbada ye, ka di muqedemata de dixebitin ku sewab lê tertîb bike, yan naxebitin ku 'ezab tertîb bike.

Matûrîdîyan dibêjin:
- Teklîfa mehalê ne caîz e bi nezer eqil. Lewra teklîfa kora bi nihêrtinê sefahet e. Tehqîqa wê ev e: Hikmeta tklîfê, tecrûbe ye. Ew jê nayê ferz û teqdîrkirin. Lewra kesê ku îmkana wî negihîje fi'lekê, ew me'zûr e. Mana tecrûbê tê de nayê tehqîqkirin. Ancax tête tehqîqkirin di tiştê ku muyesser e ji 'ebd re û kare bike. Wucûda fi'lê ku nayê tesewurkirin sewab û 'îqab (ceza-w) xwe bi eda û terka wê ve nagirin, hikmeta tekîfê namîne -tiştê ku xîlafa hikmetê be Xwedê te'ala wî nake.
Hem dibêin:
Eqlen ne durust e ku Xwedê te'ala kafira 'efû bike têxe cenetê û mumina têxe cehenemê ebedî tê de bihêle. Lewra qencîkirina bi xiraba û xerabîkirina bi qenca tiştek e, ku ne di cihê xwe de ye, dibe zuml.

Hem lewra ku ev durust be, tefrîqa navbeyna qenc û xeraba namîne. Hikmeta Îlahîye jî, tefrîqa wan dixwaze bi delîla ayeta: "......" û ayeta: "......" Wekhevbûna wan xîlafa hikmetê ye, qenciya bi xeraba, xerabîya bi qenca bihtir xîlaf e. Ema teserufa di mulk de li ser wechê hîkmet û sewabê be caîz e. Ku ne wusa be, ne caîz e sefahet e. "Haşiya Musayeret".

Bînaen 'eleyhî, gotine:

- Xîlaf di we'îdê de jî ne durust e, lewra dibe derew. Eger yek bêje: Hinek mumin gunehê wan ê biçûk û mezin tev têne xefirandin digel ku di hinek ayeta de "We'îd" umûmî ye?

Cewab: Wana ji hikmê wan ayeta der in. Ancax nifûza ayeta "We'îd"ê di muminê xeyr ê mexfûr de ye. Bînaê li vê xîlafê, ku tu bêî: "Ya Reb, tu bixefirînî hemî gunehê mumina" durust e li nik Eş'eriyan, ne durust e li nik Matûrîdîyan. "Tuhfet-u Murîd", 17.

Ev îxtîlaf di şuxlê axretê de ye. Ema elem û belayê dunyayê elbete hikmet tê de heye bi îtîfaqa Eş'eriyan û Matûrîdîyan teva. Ew hikmet carna jî tê zenkirin, wek paqijkirina nefsê ji exlaqê xirabe, ku kibr û hesed û xeyrê wan in. Carna jî qet nayê zanîn, wek êşa heywana û zarûka. Lazim e em bêjin, qenc e û î'tîqad bikin ku tê de hikmet heye. Eqlê me nagihîjê. Teslîm wacib e: "......, ......" (Mana ayetê ev e: Emr û hikmet ji Xwedê re ne û hîç nayê pirskirin ji tiştên ku ew dike-w)
Hikmetê bi mana meslîhet û menfe'eta ku tertîb dike li fi'lê, ne bi mana xerez e ku 'iletê xaîye ye. Binhêre li s. 25 "Musayer"ê 181-186.

ERÊ: Wusa ye.
Yanî di nezera eqil de durust e ku Xwedê te'ala muminê bê guneh yê ta'etker bide 'ezabdan û tu qenciyê pê neke. Lewra kes ta'etê xwe îcad nake heta ku bibe musteheqê mukafatê. Belkî Xwedê te'ala îcad dike û qewetê didê, ku bike.
Hem durust e ku (Xwedê-w) gunehkaran têxe cenetê. Lewra kes gunehê xwe naxuliqîne heta ku pê bibe musteheqê 'ezabê. Belkî xaliq her Xwedê ye. Hem durust e ku

Xwedê te'ala teklîfa muhalê, ku taqeta meriv jê re tune li xelqê bike. Lewra hakimê mutleq e. Dunya û axiret û tiştê ku di wan de ne, tev mulkê wî ne, çi teseruf di wan de bike nabe zulm, î'tîraz lê nabe.

KEY BI ZULMÊ TEKELLUF DIKIT: Çewa bi zulmê tekelluf li 'îbadê xwe dike? Haşa summe haşa!

DI MULKÊ XWE DE EW TESERRUF DIKE: Teserufa di mulk de çewa be, bi çi terzî be, nabe zulm. Lewra zulm, teserufa di mulkê xeyra de ye.
Ev me'na, muhal e di heqê Xwedê te'ala de. Lewra tevê mulk ê wî ye, mulkîyeta heqîqî ji kesê dî re tune.
Yan zulm: Danîna tişt ne di cihê wî de. Ev mana jî qet nabe. Lewra Xwedê te'ala "Ehkem-ul Hakimîn" e û "E'lem-ul 'alimîn" e. Çi tiştê ku di ciheki de deyne, ew cih jê re (Ji tişt re-w) qencê ciha ye. Gerçî 'iletê qenciya wî (Tişt-w)li ser me xefî ye. "Celal Elel 'Ediyye", 203.

Tu bizan! Ev hersê beyt redda Mu'tezîlîya ne, ku gotine:
- Ne durust e eqlen ku Xwedê te'ala "Teklîfa malayutaq" li xelqê bike. Lewra sefahet e, wek emirkirina cemada (Tiştê bêlibat-w) bi şuxla ye.
Hem gotine:
- Ne durust e ku Xwedê te'ala êş û elem û 'ezabê bide mexlûqa, çi însan, çi heywan, çi di dunyayê de, çi di axretê de, îla bi sebeb sûc û gunehê wan ê pêşî. Weya bi sebeb ku paşê mukafat û sewabê bide wan.
Gotine:
- Elem û 'ezabê bê sebeb, zulm e. Zulm jî, qebîh e. Wacib e li Xwedê ku neke!

Tu bizan! Van mesela tev frû'ê (Şaxê-w) du esla ne, ku îx-

tîlafa Ehlê Sunnetê û Mu'tezîlîya di wan de waqi' bûye. Yek, husn û qubha ef'ala bi 'eqil tê zanîn, yan bi şer'ê (şerî'et-w). Beyana wê, di beyta 32 de ye.
Ya diduwa, li ser Xwedê wacib heye yan na? Beyana wê di vê beyta 29 de ye (Binêre li beyta 30-w).

**30- Li me ferz e herçî ji bo wî bi kêr**
**Ne ferz e li wî, ya ji bo me bi xêr**

BI KÊR: Mirad (bi-w) bikêrhatinê di vir de, layiqî û musteheqî ye. Yanî herçî tiştê ku layiqê Xwedê te'ala ye, li ser me ferz û wacib e, ku em wî tiştî bikin wek bicihanîna emr û nehya. Lewra ji bo wî qasî em anîne wucûdê: "......" (Min cin û însan peyda nekirine, îla ji bo ku ji min re perestinîyê bikin-w).

NE FERZ E LI WÎ YA JI BO ME BI XÊR: Li ser Xwedê te'ala ne wacib e, ku qenciyê bi 'îbadê xwe bike.

Ev, redda ser Mu'tezîlîya ye, ku dibêin: "Wacib e" (Yanî li ser Xwedê wacib e, ku hergav a çê li însanan û cinan bike-w).

Îbnu Ebî Şerîf di "Şerha Musayer"ê de gotiye:
- Meşhûr e ji wan (Mu'tezîîyan-w) ku pênc tişt li Xwedê te'ala wacib bin: Lefz û îhsan, sewabdana ser ta'etê, 'ezbdana ser gunehan, rî'ayeta tiştê ku çêtir e ji 'îbada re, mukafata di bedêla elema de ah.

Murada wan bi wacibê, fi'la ku nuqsanî bi terka wê sabit dibe digel ku mani'ê wê tune û da'îyê (Dozdar-w) wê heye, ku qudreta kamîle ye. Wê demê terka wê "Buxl" e, lazim e

tenzîha Xwedê jê bibe. Tiştê ku da'î wê bixwaze, terka wê ne mumkin e. Li ser gotina wan lazim tê ku tiştê di dunya û axretê (de-w) bibe, ya qenc her ew e ji 'îbada re.
Mesela: Ya qenc ji kafira re, ku ebedî di cehenemê de bimînin. Ji gunehkara re, ku di dunyayê de le'net li wan bibe û 'emelê wan betal bibe, çewa ku Mezhebê wan wisa ye.
Lewra ku ya qenc her ne ev be, wê bexîlî çêbibe. Lewra men'a ji eslehê digel ku qudret li ser heye, buxl e. Lazimê wan tê xetake "Salis" (Siyem-w) û pê qerar jî dane. Ew jî ev e:
Ku qudreta Xwedê li ser îslah û hîdayeta wan tune. Lewra texlîda wan di agir de me'lûmê wî bû, waqi'bûna xîlafa me'lûmê mehal e qudret xwe pê ve nagire.
Ev tev gotinê wan in (Mu'tezîlîyan-w). Ayeta: "......" redda wan dike.

Delîlê Ehlê Sunnetê: Ku qencîkirina bi 'îbada li ser Xwedê, ne wacib e. Ev eger wacib bûne, Xwedê te'ala kafirê feqîrhal nedixuliqand. Lewra tunebûna wî çêtir e da ku derdê dunyayê û 'ezabê axretê nebîne. Hem wê ji Xwedê te'ala re mineta li ser 'îbada tunebûna û nedibû musteheqê şukrê. Lewra di edakirina wacibî de minet tune, çewa ku di edakirina dîna de minet tune. Hem wê mineta Xwedê te'ala li Pêxember ne zêdetir bûna, ji mineta wî (Xwedê-w) li Ebûcehil mesela.
Lewra ji wî (E.Cehil-w) re wisa qenc bû, ji wî re wisa qenc bû li Mezhebê wan (Mu'tezîlîyan-w). Hem wê du'a bêfeyde bûna. Wekî ku meriv bêje: "Ya Reb, tu min muhafeze bikî, tewfîqa min bidî, min ji tengiyê derînî". Lewra vana jxwe "wacib in" ku Xwedê bike li nik wan (Mu'tezîlîyan-w), "Eger neke zerarê li xelqê dike, ne caîz e". Hem lazim e ku Xwedê te'ala "Enbiya û ewliya nemirandana, Îblîs û zuriyeta wî sax nehişta".

Institut kurde de Paris

Welhasil, em teslîm nabin ku terka qenciyê bexîlî ye, lewra qencî ne heqê kesî ye. Ji xeyrê Xwedê kes nikare de'we bike. Û sabit û muheqqeq e ku Xwedê te'ala xweyê kerem û hikmet e, bi aqîbeta her tiştî zane, tiştê ku bike ne xalî ye ji meslîhetê, gerçî di heqê meriv de ne qenc be. Lewra hemî ef'alê Xwedê te'ala munasibê eqlê eqilmenda ne, çewa ku layiq in wisa dike. Gerçî hikmeta hinka (Meslîhet-w) xefî ye, em pê nizanin. Tiştê ku li gor halê 'ebdekî qenc be û Xwedê wî tiştî neke, miheqeq di wê nekirinê de hikmet heye û 'aqîbetek baş heye, ne ku qisûr di kerem û 'edaleta wî de heye. Lewra heqê kesî wenda nake. Lewra heqê kesî li Xwedê te'ala tune. Eger qencî neke 'edalet e, ne bexîlî ye, ne zulm e, belkî meslîhet tê de heye.
Xulase: Tiştkî wacib bi tu haway li ser Xwedê tune! "Şerh-ul 'Eqaîd", "Xeyalî", "Seylekûtî", "Kestelî".

Tu bizan! Ev mesele, bû sebebê qetandina Îmamê Eş'erî ji seydayê wî Ebû 'Elîyê Cebaî yê Mu'tezîlî. Eş'erî got:
- Tu çi dibêjî di sê bira de yek salih, yek gunehkar, yek jî bi zarutî mir?

Cebaî got:
- Wê salih here cenetê, gunehkar here agir, ê zarûk cenet û cehenem jê re nîn in.

Eş'erî got:
- Eger yê biçûk bêje: "Ya Reb, te çima min mezin nekir ku ez biçûma cenetê?"

Cebaî got:
- Wê Xwedê te'ala bêje: "Eger tu mezin bibuna, tê gunehkar bibûna".

Eş'erî got:
- Eger ê gunehkar bêje: "Ya Reb, te çima min bi zarûtî nemirand, ji bo ez neçûma agir?", wê Xwedê te'ala çi bêje?

Cebaî heyirî cewab neda, ancax got:
- Tu pir zêde dikî.

Eş'erî got:
- Na! Welakin kewê Şeyx di palê çiya de sekinî.

Eş'erî terka wî kir û bû "Ehlê Sunnet û Cema'etê". Yanî ehlê riya Pêxember û eshaba.

**31- Îrade diket ew bi xeyr û şeran**
**Riza nîne emma bi fi'la şeran**

Îşaret dike ku ÎRADE û "razîbûn"a Xwedê te'ala ne yek in, belkî ji hev ferq in. Lewra îrade, carna te'eluq digerre bi tiştê ku Xwedê pê ne razî ye, wek kufr û gunehkariyê. "Razîbûn" bi mana qebûlkirina tişt û qencîkirina ji bo wî (tişt-w), ji emrê jî ferq e. Lewra Xwedê te'ala carna îrade dike û emir jî dike, carna na, ne emir dike ne îrade dike, wekî kufra mumina. Carna îrade dike lê emir nake, wekî kufra kafira û gunehkariya mumina. Carna emir dike lê îrade nake, wekî îmana kafira (Îmananîna kafiran-w).

Xwedê te'ala emrê wan dike bi îmanê, lewra hikmet û meslehet tê de hene di 'ilmê Xwedê de.Em nizanin. Yanî îrade 'am e. Xwedê te'ala çewa îrada qenciyê dike, wisa îrada xerabiyê jî dike, wek kufr û guneha. Lewra îrada wê (Xerabî-w) neke, gereke waqi' (Çênebe-w) nebe.

Institut Kurde de Paris

Lazim e em bawer bikin ku Xwedê te'ala xaliqê her tiştî ye. Lê ne durust e ku em bêjin: "Xaliqê tiştê pîsik e û xaliqê meymûn û xinzîra" (ye-w), îla ji bo te'lîmê.
Tê zanîn ku gotina 'amiya: "Neqşê Xwedê, mozê belek in" ne durust e.

Mu'tezîlîyan dibêjin:
- Tiştê qebîh, wek kufr û gunehan, ne bi îrada Xwedê ne. Ji wan (tîştan-w) dikerihîne, belkî bi îrada 'îbada ne.
Dibêjin:
- Xwedê îrada îmanê ji kafira dike û îrada ta'etê ji fasiqa dike. Gerçî waqi' nebin, îrada kufr û fisqê nake, gerçî dibin.
Delîla wan hinek ayet in, li gor fehma xwe mana dikin. Wekî ayeta: "......", "......", "......", "......"

Ev delîlanîna wan bîna ye li ser, ku îrade û muhebet û emir û razîbûn tev lazimê hev in, yek bê yekî nabe. Dibêjin:
- Emirkirina tiştê ku meriv pê ne razî ye, sefahet.
Li ser de'wa wan ku tiştê qebîh ne bi îrada Xwedê ne. Delîla wan a eqlî ev e ku "Îrade qebîhê, qebîh e"

Em redda wan (Mu'tezîlîyan-w) dikin:
Ewelen: Ku hemî kaînat bi îrada Xwedê ne. Bi gotina selefê salihîn: "Maşaellahu we ma lem yeşa' lem yekun". Yanî tiştê ku Xwedê bivê, dibe. Tiştê ku nevê, nabe. Û bi van ayeta: "......", "......", "......". Yanî hûn navên, îla ku Xwedê bivê. Yanî ku Xwedê te'ala îrad neke, hûn nikarin îrade bikin.

Ya Diduwa: Ku razîbûn û îrade ne lazimê hev in, bi delîla ku em carna îrada tiştekî dikin û jê dikerihînin. Wek nex-

weşê ku derman dixwe jê dikerihîne, ji ber ku te'ma wî ne xweş e.

Ya Sisiya: Ku emr û îrade ne lazimê hev in. Delîla me ev e, ku seyid (serok-w) carna emrê 'ebdê xwe bi tişkî dike, û îrade nake ku 'ebd bi xebera wî bike li hizûra yekî ku lewme li seyid kiriye di lêdana (li-w) 'ebd de. Xaya seyid ku heqiya xwe nîşan bide.
Emr û îrade ji hev qetiyan. Gunehkarî bi îrada Xwedê ne, ne bi emrê wî ne.

Ya Çara: Ku îradekirina tiştê qebîh ne zulm e, ne qebîh e. Lewra teserufa di mulkê xwe de çewa be, ne zulm e.
Zêdeyê wî qasî, Xwedê te'ala nayê sualkirin: "......", "......". (Pirs ji Xwedê nay kirin, ji bo tiştên ku dike, lê ji ber kirinên xwe dê hûn bêtin pirskirin. Çi tiştê ku Xwedê bivê wê bike û wê bi wan jî hukum bike-w).
Ancax kesba bi qebîhê û wesifkirina bi qebîhî, qebîh in. Ev herdu ji mexûqa re hene, ji Xaliq re nîn in. Tiştê ku em navê wî datînin "Qebîh", ji ber ku ji mexlûqa (mirovan-w) sadir dibe û xwe bi xwe pê zerarê li hev dikin. Ema xuliqandina qebîhê ku ji Xaliq sadir dibe, ne qebîh e.

SÛAL: Dema ku her wê murada Xwedê waqi' bibe û emrê 'îbada kiriye bi hinek tişta û îrada wuqû'a wan (tiştan-w) nekiriye bo "Tekîfa malayutaq" ku 'îbad wan tişta nekin û 'zab bide wan, ne layiq e?

CEWAB: "Teklîfa malayutaq" caiz e, lê waqi' nabe. Eger ku Xwedê 'ebdê xwe ceza ke, ew ceza ji bo ku bêemrî kiriye bi îxtîyarîya xwe. Lewra te'eluqa îradê bi gunehê wî ve, wî mecbûrê gunehkariyê nake û îxtiyara wî jê nastîne.
Tu esera îradê di wî tiştî de tune, çewa ku esera 'ilm di îca-

dê de tune di heqê wî kesî de, ku teklîfa wî kiriye bi îmanê û zane ku îmanê nayine.
Zanîn tesîr nake di kufrê de, tesîr xasîyeta qudretê ye, îrade sîfetek e wucûda qudretê xas dike bi weqtekî mu'eyyen ve, ku ew meqdûr her di wî weqtî de tê wucûdê.
Ji vî pê ve, şanê îradê tune. Lakin qudret, ancax li gor wufqa îradê tesîr dike. Yanî di wî weqtê ku îradê te'eluq girtiye bi wucûda wî tê de. 'Ilm jî, xwe bi vê tewafuqa qudret û îradetê ve digire. Paşî tiştê ku tê wucûdê bi ixtîyariya mukellefî li gor wî 'ilm û îradê û bi tesîra wê qudreta îlahîye di wucûda wî de tê wucûdê.

Bi vê teqrîrê, mana "Maşaellahu kane we ma lem yeşe' lem yekun" beyan bû. Yanî tiştê ku meşîet û îrada îlahîye xwe bi wucûda wî ve girtibe, wê bê wucûdê. Lewra 'ilm xwe pê ve girtiye. Tiştê ku îradê xwe pê ve negirtibe, nayê wucûdê.
Mesela: Eger tu bi terîqa (rê-w) hîsabê zanibî, wê çi rojê kusûf (hîvgiritn-w) çêbibe. Dema ku roj hat û kusûf çêbû. Qey tu zen dikî ku zanîna te ya pêşî tesîr kiriye di wuqû'a kusûfê de?
Na xêr!
A de tiştê ku li wuqûfa 'ilmê qedîm jî waqi' dibe, ancax bi kesb û îxtiyara 'ebd e, ne bi tesîra 'ilm e. Lewra sabit e ku ji 'îbada re meyl û îxtiyarî heye û qesda semîmî û tewecuha bi bal fi'lê ve heye.

Bi vê teqrîrê, delîla fasiqa betal dibe. Ku dema xirabî dikin dibêjin: "Bi qedera Xwedê bû". Lewra "qeza" û "qeder" selba 'ezm û îxtiyariyê nakin heta ku bibe cebr, û delîla wan sehîh be. Lewra murad bi qeza û qederê, yan xuliqandina fi'la ye. Ew (Xuliqandin-w) selba 'ezm û kesbê nake. Yan jî hikm e raci'ê bi bal sîfet û kelamê, yan sîfet û 'ilmê ve ye.

Ew bi terîqa ewla selbê nake. Ya qenc, rucû'a qezayê bi bal sîfet û 'ilmê ve ye.

Çewa ku Bedredînê Testerî gotiye:
- Qezaê 'ilmê Xwedê, bi eşyaa, di ezel de, bi 'ilmê qedîm e. Qeder, îzhar û îcada Xwedê bi qudreta ezelî, wî mayê ku 'ilmê Xwedê bi wucûda wî ve digire li wechê ku mutabiq e ji te'eluqa 'ilm re bi wucûda wî ve.

Seyid Şerîf di "Şerh-ul Muwaqif"ê de "qeza" û "qeder"ê wuha tarîf kiriye:
- "......" -Yanî di musteqbelê mute'aqib de- "......".
Durust e di te'rîfa qezaê de tu bêjî: "'Îlmullahî". Di bedêla "Îradetl'lahî" de.
Ema hedîsa: "......" Lewra Adem gotiye: "......". Murad pê, Adem di hucceta xwe de xalib gerriya di def'a lewma piştî tobê de. Lewra murad ji hedîsê: "......". Lewra îcma' (Piraniya alimên îslamê-w) waqi' e, ku lewma li ser guneha beriya tewbê ye. Ema piştî tewbê, lewme tune.
Gotina Adem: "......" hîkayeta waqi'î ye, ne ku delîl aniye bi qederê ji bo def'a lewma ser guneha mutleqa.

S (Pirs-w): Razîbûna bi qezaa Xwedê wacib e, temamê guneha jî bi qeza û qederê ne, lazim tê razîbûna bi guneha digel ku razîbûna kufrê, kufr e?

C (Bersîv-w): Ev lazimhatin memnû' e, belkî wacib e razîbûna bi qezaa ku hukmê Xwedê ye. Lewra sîfetê wî ye. Ema razîbûna bi meqdîyê ku gunehkariya sadirî ji însan e, ne wacib e. Lewra mute'eliqê wî yê sîfetî ye, bûye memnû'. Paşî bi mutabeqeta qezaê hate wucûdê li xîlafa razîbûna Xwedê te'ala.

Institut kurde de Paris

Ev cewabeke meşhûr e, lê îtraz li ser ku tu mana ji bo razîbûna bi sîfetê Xwedê tune. Ancax razîbûn, bi muqtezayê ye. Wê demê cewaba layiq ev e: Ku razîbûna bi kufrê ne ji heysiyet zatê wî ye, belkî ji heysiyet ku muqzî ye -Yanî bi qeza û qudretê çêbûye.

Seyid Şerîf di "Şerh-ul Mewafiq"ê de beyana vê meselê gotiye:
- Ji kufrê re nisbetek bi bal Xwedê ve heye bi î'tîbar ku fa'ilê wê ye û îcada wê kiriye. Nisbetek jî bi bal 'ebd ve heye bi î'tîbar ku mehellê wê (kufur-w) ye û pê tê wesifkirin. Înkara wê bi î'tîbar nisbeta diduwa ye, razîbûna pê bi î'tîbar nisbeta ewel e. Ferqa wan zahir e. Lewra lazim nayê ji wacibiya razîbûna bi tişkî bi î'tîbar ku ji fa'ilê xwe sadir dibe. Wacibiya razîbûna pê, bi î'tîbar ku bûye sîfetê tişkî dî.
Lewra ku ev sehîh be, wê wacib be razîbûna bi mirina Pêxembera ji heysiyet ku (Mirina wan-w) bûye sîfetê wan, ev betal e îcma'en. "Musayere we Şerhîhî".

Hîkayet: Îblîsê mel'ûn xwe ji Îmamê Şafi'î re îzhar kir, got:
- Ya Îmam! Tu çi dibêjî di wîyê ku min xuluqandiye ji bo muradekî xwe û min da şixulandin di muradekî xwe de Paşî eger bivê, wê min têxe cenetê û eger bivê, wê min têxe agir. Ew 'edlê dike, yan zulmê dike?

Îmam got:
- Eger te xuluqandibe ji bo murada te, ew zulmê li te nake. Û eger te xuluqandibe ji bo murada xwe, ew ne mesûl e, mexlûq mesûl in!

Îblîs heliya ji hev ket. Paşî got:
- Wellahî, ya Şafi'î, min bi vê meselê heftê (70) 'abid ji

’abidiyê wergerandin û min wan kire zendîq. "Tuhfet-ul Murîd".

Şeyx Efîfidîn li Misrê bû. Bihîst ku qetla ’am ketiye Bexdayê. Di rojekê de miljonek hatin kuştin û fileha, mishefa bi stuwê kûçikan ve kirin û camiyan gerrandin dêr û kitêbê îmaman avêtin çemê Dîcle, heta ku wekî purê (pir-w) hesp di ser de derbas dibûn.
Şeyx Efîfudîn vê tişta înkar kir, got:
- Ya Reb, ev çewa ye? Di wan de bêguneh û zarûk hene!
Paşî di xew de zilamekî dît, ku di destê wî de kîtabek heye. Rahiştê, dît ku tê de ev beyt hene: (Bi zimanê Erebî ne. Me ew nenivîsîn-w).

**32- Bizan bende muxtarê fê’la xwe ye**
**Ne xaliq ne mecbûrê fê’la xwe ye**

BENDE: ’Ebd. Yanî ’ebd di ekserê ef’alê xwe (de-w) muxtar e. Yanî serbest e, eger bivê dike, eger nevê nake. Lê di hinka de mecbûr e, wekî ku dişimite weya di xew de mîz dike. Hinka jî tesadufî dike, wekî ku tivingê berde nêçîrê li însanekî bikeve, weya bivir li darekê xe serê wî bipeke li însanekî bikeve. ’Ebd bi van fê’la ne mesûl e, çewa ku "Xadimî" dibêje.

NE XALIQ: ’Ebd, ne xaliqê fê’la xwe ye. Ancax xaliqê hemî ef’ala Xwedê ye, ’ebd sebeb e kesba fê’lê dike.

Ev redda ser Mu’tezîlîya ye, ku dibêjin: ’Ebd, fi’la xwe ya îxtiyarî dixuliqîne.

NE MECBÛR E: Ev reda ser Cibriya ye, ku dibêjin: He-

reketa 'ebd, wek hereketa dar û bera ye, çi dikin ji mecbûrî dikin, tu qudreta 'ebd û îxtiyara wî ji ef'alan re tune.

Ev betalekî 'eyanî ye. Lewra qenc dizanin ku hereketa destê sax îxtiyarî ye û hereketa destê lerzok mecbûrî ye. Mezhebê wan dimeşe bi bal înkara gelek ayet û hedîsa. Ji wî qasî, wan kafir dêrandine. Çewa ku "Şerha Nûnîya Xudur Beg" dibêje.

Xeyalî di Şerha wî de gotiye:
- Eger ji 'îbada re cuz û ixtiyarî tune be, wê firqa kafir û îmanê, qencî û xirabî tune be, wê teklîfa wan bi emr û nehya ne sehîh be, wê nebin musteheqê sewabê û 'îqabê. Hem wê ferq tune be di navbeyna filankesê limêjker û rojîgirt, û filankes sor bû, dirêj bû. Lewra tev bi îrada Xwedê ne ah.

Bedî'uzeman gotiye:
- "Cuzê Îxtiyarî" ji bo ku bibe merci'ê seyîata (xirabî-w) nefsê ji tinebûna mesûliyetê xelas dike. "Qeder" jî, wê ji fexr û xurûrê xelas dike. Qeder û Cuzê Ixtiyarî hidûdê îman û îslamê nîşan didin. Lewra her mumin her tiştê xwe heta fê'la xwe û nefsa xwe tedrîca dide Xwedayê xwe heta paşî ku ji teklîf û mesûliyetê xelas nebe, Cuzê Ixtiyarî dertê pêşiya wê, jê re dibêje: "Tu mesûl û mukelef î". Paşî ji bo ku mexrûr nebe, bi qencî û kemalatê ku jê sadir dibin, qeder li hember wê dertê, dibêje: "Hedê xwe nas bike, ê ku dike ne tu yî" (Yanê Xwedê ye-w).

Erê! Însan bi hukm Quranê ji hemî seyiatê (uneh-w) xwe mesûl e. Lewra ê ku seyiata dike, ew bi xwe ye. Bi yek seyiekê kare pir texrîbata bike, dibe musteheqê cezayê gran. Wekî ku bi niftikekê xaniyekî bişewitîne. Lê heq

Institut kurde de Paris

tune ku bi hesenatê xwe îftîxar bike. Lewra ê ku hesenata dixwaze rehmeta îlahî ye, ê ku wan îcad dike qudreta rebanî ye.

SÛAL Û CEWAB: Da'î û sebeb, herdu jî ji Xwedê ne. Însan ancax bi du'a û îmanê dibe sahib (xweyî-w). Ema ê ku seyiata dixwaze, nefsa însaniye ye. Yan bi îsti'dada xwe, yan bi îxtîyara (daxwaz-w) xwe. Çewa ku li ber tava xweşik û spî hinek madde reş dibin.
Ew reşayî, ayidê îsti'dada wî ye, sebebiyet û sual ji nefsê ye da ku mesûliyetê bikişîne, xuluqandin û îcada wan ku ayidê Xwedê ne, ne ji ber ku hinek qenciya netîce (ew îcad-w) didin. Ji vî sirrê ha ye ku kesba şerê şer e, xuliqandina şerê ne şer e. Çewa ku baran meslîhetê wê pir in, ku zerarekî bide însanê sist, nikare bêje: "Baran ne rehmet e". Xulq û îcada wê baranê, xêra pir e digel şerekî cuzî. Terka xêra pir ji bo şerekî cuzî, dibe şerê pir. Ji bo wî qasî şerê cuzî yê wê baranê dikeve hukmê xêrê. Di îcada Îlahî de şer û xirabî tune, belkî ayidê kesb û îsti'dadê 'ebd e.
Hem "qeder" muqeddes e ji zulm û qebîhê jî. Lewra li 'illetê heqîqî dinere 'edaletê dike. Însan hukmê xwe bîna ke li 'illetê zahirî yê ku dibîne, dikeve zulmê.
Mesela: Hakim li ser diziyê te hebs dike, ku tu ne diz î. Lê kes nizane ku qetleke te xefî heye. Qederê ji bo wê (Dizî-w) te hebs kir, 'edalet kir. Ema hakim wê zulmê kir, lewra tu masûm î ji diziyê.

Edaleta qeder û îcada Îlahî û zulma kesba însana bi du cîheta di yek tişkî de tê dîtin. Her tiştî li vê qiyas ke qeder û îcada Îlahî bi î'tîbara mebde û muntehaya, esl û fer'a, 'illet û netîceya, munezzeh e ji zulm û qebîhê. "Buyuk Sozler", "Soz" 26.

Institut Kurde de Paris

Mustefa Sebrî gotiye:
- Ji însan re qudret heye, lê tesîr nake. Jê re îrade heye, jê re îxtiyarî heye. Di te'eluqa îrada wî bi ef'alê wî ve îxtiyariya wî te'lîqî di destê wî de ye. Ehlê Sunetê weha gotine, paşê îxtîlaf kirine; ka îrade mexlûq e yan na.

Matûrîdîyan dibêjin:
- Îrada kullîye heye û cuzî ye. Îrada kullîye sîfetekî mexlûq e, tercîha yek ji herdu meqdûra dike.
Yanî kirin û nekirin bi yekî ji wan ve te'eluq digerre, la'elete'yîn. Îrada cuzîye ne mexlûq e, wek halê ku mutewesit e di navbeyna mewcûd û me'dûmê (hebûn û tinebûn-w) de. Emrê wê bi destê însan e, medarê tekîf û mesûliyetê ye, 'îbaretê ji te'eluqa wê sîfetê ye bi terefekî mu'eyyen ve ji fê'lê û terkê.

Carna dibêjin:
- Îrade, cuzî ye. Îstî'malkirina îradê kullîye ye di terefekî mu'eyyen de.

Eş'eriyan dibêjin:
- Herdu qismê îradeyê û te'eluqa wê ku fê'l e, yan terk e, tev mexlûq in.
Û dibêjin: Ef'alê însan disinidin bi bal îxtiyariya wî ve.
Lewma tê gotin, di Mezhebê wan (Eş'erî-w) de,"Însan muxtar e di fê'la xwe de, mecbûr e di îxtiyariya xwe de, sebeb ku ef'alê wê îxtiyariyê ne. Lewra spartine bi bal îxtiyara wê ve û îxtiyar ne spartî ye bi bal îxtiyareke dî ve. Mana ku "Însan Muxtar e di ef'alê xwe de" ev e
Gerçî ev îxtiyar îztîrarî ye ne di destê xwe de ye, ef'alê ku spartine bi bal îxtiyara îztîrarî ve, ew jî îztîrarî ne (Îdtîrar:Îztîrar: Mecbûr-w) lakin bîl wasîte. Lewra îztîrara wan bi wasîta ku îxtiyar îztîrarî ye (*).

Ji ber vî qasî navê Mezhebê Eş'eriyan danîne "Cebra Mutewessîte". Yanî "Cebra bîl wasîte". Ne "Cebra mu'tedî". Belkî gotine tam e.
Murada Eş'eriya bi cebrê ev e: Ku îxtîyara wasîta navbeyna cebrê û fê'lê ye. "Îxtîyar" neqla cebrê dike bi bal fi'lê ve. "Cebrî" li ser cebriyetê nahêle, belkî tebdîl dike bi muqtezayê tebî'etê xwe. Di mebdeyê de "cebir" hebû, lê ku "îxtîyar" kete wê navê, li ser tebî'etê xwe gerriya, cebr nema.

Matûrîdîyan ji bo ku xwe ji cebrê xilas kin, dibêjin:
- Însan muxtar e di te'eluqa îradê de bi fê'lan ve, weya di serfkirina wê di wan de.
Mana kesba 'îbada, ku te'eluq e bi sehalî tê fehmkirin. Ema di Mezhebê Eş'erî de dexla însan di fê'lê de, bi mana ku însan mehellê fê'lê ye û mehellê îxtiyariya fê'lê ye. Wê demê mana kesbê di xayetê xîfaê (xef-w) de ye (Heta ku derbumesele li serê anîne di wan umûrê ku eser ji wucûda wan re tune. Dibêjin: "Exfa mîn keseb-îl Eş'erî". Yanî flan tişt xefîtir e ji wî mayê ku tê nisbetdan bi bal însan ve li Mezhebê Eş'erî û jê re dibêjin: "Kesb".-mueîf). "Mewqîf-ul Beşer"

Ev sebebek ê tercîha Mezhebê Eş'erî ye. Lewra qeder sirrek ji esrarê Xwedê te'ala ye. Kîjan mezheb munasibê wê be, di xumûdê de ew nêztirê waqî'ê ye.

Mezhebê Matûrîdîyan besît e (fire-w). Delîleke cebrî 'ilmê Xwedê yê ezelî yê muhîtî bi hemî ef'alê 'ibada di "Malayeza" de, yanî di musteqble de, eger 'îbad di ef'alê xwe de derkevin ji mayê ku 'ilmê Xwedê pê heye, wê 'ilm bibe cehl. Însan bû mecbûr ku ef'alê wî li wufqa 'ilmê

Xwedê bin.
Delîlek jî ayeta: "......" Yanî hûn îrada tişkî nakin, îla bi meşîeta Xwedê ya ku di we de xuliqandiye û we gerrandiye mutesifê pê. Dema ku îrada meşîyeta we kir û wî da we, we bi wê îrada "Mateşaûne" kir. Eger ne wusa bûna, hûnê bibûna wek cemada (Tiştên bê rih-w). Ne mumkin bû, ku hûn tişkî bikin. Meşîet, bi mana îrade ye.

(*) Çewa ku ayeta: "......" , seraheten nutq dike bi mecbûriyetê û mesûliyetê, û qebûla tewîlê jî nake. Mealê ayetê ev e: Ku xeyr û şerê 'îbada tev bi meşîeta Xwedê ne û wê werin sualkirin ji 'emelê xwe.
Ayet, cem'a herduwa dike û mesûliyet ne zulm e. Lewra teserufa di mulk de ye. Hem mesûlîyet di hemî qanûnê dunyayê de heye. Eger miletekî ku î'tîqada "Cebra Mehd" dike, eger dewletekê tesîs bike, wê mehkema 'edliye deyne, da ku xweyê sûca ceza bike.

Ev halê ku xweyê her mezhebî û her 'eqîdê tê de muşterek in, kafi ye di mukelefbûna însan de bi teklîfa dunya û axretê. Dîsa cebra ku bi mana "Însan tabi'ê îrada Xwedê ye" jê muxalefet nake. Ji ber ku cebra manewî ye û naşibihe cebra bi mana ekrah. Ew (cebir-w) mana îxtiyara 'îbada nake û mesûliyet pê re sehîh e. Dema ku îrada Xwedê, îrada wan dide meylkirin bi bal fi'lê ve bê tezyîq û îrhaq (Tengayî û ehmeqî-w), belkî bi terîqa îqna' û razîkirina bi wê fê'lê û tezyîna wê ji wan re. Însan jî li gor wufqa îrada xwe û qena'eta xwe 'emel dike. Cebir li wir namîne, xilasiya ji mesûliyetê jî tune. "Mewqîf-ul Beşer"

Eger tu bêjî: "Îxtîyar" çewa îztîrarî ye?
Emê bêjin: Murad pê, wuqû'a îxtîyarî ye. Bêweku Xwedê

Institut Kurde de Paris

te'ala wî dixuliqîne bîl mubaşere, weya peyda dibe ji sebeb û mureccihan. Ne mumkin e ku îxtîyara ef'alê îxtîyarî, îxtîyarî be. Lewra lazim tê teselsul, û ne mumkin e ku "îkrahî" be. Lewra îkrah, îxtîyarîyê difesidîne.

Beyan bû, ku "cebir" ne bi wê mana ku mute'arîf e. Û te'bîra bi cebra mutewessîte ne rast e. Belkî cebra xefî û ya manewî û ya şubh-ul cebir çêtir in. Dema ku îxtîyarî kete navbeyna cebr û fê'lê, hukmê meşîeta Xwedê li ser fê'lê nebû ji cinsê cebr û îkrahê . Gerçî qewîntir e ji hukmê mukrihî li ser mukrehê. Lewra mukrih kare muxalefeta mukrehî bike, ku bi mirinê razî bibe. Lê muxalefeta îrada Xwedê nayê kirin, selteneta Xwedê mutleqa tenfîz dibe

**33- Muwafiq nebit qewl û niyet, 'emel**
**Li ba me dibîtin di îman xelel**

MUWAFIQ NEBIT: Eger nebe li gor qanûn û nîzama şerî'etê.

QEWL: Îqrara bi kelîma Şehadetê, bi zman.

Û NIYET: Tesdîqkirina me'na kelîma Şehadetê bi qelb.

'EMEL: 'Emelkirina bi azayan.
Yanî eger yek ji van hersiya nebe muwafiqê şer'ê bi rastî û dirustî, bêwekû nuqsaniyekê têxe yekê ji wan.

LI BA ME: Ehlê Sunnet û Cema'etê, DIBÎTIN DI ÎMAN XELEL: Nuqsanî dikeve îmanê. Ya zeîf dibe, ya difeside. Lewra eger nuqsaniyê têxe îqrarê kafir e, eger têxe tesdîqê

munafiq e, eger têxe 'emel fasiq e. Çewa ku Xadimî gotiye. Murad bi 'emel: Ferz û wacib in, ne sunnet û newafil in. Ev gotina Şeyx (E.Xanî-w), wekî tercumekê ye ji bo gotina Îbnu Reslan di "Zubed"ê de:

"We niyetun wel qewlu summe-l 'emelu
Bî xeyrî wufqî sunetîn la yekmelu"

Murad ji sunetê: Şerî'eta Pêxember e sew "La tekmelû". Yanî ne muteber e. Lewra gunehkarî ye, yan nêzê gunehkariyê ye. Lewra Xwedê gotiye: "......", "Xayet-ul Beyan".

Tu bizan! Îman, ka besît e, yan murekeb e ji du cuza, weya ji sê cuza? xîlaf tê heye.

Îmamê Eş'erî û Matûrîdî û tabi'ê wan gotine:
- Bbesît e. Yek tiştek e, ku tesdîq e.

Se'dedîn el Teftazanî gotiye:
- Ev Mezhebê Cumhûr, ê muheqqîqîna ye. Îqrara bi zman şert e ji bo ehkaman.

Gelekan gotine:
- (Îman-w) Murekkeb e.

Îmamê Henîfî gotiye:
- Îman, tesdîq û îqrar e.

Nesefî gotiye:
- Ev Mezheb, ê pirê Ehlê Sunnetê ye.

Se'd gotiye:
- Lakin tesdîq ruknek e qet saqit nabe, lê îqrar carna saqit

dibe; wekî ku yek bi qeweta cebrîye nehêle meriv îqrar bike. Ema di xeflet û xewê de tesdîq di qelb de heye, lê xefî ye. Lewra tiştê ku muheqeq be û ziddê wî lê peyde nebe, ew baqî ye di hukmê şer'ê de, heta ku "mumin" navê wî kesî ye ku îman aniye û elametê bêîmaniyê tê de xuya nebûye.

Dawud el Qersî di "Şerha Nûni"ya Xudur Beg de gotiye:
- Îman, li nik Cumhûrê Xelefî tesdîq û îqrar e. Lewra Pêxember sew û sehabiyan rd bi tesîqê tenê kafî nedidêran. Belkî teleba îqrarê dikirin.

Gelekan gotine:
- Îman, tesdîq û îqrar û 'emel e.

Se'd gotiye:
- Ev Mezhebê Cumhûr, ê Ehlê 'Eqîdê û Hedîsê û Fiqhê ye. Pirê selefa (ê salihîn-w) jî li ser in.

Xadimî gotiye:
- Li nik muheqqîqînê wan 'emel cuzek ji kemaliyeta îmanê ye.

Se'd gotiye:
- Mezhebê Şafi'î wusa ye. Kesê ku qet 'emel neke jî, ji heqîqeta îmanê dernayê.

Xariciyan dibêjin:
- Kesê ku 'emel neke, kafir e.

Mu'tezîliyan dibêjin:
- Ta'et, ruknek ji heqîqeta îmanê ye. Kesê ta'et neke ne mumin e, ne kafir e, di navbeyna kufr û îmanê de ye.

Yanî îmana wî ne kamil e, wê ebedî di cehenemê de be, lê 'ezabê wî hindik e. Lewra îman tenê li nik wan ne kafî ye ji bo çûna Cennetê, belkî lazim e 'emelê salih hebe û gunehkarî tune be, bi tobekirinê hê here cennetê.

**34- Mirovê bi îman di dojê muqîm**
**Bizan e ku namînitin, ey hekîm**

**35- Musulman bi qetl û zinayê çu car**
**Ne kafir dibe, ne muxelled di nar**

(Di Çapa Destnivîs de weha ne:
"Mirovê bi îman di dojê muqîm
Namînit, bizan tu hekîm."
Diyar e ku şaşî di rêza dawî de heye û kite kêm in.
"Musulman bi qetl û zinayê tu car
Ne kafir dibit, ne muxelled di nar"-w)

Institut kurde de Paris

DOJE: Cehennem.
Ev, cewab e ji bo sualeke muqedder, ku peyda bûye ji beyta pêşiya wê. Bêweku yek bêje: "Eger xelel kete îmana kesekî bi sebeb ku qet ta'et nekir, lê tesdîq kiribû bi wî tiştê ku tesdîqa wî wacib e", çewa ku di ewelê "Rehberê 'Ewam" de bihurî, "ew kes halê wî çewa ye?"

Şeyxê nazim (E.Xanî-w) cewab da ku:
- Eger ew kes bikeve cehenemê, çiqas tê de bimîne jî, hema ku îmana wî hebe, wê derkeve, ew ebedî di agir de namîne.

Çewa ku Muslim û Buxarî, ji Ebû Se'îd riwayet kirine ku:
- Pêxember sew gotiye: "Kesê bêje 'Laîlahe îllellah' û di

qelbê wî de wezna zerekê ji îmanê hebe, wê ji agir derkeve".

Ebû Se'îd gotiye:
- Eger şik çêbibe ji yekî re, bira ayeta: "......" bixwîne.

Ev beyt, redda Mu'tezîliya dike. Lewra dibêjin: "Kesê ku bikeve cehenemê, dernayê. Lewra yan kafir e, yan gunehê kebair kirine û bê tewbe miriye".

Li nik wan (Mu'tezîli-w), kesê ku gunehê kebair neke, yan bike lê tewbe bike, ew nakeve agir. Çewa ku "Şerh-ul 'Eqaîd" dibêje.

QETL Û ZINA: Yanî gunahê kebair kîjan dibe bira bibe, hema ku ne 'elametê kufr û tekzîbê bin.
MUXELLED: Ebedî.

Ev beyt, redda Mu'tezîliyan û Xariciyan tevde ye. Çewa ku di Hedîsa Muslim û Buxarî de ye, ku:
- Pêxember sew gotiye: "Kesê ku şerîka ji Xwedê re çêneke, wê bikeve cennetê, gerçî zina û diziyê bike". "Tac", 1/31.
Yanî însan çiqas gunehê kebair bike û bê tewbe bimre, di bin meşîeta Xwedê de ye; ku (Xwedê-w) bivê, wê 'efû bike bê 'ezab têxe cennetê. Eger bivê, wê têxe agir, paşî wê derîne.

Tu bizan! Mayîna ebedî di agir de, mezintir e ji her 'ezabê bûye cezayê kufrê ku mezintir e ji her sucî.
(Kufr û 'isyan ji ber ku ji new'ê texrîb û 'edemê ne, texrîbatê mezin li wan tertîb dikin. Çewa ku dema wezîfa gemîajo bikeve 'edemê, wê gemî xerq bibe, se'ya hemî

xizmetkra betal dibe. Lewra kufr gerçî yek seyîekî tenê ye, lê dibe sebeb ji bo bêqîmetiyê û tehqîra kaînata û tekzîba mewcûdata, ku delailê wehdaniyetê ne û tezyifa hemî teceliyatê îsma û sîfata, ji wî qasê tehdîdatê quranîye dehşetlî û 'ezabê ebedî ji kafira re 'eynê hîkmet û 'edaletê ne. "Buyuk Sozler", 2/93.-muellîf)
Eger bibe ceza ji xeyrê kafira re, dibe zêdetir ji sûc, nabe 'edalet. Li nik Mu'tezîliyan dibe ceza, ji bo gunehkarê bê tewbe.

Li nik wan, gunehkar, 'ezabê xwe li ser Xwedê wacib dike li gor 'edaletê. Çewa ku muminê mutî' mukafatê li ser Xwedê wacib dike. Terka wê ne sehîh e li gor eqil.
Ev wacibî, li nik Ehlê Sunnetê tune: Ancax mukafat fezl e, 'ezab 'edl e. Delîla wan î neqlî jî, ayeta: "......" û ayeta: "......" û ayeta: "......".

Cewaba Ehlê Sunnetê ev e:
Di ayeta ewel de, ... (bêjeyek nehate xwendin-w) îştîqaqê 'ilet hukmî ye. Yanî kesê ku muminekî bikuje, ji bo ku (ê kuştî-w) mumin e ne ji tu dînê dî ye, yanî ku qetla wî helal didêre, wê demê kafir dibe; wê ebedî di cehenemê de be.
Herdu ayetê dî, di heqê kafira de ne. Ema ku em bêjin "di heqê mumina de ne" wê "xulûd" bi me'na sekna drêj be. Yanî wê di agir de pir bimînin, hê derkevin.
Eger em weha cewab nedin, wê van ayeta mu'areze bikin bi hinek ayet û hedîsê ku delalet dikin li ser 'efwê û mexfîretê.
Ayet ev in: "......, ......, ......, ......". Hedîs ev in: "Se tertu ha 'eleyke fîd'dunya we ena exfîruha leke-l yewme", "Men leqîyenî bî turabî-l erdî xetîeten leqîtuhu bî mîslîha mexfîreten", "Fe uşhîdu kum înnî qed xefertu lehum we e'teytuhum ma seelû we ecertuhum mîmma estecarû". "Şerh-ul

'Eqaîd we Kestelî".

**36- Ji me'sîyyetan lazim e tewbe zû**
**Guneh nîne tewbe, nebîtin li dû**

**(Di Çapa Destnivîs de weha ye:**
**"Ji me'sîyyetan wacib e tewbe zû**
**Guneh nîne tewbe, divêtin li dû"-w)**

ME'SÎYYET: Guneh, bêemriya Xwedê te'ala.

LAZIM E: Wacib e û ferz e.

TEWBE: Di luxet de: Rucû' û veger e. Di şerî'et de: Vegera ji ef'alê pîs bi bal qenc ve ye.
Ew jî bi berhevkirina sê tişta tê meydanê: Qeli'andina guneha, yanî terka wan. Poşmaniya li guneha ji bo Xwedê, ne ji bo ku mûsîbet (bela-w) pê de hatiye. Niyeta qewîn, ku êdî guneha neke.

Eger zulmê li hinka kiribe, lazim e yan wî 'efû bikin, yan jî heyfa xwe jê hilînin, hê tewbe qebûl dibe. Eger îmkan nebû, bêweku pir cara zulmê kiriye, bira 'emelê salih bike û zarîn bike bi bal Xwedê ve. Hêvî heye, ku Xwedê te'ala xesmê wî bide razîkirin.

"Tewba Nesûh" ew e, ku heqîqî tewbe ke, şirûtê tewbê bi cih bîne. Dîsa ji şirûtê tewbê ye: Lazim e ku beriya "xerxer"ê be.

Çewa ku hedîs dibêjin: "Înnellahe yeqbelut'tewbet-el 'ebdî ma lem yuxerxir".

Institut Kurde de Paris

Xerxere ew e, ku ruh bighîje gewriyê. 'Elametê wê: Ku nikaribe avê daqurtîne. Çewa ku Xazin gotiye.
Eger ruh bighîje xerxerê, tewbe qebûl nabe. Lewra Melekilmewt dibîne; ji heyatê bêhêvî dibe.

Şertekî tewbê jî 'ezma ser guneha ye. Ew ('ezm-w) jî ancax sabit dibe, ku tewbedar karibe bike û zemanê îxtîyarî jê re hebe. "Munawî", 2/306.

Matûrîdîyan dibin:
- Tewba mumina di xerxerê de qebûl dibe, ya kafira qebûl nabe.

Tu bizan! Îmamê Eş'erî gotiye:
- Qebûla tewbê muheqqeq e.
Eger şirûtê wê li cih bin, bi delîla ayeta: "......". Lê ku meriv du'a dike: "Ya Reb, tu tewba min qebûl bikî", lewra meriv nizane ka şirûtê wê li cih in, yan na.

Îmam-ul Heremeyn û Qadî 'Iyad gotine:
- Qebûla tewbê zennî ye, lê nêzî muheqqeqê ye.
Lewra îhtîmal e, ku mana ayetê: "......" Ev xîlaf di tewba muminê gunehkar de ye. Ema tewba kafira qebûl dibe bê xîlaf, bi delîla ayeta: "......"

Tu bizan! Eger yekî ji gunehekî tewbe kir û dîsa kir, gunehê ewel nazivire. Ehlê Tesewufê dibêjin:
- Gunehê piştî tewbê, qebîhtir in ji heftê (70-w) gunehî.

GUNEH NÎNE TEWBE, NEBÎTIN LI DÛ: Gunehê ku tewbe jê re tune be, tune. Ji her gunehî re tewbe heye, ji xeyrê meksê. Tewba "Mekkasî" qebûl nabe.
Meks: Heqerd e. Mekas: Ê ku heqerdê distîne. Li kullê

hala, tewbe wacib e, texîra wê heram e, guneh pê (texîr-w) mezin dibin, bi tewbê mihû dibin. Bi delîla hedîsa: "Et'taîbu mînez'zenbî ke men la zenbe lehu".

Xwedê te'ala ji tewbedara hes dike. Lewra gotiye: "......", "Tuhfet-ul Murîd" bi ... (nehat xwendin-w).

**37- Ne me'zûr e cahil ku aqil bitin**
**Ji Xaliq bi cehla xwe xafil bitin**

CAHIL: Nezan.
Murad bi nezaniyê, ku haya wî ji pêxembera tune be, dengê îslamê qet ne bihîstibe. Wekî kesê ku di çiyayê xalî de dijî û wekî ehlê fitretê.

("Fitret": Sikûneta piştî şiddetê ye. Murad pê, sikûneta halê de'wa pêxembera ye, ku de'wa li xelqê dikin bi îmanê û bi tetbîqa ehkama.
Dema ku resûlek wefat dibe, şerî'eta wî nesx dibe. Yekî din jî hê ku nehatiye şandin, hal disekine dibe fitret.
Ev fitret, di navbeyna Idrîs û Nûh de, û navbeyna Îsa û Muhemmed de sew çêbûye.
Şerbînî di "Haşiya Cem'ulcewami'ê" de gotiye:
- Navbeyna du resûla, fitret e. Ji çi miletî dibin, bira bibin.
Benanî zikir kiriye ku:
- Navbeyna Îsmaîl û pêxemberê me sew ji 'Ereba re fitret e. Lewra di navbeyna wan de resûlê 'Ereba tune bûn. Gerçî ji xeyrê wan hebûn. Wek Mûsa û Harûn û Suleyman û Dawud û xeyrê wan es.
'Erebê ku di wî zemanî de bûn nayên 'ezabdan, li nik Eş'eriyan. Gerçî 'îbadet ji senema re dikirin. Lê Îmamê Newewî qebû nekiriye, wek Matûrîdiyan. (Î.Newewî-w)

gotiye:
- 'Erebê wê demê ku pûtperest bûn, ew ehlê agir in. Lewra de'wa Îbrahîm û xeyrê wî, gihîştibû wan.
Eş'eriyan cewab dane digel delîlê. Binhêre "Benanî", s: 63.
Şêx Muhyedînê 'Erebî, ehlê fitretê teqsîm kiriye li ser sêzde qisma: Şeş (qefle-w) se'îd in, çar şeqî ne, sisê di meşîeta Xwedê de ne. Da û babê pêxember sew ji eşrefê wan in.
Tefsîl di "Waqîyet û Cewahir"a Îmamê Şe'ranî de ye, s: 58.-Muellîf)

Yanî kesê ku xweyeql be ne dîn be û ne zarûk be, gerçî nezan be ji îslamiyetê re, tişkî jî nebihîstibe, eger bi sebeb wê nezaniyê ji xaliqê xwe xafil be Xwedê nas neke, ew ne me'zûr e. Yanî ew nezanî, jê re ne 'uzr e. Lewra eqlê wî kafi ye ku pê bifikire di mexlûqata de û bizanibe ku tev delalet dikin li ser xaliqê qedîm û sani'ê hekîm. Ew kes digel vî qasî ku Xwedê nas neke, kafir e. Ev, Mezhebê Matûrîdiyan e.

Şeyxê Xanî di vir de, wek wan meşiyaye. Mesneda wan, gotina Îmamê Henefî ye, gotiye: "'Uzr ji kesî re tune, ku Xwedê nas neke. Lewra xulqiyeta asîmana û erdê dibîne".

Hem gotiye: "Eger Xwedê te'ala resûla neşandibûna jî, wacib bû li xelqê ku Xwedê nas bikin bi eqlê xwe".

Delîlê Matûrîdiyan ev in:
- "......" (Ayeta Quranê-w)

Yekî ji 'arifîna gotiye:
- "......" (Bi zmanê Erebî-w).

Îsbata Xaliq di eslê xulqeta însan de heye, bi ayeta: "......". Yanî xwe lazimê fitreta Xwedê bikin. Û bi hedîsa: "Kullu mewlûdîn yûledû 'elel fitretî, fe ebewa hu yuhewwîdanîhî ew yunessîranîhî ew yumessîhanîhî".

Şêx Ebul Hesenê Eş'erî gotiye:
- Eqil bi tenê ne kafî ye di naskirina Xwedê te'ala de û naskirina sîfatê wî yê kemaliye de. Kesê ku dînê îslamê negîştibê ew mumin e, gerçî Xwedê nas neke. Lewra me'zûr e.

Beriya ku resûlê Xwedê te'ala teblîxa ehkamê îslamê bikin, tişkî wacib tune bû, îman ne wacib bû, kufir ne heram bû. Bi delîla ayeta: "......" û ayeta: "......" û ayeta: "......". Ancax wacibî û heramî bi şerî'etê têne zanîn. Li nik wan, ehlê fitretê wê tev xilas bibin.

Xalibê Xefiyan gotine:
- Kesê ku dengê îslamê negihîştibê mumin e, çi tesdîq bike çi neke. Lê bi şertê ku ewsafê kufra serîh tê de tune bin. Eger hebin, ew kafir e. Çewa ku "Telwîh" û "Mirat" dibêjin. Wellahu e'lem (Xwedê çêtir zane-w). "Şerh-ul Nûniye".

Xeyalî di "Şerha Nûnî" de gotiye:
- Eger ew kes ji kufr û îmanê nepeyive û îtîqada herduwa jî neke, ne ji ehlê agir e. Eger ji ehwalê kufrê bipeyive, ji ehlê agir e. Lewra delalet dike li ser zeman, firset û tecrube. Ew kes wê demê ne me'zûr e. Eger ew zeman nehate destê wî, ew me'zûr e.
Ev murada Îmamê Henefî ji gotina wî ya ku bihurî ah.

Tu bizan! Îxtîlafa Eş'eriyan û Matûrîdiyan di vê meselê de, fer'ê îxtîlafa wan e di tehsîn û teqbîha ef'ala de, ka eqlî ne

yan şer'î ne(?)

Eş'eriyan dibêin:
- Ef'alê 'îbada di nefsa xwe de nayên wesifkirin bi husn û qencî bi wasîta eqil.
Yanî nayê gotin: Filan fê'l bi hukmê eqil hesen e, yan qebîh e. Ancax fê'la hesen û qebîh bi şer'ê tê zanîn. "Filan fê'l şer'en qenc e" yanî medh û sewab lê teretub dike, weya "xerab e" yanî zem û 'ezab lê teretub dike.
Eger şari' fê'la ku qenc dêraye bigerrîne xerab, fê'la ku xerab dêraye bigerrîne qenc durust e eqlen.

Durust e ku Xwedê te'ala emrê kesî neke bi îmanê, kesî xweysewab neke ji bo wî gerçî qenc e. Û durust e ku nehya kesî ji kufrê neke û ji bo wî kesî 'ezab nede gerçî qenc e.

Werhasil, ne memnû' e di eqil de, ku kesî teklîf neke. Lewra dilrihetiya bi ta'et û şûkrê 'îbada û zerer û bihntengiya bi gunehakriyan jê re çênabin. Belkî di eqil de caiz e, ku 'ezab bide wî kesê ku zikra navê wî (Xwedê-w) dike ji bo şûkrê wî (Xwedê-w).
Lewra şukrê bê îzna Xwedê, teseruf e di mulkê xeyrî de bê îzn! Wê demê 'ezab dixwaze.
Eger (Xwedê-w) bi fezla xwe teleba zikra navê xwe nekira bi ayet û hedîsa, wê însan ji qubhê bitirysiya, lewra xwe dibîne ku pir heqîr e û zikra navê Xwedê carî dike li ser zmanê xwe digel 'ezemet û celaleta wî.
Hukmkirina bi husn û qubhê nabe, îla bi sehkirina ji enbiya. Hukim, ji eqil re tune. Belkî eqil aletê fehmkirina xeta bî û naskirina rstiya fa'ilî ye.

Matûrîdiyan dibêjin:
- Husn û qubha hinek ef'ala bi eqil tê zanîn, welew şerî'et

tune be: Wek husna îmana bi Xwedê û te'zîma wî û tesdîqa resûlan. Hem wek qubha nisbeta tiştê ne qenc bi bal Xwedê ve. Hem wek husna gotina rast û derewa bi menfe'et.

Yanî eqil îsbat dike, ku fê'la ku Xwedê li me wacib kiriye husn e, lewra sewab lê teretub dike. Fê'la ku men'a me jê kiriye qebîh e, lewra 'ezab lê teretub dike.

Yanî kesê eqilmend bi eqlê xwe zane, ku hukmê Xwedê di van de ev e, gerçî şer' warid nebe.

Eqil: Aletê naskirina husn û qubhê ye, ne aletê fehma xîtabê ye. Hakimê bi husn û qubhê, her Xwedê ye.

Mu'tezîliyan dibêjin:

- Hakimê bi husn û qubha ef'ala eqil e, şerî'et keşfa wan dike, neku îsbat dike. Ancax îsbata wan bi eqil e, îla hinek ef'alê hindik; îsnata wan bi şer'ê ye. Wek husna rojîgirtina roja paşî ji remezanê û qubha rojîgirtina roja ewel ji şewalê.

Ferqa Mu'tezîliyan û Matûrîdiyan ev e:

Mesela, sewabdana ser ta'et û 'ezabdana ser gunehan li nik Mu'tezîliyan wacib e, ku Xwedê bike. Eger neke qebîh e, lewra zulm e.

Li nik Matûrîdiyan: Lazim e ku Xwedê wusa bike. Lewra (Xwedê-w) we'de daye, we'da xwe naşikêne, neku wacib e. Eger we'de nedabûna û nekira 'edalet bû.

Ema li nik Mu'tezîliyan: Eger we'de nedabûna jî, dîsa wacib bû ku bike.

**38- Murovê nezan bit û nadan û sist**
**Dibîtin bi teqlîdê îaman durust**

(Di Çapa Destnivîs de weha ye:
"Mirovê nizane delîlan durust
Dibêjin, bi teqlîdê îman durust"-w)

NADAN: Farisî ye, bi mana nezan e. Zikra wê tekrar e, lê beyt pê saz dibe.

SIST: Yanî bi kêr nayê, ku wehdaniyeta Xwedê te'ala bi delîla îsbat bike.

TEQLÎD: Wergitina qeladeyê di stû de.
Di îstîlah de ev e: Ku gotina yekî qebûl bike û delîla wê nas neke. Wekî ku wê gotinê gerande qelade û di stuwê xwe de danî.
Muqelid: Kesê ku erkanê îslamê teva î'tîqad dike bê delîl.
Qelade: Xişrê gerdenê ye. "Tuhfet-ul Murîd", "Elî Qarî", "Xadimî".

ÎMAN DURUST: Îman bi teqlîdê durust e, li nik koma alimê îslamê ku Cumhûr û Ehlê Sunnetê ne. Bi delîla ayeta: "......" û hedîsa: "Men sela selatena we dexele mescîdena we esteqbele qîbletena fe huwe muminun".

Îman, sirf tesdîq e, ne tesdîqa ku çêdibe bi anîna delîlê. Lewra Pêxember û sehabiyan, îqrara bi zman bi Kelîma Şehadetê (her-w)gav didêran, di musulmaniyê de teleba delîlê ji kesî nedikirin.

Ema kesê ku gotine: "Îman bi teqlîdê ne sehîh e" wek Baqelanî û Esferanî û Îmam-ul Heremeyn, hinka gotine: "Îmamê Malik jî, lewma hinka gotine: "Muqellid ne mumin e".

Qadî 'Iyad jî gotiye:
- Teqlîd di 'eqîdê de nayê tesewurkirin.

Îbnu 'Etiye gotiye:
- Ayeta "......" dixwaze ku teqlîd betal be.

Murada wan, wellahu e'lem. Yanî ne sehîhê kamil e -belkî sehîhekî zeîf e. Lewra ku ne wusa be, wê bibe ne sehîh. Li nik Cumhûr, ev nabe.
Eger em bûjin: "Ne sehîh e", lazim e em hemî 'amiyan kafir bidêrin -ev qet nabe. "Xadimî".
Xulase: Îmana muqeledî sehîh e li nik her çar îmaman. "Elî Qarî".

Îbnu Hecer neqil kiriye ku:
- Naskirina Xwedê bi eslê fitretê ye. Bi delîla ayet û hedîsa ku bihurîn.

Ji wî qasî, Îmam Ebû Mensûrê Matûrîdî gotiye:
- Hemî hevalê me îtîfaq kirine, ku 'amî tev mumin in, xwedênas in, di nîvê cennetê de ne. Çewa hedîs pê hene, îcma' li ser e ah.

Tacuddînê Sebkî tehqîq kiriye, ku "muqeled" eger xwe bi gotina 'alimekî girtibe, bi girtineke qewîn, bi hawakî wisa ku ew 'alim ji gotina xwe vegere jî, muqeled venagere, îmana wî sehîh e li nik Eş'erî û xeyrê wî di ehkamê dînî û dunyewî tev de.
Eger ne wisa be, bêweku ew 'alim vegere, wê muqeled jî vegere, îmana wî ne sehîh e. Lewra ku tereddudeke hindik jî bikeve tesdîqê, îman tune. Gotina heq, ev e. "Bacûrî" û Elî Qarî.

Institut kurde de Paris

Îmana muqeledî, li nik Eş'erî sehîh e: Bi şertê ku hemî meselê 'eqîdê bi delîlê 'eqlî nas bike di qelbê xwe de, ne lazim e ku karibe bi zman bêje.
Muqeled, li nik wî (Eş'erî-w), ne muminê kamil e. Lewra gunehkar e, ku delîla nayine. Lê aqîbeta wî, ehlê cennetê ye. Lewra anîna delîlê, wacib e.
Çewa ku 'Eduddîn di "Muwafiq" de gotiye:
- Nezer -yanî fikr û anîna delîlê- wacib e şer'en, bi îttîfaqa ehlê Sunnet û Cema'et.

Dewanî gotiye:
- Lewra Xwedê gotiye: "......"
Yanî tu binêre û bifikire li eserên rehmetê û ni'metê Xwedê te'ala, ku bi baranê hasil dibin.
Û (Xwedê-w) gotiye: "......" ah.

"Nezer" du qism in:
Yek: Nezera Tefsîlîye, ku beyana 'îbareta ye di anîna deîlê de bi tertîba muqeddemata û bicihanîna şertê nezera sehîh e.
Mesela: Ku delîl bîne li ser hebûna Xwedê te'ala, wê weha bêje: "'Alem, hadis e (nûpeyda-w)". Ji hadisa teva re, muhdisek (çêkirox-w) lazim e. Netîce dide ku: "Ji 'alemê re muhdisek lazim e".

A diduwa: Nezera Îcmalîye, ku zanîna mealê vê delîlê ye. Bêweku zanibe ji erd û asîman re xwedakî heye, gerçî nizanibe 'îbareta beyan ke.
Ev, ji pirê 'amiya re heye, heta ji zarûka re. "Xadimî".

'Ellameyê Nûbî gotiye:
- Fikra di mexlûqa de û tesbîha weqtê brûska, new' û delîl e. Xeberdanê 'amiyan tije delîl in, dîlalet dikin ku Xwedê

qedîm e, sîfatê wî hene û 'alem hadis e.
Wekî niha dibêjin: "Xwedê te'ala asîma bê stûn xuliqandiye".

Sektanî gotiye:
- Di wan de muqeled hene, bû şubhe. "Tuhfet-ul E'alî".

Tatarxanî gotiye:
- Îmana bi tefsîl, ne wacib e -çewa ku wusa ji Îmamê Xezalî û Quşeyrî û xeyrê wan jî hatiye neqilkirin. Lewra ne şertê siheta îmanê be, belkî şertê kemaliyeta wê ye.
Îmana Îcmalî, li nik wan kafi ye.
Û (Tatarxanî-w) gotiye: Yekî ku nizanibe 'îbaretê spehî bêje, lê dema ku 'eqîda wî, jê, pirs kin, bêje "Ez nizanim ku weha ye", ew mumin e. Eger bêje "Ez nizanim", weya "Ez nizanim kelimeyê îmanê beyan kim", dînê wî tune, lazim e ji nû ve musulman bibe.
Eger zaruwek balix bû, kelîmeyê îmanê zanibe, lê nizanibe beyanê û me'na wan, û tedbîra me'aş û îdara xwe zanibe, ew wekî murtedda ye, ne mumin e.
Hen (Tatarxanî-w) neqil kiriye ku: Ne sehîh e nîkaha qîza balix, ku nizanibe ruknê îmanê çiwçi ne. Ev, belakî mezin e, xelq jî xafil e ah.

Welhasil: Îmana Teqlîdî gerçî caiz e, lê tehluke ye. Lewra eger hinek jê re şubhekê çêkin, îhtîmal e ku (îman-w) here. Nexasim weqta ku eqil zeîf dibe bi sekeratê û bi museletbûna şeytana, wê demê meriv ditirse, ku îman zail bibe. Ne'ûzubîlah! "Xadimî".

**39- Di weqtê 'ezabê Xwedê kit nuzûl**
**Li ser kafiran nîne îman qebûl**

(Di Çapa Destnivîs de weha ye:
"Di weqtê 'ezaba Xwedê ket nuzûl
Bi ser kafiran da, nîne îman qebûl"-w)

Murad bi "Nuzûla 'ezab"ê, ketina di sekeratê de û dîtina Melekilmewt e. Lewra wê demê kafir cihê xwe di agir de dibînin, çewa ku mumin cihê xwe di cenetê de dibînin. Bi delîla Hedîsa Buxarî:
"Men ehebbe lîqaelahî ehebbellahu lîqaehu, we men kerehe lîqaellahî kerehellahu lîqaehu" el hedîs.

Tê de (Hedîs-w) 'Aîşe re gotiye:
- Em tev ji mirinê dikerihînin. Pêxember sew got:"Lîqaa Xwedê ne mirin e, lakin mumin di ber mirinê de tê mizgînîdan bi razîbûn û kerameta Xwedê. Kafir di ber mirinê de tê mizgînîdan bi 'ezab û 'uqûbeta (Ceza-w) Xwedê te'ala".
Di Hedîsa 'Aîşe de: "Mumin di ber mirinê de sewaba xwe dibîne ji lîqaa Xwedê hes dike, kafir 'ezabê xwe dibîne ji lîqaê dikerihîne". "Qestelanî", 9/296.

NÎNE: Xeber e (Li gor giramatîka Erebî-w).
ÎMAN QEBÛL: Mubteda ye (Li gor giramatîka Erebî-w).
Yanî qebûla îmanê tune di wê demê de (Li ber mirinê-w), bi delîla ayeta: "......".
"be's" (Peyvika di ayetê de-w), şiddet e. "sunnet" (Peyvika di ayetê de-w), adet e.
Yanî Xwedê te'ala gerandiye adet, ku îmana halê BE'Sê ku weqta dîtina 'ezab e, qebûl nabe. "Rûh-ul Beyan".

Tu bizan! Dîtina 'ezab ancax di halê "xerxer"ê de ye, ku ji heyatê bêhêvî dibe. Wê demê çewa îmana kafira qebûl

nabe, wisa tewba gunehkarê mumin jî qebûl nabe. Bi delîla ayeta: "......"

Bexewî di Tefsîra Ayetê de gotiye:
- Tewba gunehkaran û îmana kafiran qebûl nabe, dema ku mirinê yeqîn bikin -bêwekê ketin ber sekeratê û Melekilmewt dîtin. Lewra ew dem, paşiya zemanê dinyayê û ewelê zemanê axretê ye. Lê beriya wê demê, welew bi zemanekî hindik be jî, (tewbe-w) qebûl dibe. Lewra rehmeta Xwedê te'ala pir e. Nêzbûna mirinê, ne mani'ê qebûla tewbê ye. Gerçî elametê wê xuya dibin, wek nexweşiya bêçare û qutbûna hereketa, çewa ku 'ulemayê tehqîqê gotine. "Rûh-ul Beyan".

Elî Qarî gotiye:
- Gotina Bexewî, qewîn e bi sê wecha.

1: Şertê qebûlê ev e, ku niyeta xwe qewîn bike ku nema wî gunehî dike. Ew niyet, ancax muteber e ku zen bike kare dîsa wî gunehî bike, lê nake. Dema ku mirinê yeqîn bike, zane nema kare bike. Lewma tewba wî qebûl nabe.

2: Gunehkar ku ji heyatê bêhêvî bibin, tev poşman dibin. Poşmanî jî, tewbe ye.
Hedîs jî dibêje: "Ettaîbu mînez'zenbî ke men la zenbe lehu". Lazim tê, kesê mumin qet nekeve agir digel ku bi ayet û hedîsa sabit e û muheqqeq e, ku wê hinek bikevinê.

3: Em mukellef in bi îmananîna bi xeybê. Lewra Xwedê te'ala gotiye: "......". Murad bi "xeyb"ê, tiştê ku ne'eyanî ye û îsbat dibe bi delîlê, hebûna zat û sîfatê Xwedê te'alla û hebûna pêxemberan û şer'a wan û rabûna qiyametê, ku mirin bibe yeqînî îman dibe 'iyanî, nabe xeybî, ne sehîh e.

Institut kurde de Paris

Ema ayeta: "......", grêdaye bi ayeta: "......" el ayet. Û bi hedîsa: "Înnellahe yuqbelet'tewbet-el 'ebdî ma lem yuxerxir". Yanî Xwedê te'ala tewba 'îbada qebûl dike, bi şertê ku mirin hazir nebûbe û neketibe halê xerxerê, çewa ku "Rûh-ul Beyan" dibêje.

Gelek ji 'ulemayê Şafi'iyan û Henefiyan, weke Subkî û Belqînî û Îbnu Cema'e û Qudsî û Tûnisî gotine: Di halê yeqînkirina mirinê û dîtina 'ezab de îmana kafira qebûl nabe, lê tewba mumina qebûl dibe. Lewra hê "recahî" ye poşmanî û 'ezma terka guneka bi ricaê sehîh in. Hem lewra kafiran xwedênenas in, ecnebî ne, nû dest bi îmanê dikin. Lê muminê gunehkar, xwedênas e. Halê wî, halê mayina ser îmana kamil e, mayîn ji destpêkirinê sehiltir e. Delîla qebûlê, ayeta: "......".
Di "Bizazî" de gotiye: "Qewlê sehîh ev e". "Tuhfet-ul Beyan".

Ji nezmê, ku Şeyxê Xanî gotina vana qebûl kiriye, lewra ji tewba gunehkara xeber nedaye.

**40- Ji bo 'asiyan nîne Tewbe rucû'**
**Ji weqta kî roj ji mexreb be tulû'**

**41- Ji 'ezl û gunahan nebî bûn berî**
**Ji bo qismê jin nîne peyxemberî**

(Eb beyta bi nimra 40 î, di "Rêberê Sanî" de tune. Me wê ji Çapa Destnivîs girte vir û li gor rêza beytan di ciyê wê de nivîsî. Û nimra 41 ê jî weha ye:
"Ji fê'la gunahan nebî ne berî
Ji qismê jinan nîne peyxemberî"

Sedemê jêderxistina beyta 40 î, ji Pirtûkê ev e: Di gunehkirina nebiyan (pêxember) de îxtîlaf heye: Ka wan jî guneh kirine, yanena. Lê bi piranî hatiye qebûlkirin, ku wan hîç guneh nekirine. Û hinek jî dibêjin, ku ji pêxemberan jî guneh peyda bûne.
Îcar li gor beyta (41) di Rêberê Sanî de, diyar e ku wan hîç guneh nekirine. Lê li gor ya di Çapa Destnivîs -eynî beyt- de, bi hevoka "... nebî ne berî", ne diyar e ka guneh kirine yan nekirine-w)

Hemî pêxemberan bêrî ne ji 'ezlê, bi îttîfaqa hemî aliman. Tu kes ji wan (Pêxemberan-w) ji merteba pêxemberitiyê 'ezil nebûye qet'en, di dunya û axretê tev de pêxember in. Nebîtî û resûltî, bi mirinê betal nabe. Lewra welîtîya welîyan bi mirinê betal nabe. Nebîtî, hemin betal nabe.

Hem temamê nebiyan berî ne ji hemî gunehên mezin û biçûk, çi berya nebîtîyê çi piştî wê, welew di haletê zarûktiya wan de; ne bi qestî guneh kirine ne bi sehwî. Lewra Xwedê te'ala zahir û batinê wan tev muhafeze kiriye ji hemî menhiyata. Gunehê zahirî wek zina, derew û xeyrê wan. Gunehê batinî wek kîbr, hesed, riya û xeyrê wan. (Pêxemberan-w) tiştê heram qet nekirine bi îttîfaqa hemî aliman, heta mekrûh û xîlafa ewelê û mûbah jî nekirine.

Eger tu bêjî: Carna (Gunehên pêxemberan-w) waqi' bûne. Wekî ku (Mihemed-w) Pêxember sew li piya av vexwariya û li piya mîz kiriye û di desmêjê de du cara av li azayê xwe kiriye?

Emê bêjin: Wisa kiriye! Ji bo beyan bibe, ku ew tişt caiz e, ne heram e -yan ji bo 'uzrekî ye- mûbah ji bo wî qasî ye. Yan ji bo qeweta ser 'îbadet e, yan meslîhetek tê de heye.

Lewra li ser pêxembera wacib e, ku ehkama beyan kin, ku wacib û caiz û xeyrê wan in. Hem em zanin ku hinek ewliya van tişta nekirine, îla ji bo meslîhetekê (kirine-w). Wê çewa enbiya bê sebeb bikin? "Tuhfet-ul Murîd".

JI BO QISMÊ JIN NÎNE PEYXEMBERÎ:
Îbnu Cema'et gotiye: Mêrantî, şertekî pêxemberîtîyê ye, di Mezhebê Ehlê Tehqîqê de.
Lê Îmamê Eş'erî û Qurtebî gotine: Na! "Elî Qarî".

Sebebê ku jin nabin pêxember: Lewra jinan(t)î sîfetekî nuqsaniyê ye, ne layiqê meqamê pêxemberîtîyê ye. Lewra jin naselihin ku bibin sultan û qazî di hedd (Cezakirin-w) û qesasiyetê (Kuştina ji ber hevdu-w) de.
Hem lewra Xwedê te'ala jina veqetandiye, ji ayeta: "......".
Hem lewra resûl: Divê ku eşkere de'wa resûltîyê bikin. Jin jî, lazim e ku sitirkirî bin, di hundur de bin, eşkere nepeyvin, neçin cem zilama. "Tuhfet-ul E'alî" weha neqil kiriye ji "Nûbî".
Li ser herdu 'illetê pêşî, î'tîraz hene. Tehrîra wan, kelamê dirêj dixwaze.

**42- Weliyyan keramet dikin jê zuhûr**
**Dikin xerqê 'adet gelek jî zuhûr**

(Di Çapa Destnivîs de weha ye:
"Dikin herfê 'adet gelek jî sudûr-w)

Yanî keramet ji weliyan zahir dibin, kerametê wan heq in. Lewra gelek tiştê xarîq-ul'adet ji wan sadir û peyda dibin.

Institut kurde de Paris

"Welî" di luxet de: 1- Muhib, 2- Alîkar, 3- Nêz, 4- Azadkirox, 5- Seremr, 6- Teserrufkirox.
Di şerî'et de (Welî-w): Kesê xwedênas e digel sîfatê wî û hemî şuxlê lazim di dîn de li gor îmkana wî, li ser ta'etê dewam dike, xwe diparêze ji hemî sûc û gunehan heta ji mubaha, xwe ji dunyayê vedigire berê xwe dide axretê.

KERAMET: Tiştê ji adetê der peyda dibe bi sebeb ta'eta pir û naskirina Xwedê te'ala digel sîfatê wî, xalî ye ji de'wa nebîtîyê. Wekî ku di saetekê de ji Şamê here Mekkê û fêkiyê havînê di zivistanê de hazir bike û li ser avê bimeşe û bifire wek teyra û xeyrê wan.

"Mu'cîce": Tiştê ku ji adetê der zahir dibe li ser destê wî, kesê ku de'wa pêxemberîyê dike digel tehdeya munkira.

"Her mu'cîze nabe keramet". Lewra sabit e ku Mûsa es şqamekê li Ezralî da çavê wî kor kir. Welî nikare wisa bike. Lewra Ezraîl ji hemû weliya efdeltir e. Bi vê beyanê derewa Tefrîh-ul Xatirî 'eyan bû, ku dibêje: "Şêx Ebdulqadirê Gêlanî erwah ji Melekilmewt stendine.

Mirad bi "Tehde"yê, sewqa bi bal îmana bi Xwedê ye, ku de'wa rîsaletê ye.
Mu'cîze, ji kerametê firq nabe, îla bi "Tehde"yê tiştê ku durust e bibe mu'cîze ji nebî (Pêxember-w) re. Durust e ku bibe keramet ji welî re. Lê gelek alima qebûl nekirine, gotine: Her mu'cîze nabe keramet.

Çewa ku Îbnu Rislan gotiye:
"......". Yanî, ewliya xweyê keramatê muxtelîfe ne. Lakin negihîştine dereca ku weledekî bê bav çêkin, weya kevirekî bikin heywan.

Institut kurde de Paris

Mesela çewa ku Îmamê Quşeyrî gotiye:
".......". Meqsud ji keramatê: Xarîq-ul'adetekî wusa ye ku munkir nikare tiştê wek wî derîne.

Mu'teziliyan, kerameta înkar dikin. Dibêjin ku: (Eger keramet-w) heq bin, wê mu'cîzat neyêne naskirin.
Cewaba wan sehl e bi ferqa navbeyna keramatan û mu'cîzeyan ku vê gavê bihurî.

Tenbih! Bibe talibê îstîqametê, nebe talibê kerametê. Nefsa te, kerametê divê. Rebê te, îstîqametê divê. Eslê mezin, rahê sadiqan îstîqamet e. Kullê kerameta jî ew e.
Ema sebebê ku 'abidê muctehid xwestine, ku tişkî ji kerameta bibe nesîbê wan da ku yeqîna wan zêde bibe û qesda zuhdê (zahidî-w) û derketina ji de'wên nefsê qewîn bibe. "Tuhfet-ul E'alî".

XERQÊ 'ADET: "Xerq", mesdere e (Înfînîtîv-w) bi mana îsmufa'il e. Yanî Xarîq-ul'adet, yanî tiştê ji 'adetê der. Xarîq-ul'adet, şeş in:

1-2: Mu'cîze û keramet.

3: Îrhas. Yanî peydabûna tiştê xarîq-ul'adet, ku delalet dikin li ser be'seta (hinartin-w) Pêxember berya nebîtîya wî: Wek nûra ku xuya dibû di eniya abaê (bab û bapîran-w) Pêxember de sew. Hem wek 'elametê ku li nik wîladet (jdayikbûn-w) û şîrdayina wî, peyda dibûn. Çewa ku kitêbê Siyerê dibêjin.

4: Î'ane, ku peyda bibe ji yekî salih.

5: Îstîdrac, nêzbûna bi bal 'ezabê Xwedê ve ye tedrîcen.

Yanî, hin bi hin ku Xwedê her ihtiyaciyê yekî diqedîne, zen dike ku ji qenciya wî ye. Wek Fir'ewn û Deccal û xeyrê wan, kî dibe bira bibe.

6: Îhanet (Bi tîpa "h"ê ya di serê navê Harûn de-w). Yanî rezîlkirina ku xarîq-ul'adet muxalifê de'wayê be. Wekî ku Museylemetê kezzab got: "Mu'cîzeta min ev e, ku bizin bipeyve".
Bizinê got: "Tu kezzab î, ya mel'ûn".
Bizin peyivî, lê muxalifê de'wayê.
Tif kir çavê yekî kor ji bo rihet bibe, çavê sax jî kor bû. Du'a kir ku ava Bîrê zêde bibe, ava bîrê ku tê de hebû çikiya, ziwa bû.
Dema wusa bûn, got: "Ez, pêxemberê îfsadê me. Muhemed, pêxemberê îslahê ye".

Hinka gotine:
- Xarîq-ul'adet heşt in. Ê hefta, sihr e. Ê heşta, îbtîla ye. Wekî ku yek bi nexweşiya pir giran bikeve, ji adeta wê der be.

Dawudê Qesrî gotiye:
- "Sihr" li nik 'Ulemayê Tehqîqê tişkî adetî ye -ne xarîq-ul'adet e. Eger yek şirût û esbabê wê pêk bîne, wê Xwedê te'ala li ser destê wî çêke. Em bi esbabê wê nizanin, li nik me xerîb e ah.

Alûsî gotiye:
- "Sihr" ne xarîq-ul'adet e, lê dişibihe bi wê. Lewra bi te'lîmê tê meydanê. Tehsîla wê, bi îrtîkaba qebaiha (xirabiyan-w) ye. Wek elfazê şirkê û medhê şeytan û 'îbadetê ji stêra re û enwa'ê fasiqîya.
Kesê ku van tişta bike, dibe munasibê şeytana, (şeytan-w)

Institut kurde de Paris

alikariya wî (kesî-w) dikin. Lewra tenasubê şertê alikariyê ye. Lewra şeytan ancax alikariya wî kesî dikin, ku dişibihe wan di necaset û xebîsîyê de bi qewl û fê'l û î'tîqadê. Çewa ku melaîket ancax alikariya kesekî dikin, ku dişibihe wan di dewama ser 'îbadet û teqeruba (nêzbûna-w) bi bal Xwedê te'ala ve bi qewl û fê'lê.
Bi vî tiştî sihirbaz vediqete ji nebî (Pêxemberan-w) û weliyan.

Li nik Cumhûr, ji sihrê re heqîqet heye:
- Sihirbaz digihîje dereca ku bifire di hewa de û li ser avê bimeşe û nefsa bikuje û însana bigerîne ker.
Fa'ilê heqîqî, her Xwedê te'ala ye. Lakin (sihirbaz-w) nikare behrê bike şeq û meriya sax bike û heywana bide peyvandin û xeyrê wan ji 'elamatê pêxemberan... "Rûh-ul Beyan" 1/338.

Sebebê ku keramet di zemanê eshabe û tabi'înan de hindik bûn: Lewra 'eqîda wan li gor mêzîna şer'ê bû. Ema 'eqîda miletê piştî wan, zeîf bû. Weliyan kerameta nîşanê wan didin, da ku î'tîqada wan di heqê saliha de hebe û hogirê qenca bibin -da ku îslamîyet xira nebe. "Tuhfet-ul Murîd".

**43- Xwedê dê bibînin musulman bi çav**
**Wekî sahî bitin heyiva tevav**

**44- Ji bîr dê bikin ni'meta cennetê**
**Wekî dest bidin deweta ru'yetê**

(Di Çapa Destnivîs de weha ne:
"Xwedê dê bibînin musulman bi çav

Wekî li sayî bitin hîva şivav".
"Ji bîr dê bikin ni'meta cennetê
Wekî b'dest keve dewleta rûyetê"-w)

TEVAV: Em rastê mana wê nehatine. Lê meqam dixwaze ku bi mana geş, yan temam be. Yanî wê di axretê de musulman Xwedê te'ala bibînin bi çavê serê xwe, wekî ku hîva geş di sahiyê safî de dertê û xweş tê dîtin. Bi delîla ayeta: "......" û hedîsa: "Înnekum se terewne rebbekum kema terewn-el qemere leylet-el bedrî la tudammûne".
Yanî hûn bi şik nakevin, hunê muheqqeq zanibin ku we Xwedê te'ala dît, lakin bê keyfiyet.
Yanî ne di tu mekana (dever-w) de û bê cîhet û mesafe di navbeyna ra'î û mer'î de; naşibihe tişkî û reng jê re nîn in. (Ra'î: Kesê ku dibîne. Mer'î: Tiştê ku tê dîtin. Lê bi mana ferhengokî, kesê bi hêz û bi man mirovatî jî tê-w)

JI BÎR DÊ BIKIN: Yanî wexta ku musulman dest bi wê dewleta mezin bikin, ku dîtina Xwedê te'ala ye, wê lezetê ni'meta cennetê digel hor û gusûra (Qesr-w) tevî ji bîr bikin.

Çewa ku Pêxember sew gotiye:
"Înne'lahe 'ezze we cele yetecela lî ehl-îl cennetî. Fe îza reew hu yensewne ne'îm-el cennetî".
Lewra temamê ni'meta, li gor lîqya Xwedayê kerîm wek heba xerdelê, li gor xizna mezin e.

Mu'teziiyan înkara dîtina Xwedê dikin. Delîla wan ayeta: "......" û ayeta: "......"

Ehlê Sunnetê, cewaba wan dane: Ku mana "......". Yanî ebsarê (dîtin-w) mexlûqa îhate nakin bi 'ezemet û celaleta

Xwedê te'ala.

"Îhate", yanî îdrak û zanîna bi zahir û batinî û batinê tişta ye bi temamî.
Yan murad bi ayetê, nefya 'umûmî ye. Yanî temamê besera nabînin. Belkî hinek dibînin, ku beserê mumina ne. Lê beserê kafiran wî (Xwedê-w) nabînin.
Piştî ku van tewîla li ayetê dikevin, ayet delalet nakin li ser nedîtinê.

Ema ayeta: "......" Murad pê, yanî: Ya Mûsa, tehemula te û taqeta te di halê hazir de li ser dîtinê tune.

Ema "Len...", ew ji bo tekîda nefyê ye, ne ji bo tabîda nefyê ye.
Paşî Xwedê te'ala ji Mûsa es re, mîsalekê beyan kir bi çiya. Yanî xulqiyeta çiya, ji xulqiyeta însan pir qewîntir e û jê sabittir e û bêtir qerar digire. Digel wî qasî taqeta wî (çiya-w) ji dîtinê re tune.
Çewa ku Xwedê gotiye: "......"
Paşî got: "......" Yanî dema ku Xwedê te'ala nûra xwe ji çiya re zahir kir, wî gerrande medkûk. Yanî (çiya-w) hedimî, heta bû ax ji heybeta Xwedê te'alla.

Ew çiya navê wî "Zebîr" e, ne "Tûrisîna" ye. Ev ayeta: "......" jî, delalet nake li ser nedîtinê.

Piştî ku te ev tev bihîst, tu zanibe ku dîtina Xwedê te'ala di dunyayê de jî durust e eqlen. Di eqil de, manî'ê caîziyê tune. Belkî delîla neqlî heye, (ku-w) teqwiya eqil dike.
Delîla neqlî li ser caîziya Xwedê di dunyayê de, suala Mûsa ye es, ku got: "Rebbî erînî enzur îleyke".

Lewra (Mûsa-w) ji Ûlul'ezma ye, tiştê ne caiz e naxwaze, nabe ku ji tiştê weha re cahil be. Bi hemû ehwalê rubûbîyetê zanibû. Lewra (Mûsa-w) ji mezinê resûla bû. Ku dîtina Xwedê te'ala ne caiz bûna, nedixwest.

Erê, dîtina Xwedê di dunyayê de caiz e. Lê kesî nediye ji xeyrê Pêxember (Mihemed-w) sew. Lewra qeweta beşerî zeîf e, muxeyer dibe, qabilê fenayê ye. Ne mumkin e, ehlê fenayê Xwedayê baqî bibînin.

Weqta ku qiyamet rabe, wê Xwedê te'ala xulqiyeteke dî bide wan û quweteke baqî bike rizqê wan û nûra beser û qelbê wan temam bike. Wê demê wê karibin Xwedayê xwe bibînin. Ev qewet û nûra ha, Xwedê te'ala di dunyayê de nedaye kesî, ji xeyrê Pêxemberê me sew.

Qadî 'Iyad gotiye:
- (Xwedê wê qewetê-w) Daye Mûsa jî es.

Ebû Bekrê Baqelanî û Cafer-us'sadiq gotine:
- Mûsa Xwedê te'ala dît, dema ku tecela (eşkere-w) kir ji çiya re, lewma bêhiş ket.

Ema xeyrê van herdu pêxemberan, kesê ku de'wa dîtinê bike, gelek aliman gotine "kafir e", gelekan jî gotine "fasiq e û ehlê zelalê ye".

Kelamê sofiya ku dîtinê divê, lazim e bête tewîlkirin. Ema dîtina Xwedê di xew de, ew durust e di eqlê sehîh de, welew li ser sûretekî xisûsî be. Lewra xewn, ji teserufatê xeyalî ye, munfek nabe ji sûretê mutexeyile yê di alema mîsala de.

Evqas bes e! Eger te tefsîla zêde divê, binihêre "Şîfaê" û Şarha wê. "Şehab" cid: 2 û "Tuhfet-ul E'alî" 'ela haşiyetî "Şerhî Bedeî-l Emalî". Û "Hedîqetun'nedîyet Şerhut'terîqet-îl Muhemmedîyetî Lîl Nabîlsî", s: 310.

**45- Betal e tenasux, muhal e hulûl**
**Meke îttîhada du tiştan qebûl**

PARIS

TENASUX: Ji nesxê ye, bi mana neql û îzale ye.
Mezhebê Tenasuxî: Neqilbûna ruha ye di ceseda de, ji şexsekî ku derdikeve dikeve yekî dî. Eger ruh qenc û paqij be, dikeve cesedekî xweşik û bi lezzet, tê de xweyni'met dibe. Eger pîs be, dikeve cesedekî pîs û qebîh, tê de 'ezab dibîne, wek sûretê sehê, yan kerê, yan gayê cot. "Şehab 'elel Şîfa".

'Eqîda Ehlê Tenasuxê ev e: Ku ruh cesedekî bedel dike bi cesedekî. Dibêjin: Dema ku ruh ji cesedekî diqete neqil dibe bi bal cesedekî dî ve, di vê dunyayê de cesedê sanî ji ê ewil re ne muxalif e.
Yanî mutefiq e digel wê heyata ku însan wê (jiyan-w) ji xwe re hazir kiriye bi 'emel û efkarê ku di heyata ewil de hebûn, ku 'emel û fikrê wî pîs bin. Ruhê wî neqlê tebeqekî qirêjokî dibe wek tebeqa heywana û nebata.
Lê ku 'emelê wî û efkarê wî salih bin, ruhê wî terqê dike bi bal tebeqekî qenc û bilind ve.

Xulasa vê 'eqîdê ev e, ku mukafat û 'ezab di dunyayê de ne. Goya erwah ancax têne dunyayê carekê piştî carekê di ceseda de diçin-tên, ji bo bigihîje mukafat weya 'ezaba - yanî axret tune. Ev 'Eqîda Tenasuxî kufr e, bê şibhe. "Şîfa".

HULÛL: Ketina tişkî di tişkî de ye, ku jê (ew tişt-w) re dibe tabi'.
Mezhebê Hulûlî ev e: Ku Xwedê te'ala bikeve bedena hinek însana li gor ze'ma wan.
Wê demê hebûna wî (Xwedê-w) nabe wacibm. Lewra dibe tabi'. Hem dibe muhtacê bi bal cihekî ve. Lewma Ehlê Hulûlê kafir bûne, wek Filehan ku dibêjin: Zatê Xwedê ketiye bedena Îsa es.

Hem wek Îshaqî û Nesriyan, ku du taîfe ne ji rafiziyan, dibêjin:
- Ruhê Xwedê te'ala ketiye bedena her duwazdeh Îmaman. Ku Hz.Elî re. û ewladê wî ne.
Navê wan ev in: Hesen, Huseyn, Elî-Zeynulabidîn, Muhemmed-ul Baqir, Ce'ferus'sadiq, Mûsa el Kazim, Elî el Redî, Muhemmed el Teqî, Elî Binu Muhemmed el Teqî, El Hesen-ul Eskerî, Muhemmed-ul Muntezir-îl Mehdî.
Li nik wan rafiziyan ev her duwazdeh Îmam, ê Îlahî ne.

ÎTTÎHAD: Bi mana yekbûna du tişta ye, yan zêdeyê diduwan.
"Îttîhada du tiştan" mehal e. Welew herdu zat mexlûq bin. Dema ku wusa ye, wê çewa zatê qedîn (Xwedê-w) û zatê mexlûq bibin yek?

MEKE ÎTTÎHADA ... : Ev de'wakî salis (siyem-w) e, di vê beytê de, ne ku delîl e ji bo îbtala "Hulûl"ê, gerçî îttîhad û hulûl nêzê hev in.

Îttîhad sê qism in.

Yek: Ku tiştek bi eynê xwe bibe tişkî dî. Ev mehal e (nebûy-w) qet'en. Lewra herdu tiştê muttehid ku baqî bimînin

ew didu ne, îttîhad tune. Eger fena bibin ew me'dûm in, dîsa îttîhad tune. Eger yek fena bibe û yek baqî bimîne, dîsa ne îttîhad e, belkî yek heye yek tune. Mude'ayê me, jê, ku herdu jî mewcûd bin piştî îttîhadê.

Didu: Ku tiştek dem (tîpa "dat"a Erebî-w) bibe bi bal tişkî dî ve, ku heqîqetek ji wan hasil bibe, wek axê ku bi demma avê dibe herî.

Sisê: Ku tiştek bibe tişkî dî bi wergerandinê. Wekî ku av dibe hewa, weya tiştê spî bibe reş.

Ev tev, di heqê Xwedê te'la de mehal in. Îttîhada heqîqî ji hersiya, a ewil e. Herduwê dî, îttîhada wan mecazî ye. Lewra ax ku dibe herî ancax bi demma avê çêdibe, av jî ku dibe hewa bi zewala avîtîyê ye, spî ku dibe reş bi zewala spîtîyê ye.
Şertê îttîhada heqîqî jî, ku demm û zewal tunebin. Ew jî (Îttîhad-w) mehal e. Lewra bedîhî ye, ku Zeydo-'Emro nabin yek însan, mesela. "Celal elel 'Ediyyetî". ("Zeydo" û "'Emro" du navên xeyalî ne, ku di gramatîka Erebî de tên bikaranîn-w).

Îbtala hersê qismê îttîhadê digel delîlan, mufsel e tê de (Di pirtûka "Celal" de-w) digel haşiya wê. Îsmaîlê Gelenbewî.

Hinek şuxul û kelamê sofiyan, ku hulûl û îttîhadê dixwazin, lazim e tewîl bibin bi heqîqetê. Lewra meşayixê mezin bêrî ne ji van tiştan. "Şehab".

Tu bizan! Filehên ku de'wa Îttîhadê dikin, bêtir in ji filehên ku de'wa Hulûlê dikin. Redda teva ancax bi îbtala Hu-

**lûl û Îttîhadê tev de tê meydanê.**

**46- Eger tiştikî pur mucezza bikî**
**Qebûl nakit êdî mucezza bikî**

**(Di Çapa Destnivîs de weha ye:**
**"Eger tiştekî pur mucezza bikin**
**Qebûl naket êdî tecezza bikin"-w)**

MUCEZZA: Kerkirî, hatiye qetkirin. Yanî eger tu tiştekî ker bikî û hûr bikî wê bighîje halekî, ku êdî qebûla kerkirinê li xwe nake. Yanî wê bibe Cuzê Layetecezza (atom-w), yanî pareyê napar. Jê re tê gotin "Nuqte" û "Cewherê Ferdd".

Şeyxê nazim (E.Xanî-w) îsbat dike, ku Cuzê Layetecezza heye. Da ku redda feylesofan bike, ku dibêjin: "Pareyê napar tune".
Hemî cisman li nik wan (feylezof-w) ji "Heyûla" û "Sûretî" ne, ne ji pareyê napar in.

Heyûla: Madde ye, cism jê çêdibin. Wek heriyê li gor kûz.
Sûret: Cewher e, dikeve xeyra, wek kûzîtîyê ku dikeve heriyê.

Sûret, li nik me musulmana "erd e", ne cewher e. Li ser gotina wan "'Alem qedîm e". Lewra esil jê re heye, ku "Heyûla" ye.

Ema li nik me musulmana Cuzê Layetecezza heye û sabit e, ji tune çêbûye: Temamê cisman ji wê ne. Bêweku bi milyon û milyara Pareyê Nepar digehîjin hev dibin cisim.

Li nik me, 'alem bû hadis. Yanî peyda ye ji tune.
Dema ku Xwedê te'ala îrade kir ku erd û asîman îcad ke, ewela miqdarekî pir Paryê Nepar îcad kir ji tune. Paşî wan civande hev, erd û asîman ji wan çêkir. Gotina heq ev e.

Çewa ku Alûsî di Tefsîra xwe de gotiye:
- Li nik ehlê heq, cisim murekeb e ji Cewherên Ferd.
Digel ku ew bi xwe înkara Cewherê Ferd dike. Çewa ku di 24-102 (de-w) gotiye. Û gotiye: Lewra delîlên qewîn li ser nefya wê hene û zerar di nefya wê de tune ah.

Erê! Lakin beyanatê ehlê şer'ê, hem ehlê fenn ê 'esrî di behsa îcada alemê de, teqwiya îcada Cewherê Ferd dikin, ku Pareyê Nepare ye.

Ustad Bedî'uzzeman (Mele Seîdê Kurdî-w) îxtiyar kiriye, çewa ku wê were tefsîlkirin di beyana Heyûlayê de.

Şeyxê nazim (E.Xanî-w) redda Mu'tezîliyan û Feylesofan dike, ku dibêjin: "Cewherê Ferd tune, pare (perçe-w) çiqas hûr be jî, di eqil de tê kerkirin bênîhayet".

Ev gotina wan, fasid e. Lewra dide famkirin, ku heba xerdelê ji çiya ne biçûktir be. Çiku pareyê herduwan jî naqedin. Hem em karin wesfê Xwedê te'ala bikin, ku qudreta wî li ser îcada Pareyê Nepare heye. Lê wana nikarin. Lewra Cuzê Layetecezza li nik wan mehal e.
Faîda îsbata Pareyê Nepare ev e, ku Heyûla îbtal bibe. "Tuhfet-ul E'alî" û "Nexbetul'lalî". Tefsîl wê were.

**47- "Heyûla" çu nîne 'edîm e 'edîm**
**Dinê, kafir e, ê dibêjit "qedîm"**

(Dî Çapa Destnivîs de weha ye:
"Heyûla tu nîne 'edîm û 'edîm"-w)

HEYÛLA: Pembû ye. Hukemayê pêşîn, esl û mada alemê pê teşbîh kirine. Lewra ji wê maddeyê, ecsamê muxtelîfe çêdibin. Çewa ku ji pembû çêdibin.

Yan "Heyûla" di îstîlaha wan de hatiye wesifkirin bi hinik wesfan, ku Ehlê 'Eqîdê bi wana wesfê Xwedê te'ala dikin, ku ev in: Mewcûd e, bê kemiyet û bê keyfiyet e.
Yanî jmar jê re tune û çewabûn lê peyda nabe. Lewra ne wek tişkî ye. Dibêjin: - Paşî wesf û 'erz lê (Heyûa-w) peyda bûn, alem jê çêbû. "Qamûs".

Feylasofan gotine:
- Cisim, di nefsa xwe de muttesil (Bi hev ve-w) e, qebûla înfîsalê û înqîsama (pişk-w) li xwe dike bê nîhayet.

Evê ku qebûla înqîsama dike, ne îttîsal e, tişkî din e. Ew bi xwe (tîşt-w) qebûla îttîsalê li xwe dike û jê re tê gotin "Heyûla" û "Made". Ji îttîsalê re jî tê gotin: "Sûret". "Tewai'ul Beydawî".

Sûret di vir de navê Îttîsala Cewherê ye, ku bi hev ve ye di nefsa xwe de. Lê ew cewher ne temamê heqîqeta cismê ye. Belkî tişkî dî heye, îttîsal xwe pê ve digire. Yanî Cewher, muttesilê navê wî tiştî ye, ku Heyûla Ewel e, ku sûretê cismîye dikevê.
Navê sûretê danîn "Îttîsal", navê wî tiştî danîn "Madde", navê murekkebê herduwan danîn "Cîsm". "Şerh-ul Muwafiq".

Heyûla, çar qism in.
Heyûla Ewel: Cewherekî besît e. Wucûda wê, bê wucûda sûretê ne temam e. Ew cihê sûretê ye, lê sûret wê radigire, çewa ku cewher 'erdê radigire. Dema ku sûret lê peyda bibe, bi hev re dibine cisim.
Çewa ku ji Kullîyatê Ebul Beqayî tê zanî "Îrsîtata Leys" gotiye. Çewa ku "Melel û Nehl" dibêje:
- Ewelê sûreta ku disebiqe bi bal Heyûlayê ve, eb'adê suluse (Sê qism-w) ne. Wê demê Heyûla dibe çirmikê xweyê drêjî û fireyî û kûrî. Lê tu hal jê re nîne, dibe Heyûla Diduwa.
Paşî her çar tebî'et lê peyda dibin, ku germ û serma û ritûbet û zwayî. Wê demê Heyûla digel vana dibine çar 'enasir: Ku ax û av û ba û agir in, dibe Heyûla Sisiya.
Paşî merkebat (Tiştên ku ji tiştan çêdibin-w) ji wan çêdibin, ku dar û ber û me'den û xeyrê wan in. Ew jî hinek ji hineka re heyûla ne. Wekî hesin heyûla ye ji bo şûr û kêr û tevrik û xeyrê wan.

HEYÛLA ÇU NÎNE: Yanî eslê dunyayê ku "Heyûla" ye li nik feylasofan, tune. Yanî ev Heyûlaya ku feylasofan beyan kirine, çewa ku buhurî, ne sabit e.

'EDÎM E 'EDÎM: Tune, tune!
Ev tekîd (Zexmkirina rastiya tişt-w) in ji bo xeberê ku "çu nîne". Wê demê "dinê" mubteda ye, xeberê wê KAFIR E YÊ DIBÊJIT "QEDÎM".
Yanî kesê ku bêje: "Dunya qedîm e" kafir dibe. Durust e ku "'edîm e" mubteda be muekked be, "dinê" xeber be, cumleyê "kafir e ..." îbtîdaîye be.
Ev çêtir e, çiku muwafiqê gotina "Bede-ul Amalî" ye:
"We dunyana hedîsun wel Heyûla 'edîm-ul kewnî fe esme' bî îctîzalîn".

Institut kurde de Paris

"Dunya" muennesê (mêke-w) "ednê" ye. Yanî nêztir e. Lewra beirya axretê ye. Hinka gotine:
- Dunya 'îbaretê ji erdê û hewayê ye.

Hinka jî gotine:
- Dunya hemî mexlûqên beriya axretê ne.
Murada me, evê paşî ye. "Tuhfet-ul E'alî".

QEDÎM: Yanî her hebû, tunebûn di ser de nebihuriye.
Feylasofan û hukemayên pêşî gotine:
- "Heyûla" madde ye, qedîm e. Madde, bê sûret nabe. Sûret jî bû qedîm, temamê cisma ji madde û sûretê ne. Ew jî bûne qedîm.
Li nik wan, alem qedîm e, fena nabe. Yanî "heşir tune, qiyamet ranabe". Ji wî qasî kafir bûne, bi îttîfaqa hemî ehlê îslamê. Çewa ku gotiye:

"Bî selasetîn kefere-l felasîfetu-l 'îda
Îz enkeru ha wehye heqqen musbetet
'Ilmun bî cuzîyyîn hudûsu 'ewalîmîn
Heşrun lî ecsadîn we kanet meyyetet"

(Şroveya vê çarîneya bi zmanê Erebê weha ye: Fîlozofên ji heddên xwe der bi înkara van hersê tiştan, digel ku rastiya wan hatiye îsbatkirin jî, kafir bûne. Tişt ev in: Zanîna bi pareyê nepar (atom), peydabûna tiştên ku hene, hinartina mexlûqan bi bal heşrê ve digel ku ew mirî ne-w)

Ehlê Sunnetê redda wan kirine, ku îbtala Heyûlayê kirine bi îsbata Cuzê Layetecezza. Çewa ku bihurî. Lewra îsbata wê, dixwaze ku cisim murekkebê ji wê be, alem jî 'îbaretê ji cisma ye.

Institut kurde de Paris

Xulase: Temamê alemê ji Cewherê Ferd çêbûye. Ew jî (C.Ferd-w) hadis e. Alem bû hadis. Hemî aleman ku xeyrê Xwedê ne, çi erd çi asîman çi xeyrê wan, mexlûqê Xwedê te'ala ne, wan ji tune îcad kiriye.

"Xwedê te'ala hebû, tiştek pê re tune bû", mezhebê heq (rast-w) ev e li nik hemî etba'ê (peyrew-w) pêxemberan, ji musulmanan û Filehan û Cihûyan û xeyrê wan. "Elî Qarî". Li ser hudûsa alemê, delîl pir in. Di vir hilnayên.

Piştî ku îsbat bû, alem hadis e, tiştê hadis her wê fena bibe. Îsbat bû, ku wê alem fena bibe. Bêweku wê Xwedê te'ala wê (alem-dinya-w) ji hev bixe, bike Cewherê Ferd (da ku-w) bibe "Hebaen menşûren", çewa ku eslê wê jî Cewherê Ferd bû.
Lewra ehlê hikmeta nû îsbat kirine ku, alem ji "Sedîm"ê çêbûye. Sedîm: mij e, ewr e.

Li nik Feylasofên 'Esrê "Sedîm" bi mana pareyê û zerreyê hûrik in, ku dicivin dibin wek ewr û dayise.

'Ulemayê 'esrê gotine:
- Ev nezeriya (dîtin-w) ha mutabiq e ji bo ayeta: "......"
Gotine: Quran li gor fehma Erebê wî zemanî hatiye, tabîr daye bi dûxanê shh.

Murad bi duxanê: Xazikê narî (agir-w) ye dişibihe duxanê, jê re tê gotin: "'Alem-ul Sedîm", ku eslê hemî alema ye. Temamê cemad (Tiştên hişk-w) û nebat û heywana di Sedîmê de wekî ku nitfeha wê ye (menî, qitran, dilop-w) ji bo hemî azayan.

Qadî Beydawî "duxan"ê tefsîr kiriye bi emrekî zulmanî - yanî tişkî wek duxanê- û gotiye:
- Murad bi duxanê, madda asîmana ye -ku Heyûa ye, yan tişkî wek wê- yan eczayê hûrik in -yanî Cewherê Ferd e.

Hem îsbat kirine, ku "Sedîm" ji "Esîr"ê çêbûye. Piştî ku geriyaye komek Cewherê Ferd û kesafet (gurr, qalind, koma însên-w) lê peyda bû. Wê demê mecerrekî (dagirtin, pirtişt-w) jê tewelud kir. Yanî ewrekî nûranî. Hate navdan bi "Sedîm"ê. Çewa ku "Tefsîra Tentawî" dibêje.

Ustad Bedî'uzzeman gotiye:
- Neqiyatê şer'î dealet dikin, ku Xwedê te'ala ewela cewherekê îcad kiriye. Yanî maddekê. Paşî lê tecelî kir. Bû du qism. Yek bûxar, yek mai' -yanî tişkî ron wek avê. Paşî li qismê mai' tecelî kir, geriya "keşîf" û kef da. Ji wê kefê, erd çêkir. Paşî madda buxarîye fireh kir, asîman jê çêkir û stêra tê de çand.
Û nezeriyatê hikmeta nû hikim dikin, ku menzûma şemsiye digel asîmanê ku tê de sobayî dikin cewherekî besît bû. Înqîlab lê çêbû. Geriya new'ê buxarekê. Paşî mai'ekî narî (alav-w) jê hasil bû. Paşî qismek jê sar bû, hişk bû. Paşî ku hereket li wê mai'ê ketin, çrûsk û qit'e jê veqetiyan, bûne kesîf û gerriyane seyarat. Ev îrdameyek (avabûn-w) ji wan e.

(Fîlozofê Kurd Mele Ehmedê -Huseyn- Bateyî li dor 500 salî berê, di pirtûka xwe ya Mewlûdê, beşa çaran de, çêkirina dinê li gor felsefa olî nivîsîye-w)

Dema te ev bihîst, durust e tu tetbîqa herdu mesleka li hev bikî. Lewra mumkin e ku ayeta: "......" îşaret bike ku erd digel menzûma şemsiye wek hevîrekî bû. Destê Qudret

Institut Kurde de Paris

(Xwedê-w) wê ecinand ji cewherekî besît, yanî ji made.

Esîrê ku wek ava seyale, nifûz dike bi ceryana di navbeyna hemî mewcûdata de. Û ayeta: "......" îşaret be bi bal vê madda ku wek avê ye.
"Esîr" piştî ku xuluqî, bû merkez ji bo ewelê teceliya sani'ê hekîm bi îcadê.

Yanî Xwedê te'ala ewela Esîrê xuliqand, paşî wê gerrand koma Cewherê Ferd, paşî qismek jê gerrand "Kesîf" û heft kureyê meskûne jê xuluqand. Erda me, yek ji wan e. "Îrşad-ul Î'caz" 110-111.

Tu bizan! 'Esriyan gotine:
- "Esîr" madda eslê ye ji hemî alema re -dunyewî û uxrewî. Pêl û hereket lê ketin, kesafet tê de peyda bû. Ev qismê kesîf, gerriya "Sedîm", ku jê re bi zimanê 'esrî gotin "Gelaksî û Nebûla".
Di te'rîfa Esîrê, îxtîlaf kirine. Lê qencê te'rîfa çewa ku ji "Îşaret-ul Î'caz"ê û "Tefsîra Tentawî" tê zanîn, ev e:
- Cewherekî besît e, ne murekkeb e, seyyal e wek avê. Valayiya, bê hudûd tije dike. Di hemî ecramê kaînata de nufûzê dike. Teniktir û letîftir e ji nûrê. Ji her tiştî nêztir e, ku bibe tişkî rûhî.

"Tentawî" gotiye:
- Li ser gotinê feylazofên 'esrî, "Esîr" tişkî mewcûd e, ne madde ye. Belkî madde ji wê çêbûye ah.

Tê zanîn ji gotinê wê (Tentawî-w) di vir de û di hinek cihê dî de, ku Esîr esl e ji bo Heyûlaya ku hukemayê pêşîn îsbat kiribûn. Lewra ewsafê ku ji maddeyê re sabit kirine wek ewsafê Heyûlayê ne.

Lakin ustad Bedî'uzzeman di "Lem'eya Sihî" de gotiye: "Esîr maddesî, maddeyûnlerî boxdiran zerat maddesinden deha letif we eskî hukemanin saplandixi Heyûla fehrestesinden deha kesîf îhtîyarsiz, şu'ûrsuz, camid bir madde dir."

Hinek 'ulemayên 'esrî, înkara Esîrê kirine. Gotine: "Tişkî ferezî ye". Yanî heqîqet jê re tune.
Lê ustad Bedî'uzzeman di "Lem'eya Duwazda" de, îsbat kiriye bi delîlan.

Xatîme: Îsbata Cewherê Ferd ji fewaida ye, ne ji zerûrîyatê 'eqaida ye. Çewa ku Elî Qarî gotiye: Wehareng e îbtala Heyûla. Ne zerer e ku Heyûla hebe û alem jê çêbûbe. Ancax zerar e ku bête gotin "Heyûla qedîm e", çewa ku feylasofan gotine.

Ehlê Sunnetê şidandine di îbtala wê de, lewra ku hebûna wê bête qebûlkirin wê gelek musulmanê nezan zen bikin, ku Mezhebê Feylasofan heq e. Çiku ferq nakin di navbeyna Heyûla digel Sîfetê Hudûsê, ku Mezhebê Ehlê Sunnetê ye û Heyûla digel Sîfetê Qedîmî, ku Mezhebê Feylasofa ye.

Durust e di eqil de, ku Xwedê te'ala alemê ji Cewherê Ferd çêkiribe. Weya Heyûla îcad kiribe û alemê jê çêkiribe. Weya ji tune çêkiribe, ne ji tişkî. Çewa ku (Xwedê-w) gotiye: "......" (Mealê Ayetê weha ye: Bê guman gava Xwedê bivê, ku ji tiştekî re bibê çêbe, hema ew ji ber xwe ve çêdibe-w)

**48- Meke lec di Luqman û Îskenderî**
**Ji bo wan ne me'lûm e peyxemberî**

(Di Çapa Destnivîs de weha ye:
"Meke lic di Luqman û Eskenderî
Ji bo wan ne me'rûf e peyxemberî"-w)

MEKE LEC: Mucadela bi qireqir meke, di behsa Luqmanê Hekîm û Îskenderê Zulqerneyn de. Yanî di îsbata pêxemberiya wan de. Lewra pêxemberiya wan nehatiye zanîn bi delîla qet'î. Di qewlê sehîh de: Herdu welî ne, ne nebî (pêxember-w) ne.

LUQMAN, navê du heb namdara ye.

Yek: Luqmanê Hekîm ê meşhûr e. Murada me ew e. Eslê wî, ji Yewnan e. Esseh ew e ku bavê wî Ba'ûr, kurê Nahûr e.

Şehab gotiye:
- Esseh ew e, ku Luqman xwarziyê Dawud e es. Hikmeta xwe ji wî girtiye, bi dehsala piştî paşatiya wî welidiye, rengê wî reş bû bi sebeb reha pîrikeka wî, ne ku 'ebdekî Hebeşî bû weya Nûbî bû ah.
Hikmet li ser zmanê wî carî dibû. Lewra Xwedê te'ala 'ilm û nefsa paqij dabûyê.

Hikmet: We'za ku lefz û me'na wê tev delal in. Hikmetê di 'urfa alima de: Tekmîlkirina nefsê ye bi kesba 'ulûm û milketa tam û dewama li ser ef'alê qenc li gor taqeta wî.

Yek ji hikmeta Luqman ev e, ku axayê wî got:
- Here pezekî serjê ke, du pariya jê bîne, ku ji tevî xweştir

Institut Kurde de Paris

bin.
Çû. Dil û zman anî.

Piştî çend roja (dîsa Axê-w) got:
- Pezekî serjê ke, du pariyê ji tevî ne xweştir bîne.
Dîsa (Luqman-w) dil û zman anî. Û got:
- Ku herdu qenc bin, ji her tiştî qenctir in. Ku pîs bin, ji her tiştî pstir in. "Ebus'se'ûd".

Hatiye gotin, ku Luqman gotiye:
"Min xizmeta gelek pêxembera kiriye, min heşt kelîme ji wan hilaniye. 1- Hifza dil di limêjê de, 2- Hifza gewriyê di xwarinê de, 3- Hifza çav di mala xelkê de, 4- Hifza zman di nav xelkê de, 5-6- Zikra (pêxeberdan-w) du tişta: Xwedê te'ala û mirin, 7-8- Jbîrkirina du tişta: Qenciya meriv li xelkê û xirabiya xelkê li meriv. "Rûh-ul Beyan".

Luqmanê dî, kurê 'Ad e. Ku dibêjinê: Luqmanê Ekber (Mezin-w). Lewra "Luqmanekî Esxer (Piçûk-)" jî heye. Me şixul pê nîne.

Luqmanê Ekber, di weqta Hûd es de bû, îman anîbû. Wê demê hikim di destê wî û Xelcan de bû. Kes ji Qewmê 'Ad, musulman nebû, ji xeyrê Luqman û hinek azbeta wî. Xela li Qewm rabû. Hinek ji wan hatin Mekkê ji bo du'aya baranê. Luqman jî bi wan re bû. Du'a xwe kirin û zivirîn malê. Luqman ma di Heremê de û neçû.
Xwedê te'ala Qewmê 'Ad bire hîlakê. Luqman filitî, xilas bû. Paşî hikim kete detê wî, bû padîşah.
Dibêjin (ku Luqman-w) "Hezar sal 'emr kiriye". Lewra di Heremê de du'a kir, ku Xwedê 'umrê wî drêj ke.

ÎSKENDER, navê du heb namdara ye.

Îskenderê Kebîr, ku behsa wî di Quranê de ye bi navê "Zulqerneyn". Yanî xweyiyê du qloça. Lewra milekî wî gihîştibû herdu qurnê rojê. Yanî Şerqê û Xerbê, erdê tev zevt kiribû. Ew e, ku Sedda Meşhûr ava kiriye ji bo def'a şerê Yacûc û Macûca.

Ustad Bedî'uzzeman gotiye:
- Sedda Quranê, Sedda Çîn e. Bi pir fersexa dirêj e -di "Muncid"ê de nivîsîye, ku Sed hatiye avakirin ji bo def'a Moxul ji Çînê bibe, 3000 km dirêj e, 15 metre bilind e, neh metre fire ye ah. Sûretê wê resim kiriye.
Ustam gotiye:
- Sedd, ji bo emîntiya medeniya ji şerê Bedewiya ye. Erê, Qebîla Hûn û Qebîla Moxula ji wan wehşiya ne.

Hinka gotine:
- Yacûc û Macûc, Moxul û Mançûr in, ah. "Muhakemat".

Esabe û Bîdaye ji Îbnu 'Ebbas neqil kirine, ku dostê Zulqerneyn ji melaîketa hebû. Navê wî "Refail" bû. Rojekê suhbet kirin. Zulqerneyn got:
- Ez dixwazim 'umur bikim, da ku ta'etê Xweda bi heqqî bikim.

Refail got ku:
- Tu wisa hes dikî, di Erdê Zulumatê de Kaniya "Ava Heyatê" heye. Kî jê vexwe, namire heta ku du'a mirinê neke.

Zulqerneyn duwazde hezar esker hilanî û çû heta gihîşte terefê Taristanê, li nik Qurnê Rojê. Li wir şeş hezar esker niqand. Du hezar gerande meqdeme. Yanî pêşkêş. Xizir es gerande amirê wan. Meşiyan. Newalek kete pêşiya wan.

Xizir es hevalê xwe sekinand û çû, Kaniyê dît: Ku ava wê ji şîr spîtir e û ji hingiv şêrîntir e. Jê vexwar û desmêj girt û cilê xwe tê de şûşt. Zulqerneyn derbas bû, Kaniyê nedît ah.

Meşhûr e ku Zulqerneyn, Îskenderê Romê ye. Di wexta Îbrahîmxelîl de bû es. Pê re Ke'be tewaf kiriye digel Îsmaîl es.
Îbrahîm es jê re du'a kiriye. Xizir es wezîrê wî bû. Hatiye gotin "Kurê xatiya wî ye". Îbrahîm es mizgînîya paşatiyê dayê.

Dema (ku Zulqerneyn-w) peyatî çû Hecê û got:
- Ez siwar nabim li bajarê ku Xelîl tê de be.

Di nav wê de xîlafek qewîn heye: Îskender binu Feyleqosê Romî, weya Se'b binu Zîmurasidê Himyerî, weya Mes'eb binu Ebdullahê Qehtanî, weya Mîrzeban binu Mudrîket, weya Ebu Kurbê Şems binu 'Ebîr binu Efrîqişê Himyerî. Tubbe'ê Yemenî pê îftîxar kiriye, gotiye:

Di Te'lîqa Bîdayetê de: Evê ku vê şi'rê gotiye, Ebu Kurbe ku Tubbe'ê Yemenî ye. Di Xutbeya Quss Binu Sa'îde de: (Çend rêz bi zmanê Erebî-w)

"Tarîxa Muxteser" dibêje:
- Zulqerneynê ku di Quranê de ye, Se'b binu-l Haris el Rayîş e.
Çewa ku Îbnu Ebbas gotiye, ne Îskenderê Romê ye ah. Ji vê xîlafê tê zanîn, ku qewlê qewîn ev e, ku ji Erebê Yemenê ye.

Lefzê "Zuqerneyn" jî, teqwiya vî qewlî dike. Lewra "Ezwa" Erebê Yemenê ne. Ezwa, wanê ku di serê navê wan de lef-

zê "zû" heye, wek "Zul'izar", "Zulmenar" û xeyrê wan.

Şêx Muhyedînê Erebî jî, ev qewl tercîh kiriye di "Muhaderat"ê de. "Tentawî" (Tefsîreke Quranê-w) jî, îxtiyar kiriye. Ema 'umrê wî (Zuqerneyn-w) geleka gotine "Hezar û şeşsed sal e". Lê te ji gotina qisê, zanî ku du hezar sal e.

Îskenderê Sexîr (piçûk-w) Yewnanî ye, kurê Fîîbs e, ji ewladê 'Eys binu Îshaq e es. (Bajarê-w) Îskenderiye ava kiriye, mulkê Faris stendiye Dara paşayê Faris kuştiye, Ersetatalîs seydayê wî bû, paşî bû wezîrê wî, umrê wî sî û şeş sal bû.
Lê Îbnu Xeldûn gotiye: "Çil û du sal bû".
Tarîxa Romê, ji zemanê wîladeta wî, weya mirina wî, weya derketina wî ya ser bajara tê hisabkirin.

Hinka gotine: Tarîxa Romê ya "Sulunse" gelek însana îtîqad kirine, ku herdu Îskender yek in. Alûsî, yek ji wan e.

Îbnu Kesîr gotiye:
- Ev xetakî mezin e, lewra yê ewel mumünekî salih bû, wezîrê wî Xizir es bû. Ê paşî, wezîrê wî Ersettalîsê Feylesof bû. Di navbeyna wan de (Herdu Îskenderan-w) zêdeyê du hezar sa heye. Lewra Îskenderê Biçûk beriya mîlada Îsa es bû bi miqdarê 300 salî. Ev li kû, ew li kû? ah. Paytexta wî, Meqedonya bû, ku li xerbê Îstenboê ye. Texmîna 15 roja jê dûr e. Çewa ku Ebus'se'ûd gotiye.
Û gotine: Meqedonya îro xirabe ye. Lakin tê de 'elamet hene didine zanîn, ku di weqta avaya wê de pir mezin û kamil bû, paşayê wê qewîn û zor bû. Ez tê de bihurîm, min asarê 'ecêb dîtin, ku di wan de 'ibret hebûn ah.

**49- Yezîdê mirî le'netê lê meke**
**Belîd e, xebîs e, xwe têkil meke**

**(Beyta 49 an di "Rêberê Sanî" de tune. Me wê ji Çapa Destnivîs girt û li gor rêza wê li vir nivîsî-w)**

**50- Melaîk, şeyatîn û cinnan wucûd**
**Heye, da nekî bûyîna wan cuhûd.**

(Dî Çapa Destnivîs de, rêza diduyan weha ye:
"Heyin, ta nekey bûna wan cuhûd"-w)

WUCÛD HEYE: Wucûda van hersê cinsa sabit e û muheqqeq e, bi hukmê ayetan û hedîsên sehîh. Xafil nebe, da tu hebûna wan cuhûd nekî. Yanî înkar nekî. Lewra înkara wan kufr e.

Îbnu Hecer di "Fetawa Hedîsîye" de gotiye:
- Mu'tezîliyan înkara hebûna cinna kirine, kafir bûne. Lewra înkara wan, muxalefeta ayetan û hedîsan û îcma'ê ye.
Û (Mu'tezîliyan-w) gotine: Ji xeynî herduwê ser milê însan milyaket nîn in, ew jî kafir in.

Ji ber wê muxalefetê Qezwînî di "'Ecaîb-ul Mexlûqat"ê de gotiye:
- Qewmek ji Mu'tezîliyan gotine: "Cinn û şeytan însanê xirab ê xwey'înad in, tu nesîheta qebûl nakin ah.
Li nik wan, cin û şeytanê nedîtî, nîn in.

Şehab di "Şerha Şîfa"ê de 4/512 gotiye:
- Pêşiyên Mu'tezîliyan û feylesofan înkara milyaketa na-

kin. Dibêjin: "Cewher in rûhaniye yê xeyrê cismaniye sabit in. Navê wan (cewheran-w) danîne "'Uqûl".

Ehlê şer'ê navê wan (cewheran-w) danîne "Melaîket" û (Ehlê Şer'ê-w) îsbat kirine, ku (Ew melaîket-w) teseruf dikin, wehareng e cin jî.

Feylesofan û hinek Mu'tezîliyan înkar kirine. Melaîket û cin bi hawê, ku Ehlê Kelamê tarîf kirine ku: "Cismên nûranî ne". Weya "hewaî ne li şiklan qadir in".
Û (Feylezof û hinek ji Mu'tezîliyan-w) gotine: "Cin, erwahê beşeriye yê xirab in, ji bedena derketine".
Yanî înkar nakin bi temamî, çewa be'dekî wehm kiriye û gotiye: "Muxalifê nessa ayet û hedîsê ye" ah.

MELAÎK: Cem'ê (piranî-w) "melek" e. Eslê wê "mel-ek" e, meqlûbê "me-lek" e, ji "alûketî" ye bi mana "rîsalet"e.

MELAÎKET: Cismên letîf in, nûranî ne, karin xwe têxin şiklê her mexlûqî. Lê nakevin şiklê xirab wek mar û mûra mesela.

Feylesofan û hinek Ehlê Sunnetê, wek Îmamê Xezalî û Raxib gotine:
- Cewherên mucerred in ji maddeyê.

Şehab di "Şerha Şîfa"yê de 1/464 ev qewl (Ê ku bihurî-w) îxtiyar kiriye. Lakin seydayê Mele Xelîl (ê Sêrtî-w) hukum kiriye ku, "Murekkeb in, ne besît in ji 'enasira, lê madda nûranî di wan de bihtir e". Çewa ku gotiye:
"'Enasir çihar in, ji wan in melek..." (Binêre li Nehc-ul Enamê çapa Latênî, rûpel: 10-w).

Ustad Bedî'uzzeman di "Muhakemat"ê de gotiye:
- Gotina wî zatê nîqad -yanî seydayê Mele Xelîl- tesrîh dike bi redda hukema. Murada wî ne ew e, ku îsbata çar 'Enasira ji usûlê îslamîyetê ye, çewa ku hinek nezana fehm kirine. Lewra çarebûn û 'unsûrîyet û bîsattet ji îstîlahê hukema û esasên 'ulûmê tebî'îye ne, eleqa wan bi usûlê îslamiye tune qet'en.

ŞEYATÎN: Cem'a şeytan e, ji "şate" ye. Yanî "heleke" yan jî "şetene" ye. Yanî "xaefe, ew eb'ede ew be'ûde".
"Şeyatîn" cismên letîf ên narîye (agirî-w) ne, nayên dîtin, ji ewladê Îbîs in.
Cinsîyeta cin û şeytana yek e, yan na(?) xîlaf tê heye.
Îblîs ji melaîketa ye, yan ji cina ye(?) mesele xîlafî ye.

Ayeta: "......", divê ku ji cina be. Lê kesên ku dibjin: "Ji melaîketa ye", dibjin:
- Taîfekî ji melaîketa heye, ji wan re dibêjin "Cinn".
Û dibjin: Mesela 'usmeta (zeliqandin, qulp-w) melaîketa xîlafî ye.

Lê ayet û asarê mezina, de'wa wan men' dikin. Wehareng e de'wa wan ne sabit e, ku mezhebê hinek ehlê tesewufê qebûl bikin, bêjin: "Melaîketê erdê ye, ne me'sûm in, Îblîs ji wan e". "Rûh-ul Me'anî" 10/293.

Lê di Tefsîra "Sûret-ul Beqer" de gotiye:
- Cumhûrê sehabiyan û tabi'îyan gotine: "Ji melaîketa ye, bi delîla zahir a îstîsnaî. Piştî ku bêemrî kir, mesx (guhartin-w) bû geriya cinnî".

Weya emê bêjin, kewna wî cinnî weya melek ne munafiyê hev in. Lewra new'ekî milyaketa heye ji wan re tê gotin

"Cinn". Ema 'ismeta melaîketa ji gunehan ew xaibî ye. Ema ku melaîketan ji nûrê ne, çewa ku Hedîsa Muslim dibêje, û Îblîs ji agir e. Çewa ku nessa ayeta: "......" ew jî ne zerar e.

Lewra nar (agir-w) û nûr, cinsê mada wan yek e. Îxtîlafa wan bi 'ewariza ye. Zêdeyê wî qasî, Hedîsa Muslim li serê xalibî ye. Yanî xalibê wan ji nûrê ne. Lewra di zahirê gelek esera de: Hinek melaîket ji agir xuliqîne û hinek ji berfê û hinek ji tişkî dî ah.

Îblîsê ku 'isyanê kir, Xwedê te'ala wî mesx (guhartin-w) kir bi sûretê qebîh: Bi xwe re lîwatê kir, weya di hêtek wî zeker (Organa nêr-w) di yekê de ferc (Organa mê-w) hene, cîma'ê dike. Weya hêka dike dibin ferc ji bo tenasulê (zêdayî-w).

Sê qewl in di tenasula şeytana de. Essehê wan, yê pêşî ye. Çewa ku Xerpûtî di "Şerha Burdiye" de gotiye.

CINNAN: Cem'a cin e. Di nusxekê de "Cinnat" cem'a cinetê ye. Di xulqiyeta wan de xîlaf heye, cismên hewayî ne weya narî (agirî-w) ne weya cewherê mucerred in (?). Yanî besît in. Li herdu qewlê pêşî, murekkeb in. Yanî xalib di wan de hewa ye, yan agir e.

Hinka gotine:
- Murekkeb in ji çar 'enasiran. Qismê pir di wan de hewa ye, yan agir e. Çewa ku melaîket ji her çara ne; Qismê pir, nûr e. Çewa ku Alûsî zikir kiriye di "Sûretê Hecer" de.

Îbnu Hecer gotiye:
- Quran û hedîs delalet dikin, ku eslê cina agir e ah. Ayet:

Institut kurde de Paris

"......"

"Can" (a di ayetê de-w) bavê cina ye. Narê Semûm (ê ku di ayetê de ye-w) bayê pir germ ê ku dikuje, yan agirê bê duxan e.

Hedîs: "Xulîqet-îl melaîketu mîn nûrîn we xulîqe-l cannu mîn marîcîn, mîn narîn we xulîqe Ademu mîmma wusîfe lekum". Rewahu Muslim.

"Maric": Ptiya agir e, ji duxanê safî ye, eslê cina ye. Çewa ku ax eslê însana ye, melaîket ji ruhnaya wê xuliqîne. Loma helîm en, nerm in.

Geleka gotine:
- "Can" Îblîs e. Cin û şeytan zuryeta wî ne, cismê teva yek e. Lakin muxtelif in, hin dixwin, vedixwin hinek na, hinek diwelidin hinek na, şikl û sûretê wan pir muxalif in, muminê wan hene, kafirê wan hene, ji kafira re tê gotin "şeytan", carna herbê dikin. Li nik herba wan babîsok (bablîsok, babelîsk-w) radibe. Lê hemî babîsok ne herb in. Belkî ji hemberiya du baya çêdibe, dema li hev dikevin.
Gotine: Cin, beriya Îblîs li erdê hebûn. Hinka gotine: "Hen û Ben" bûn, ku du qebîleyê wan in.

Çewa ku "Bîdayet" dibêje:
- Dema ku bêemriya Xwedê kirin, Xwedê te'ala esker ji milyaketa şande ser wan. Navê wan (Miyaketan-w) "Cinn" bû, wan taromaro kirin. Îblîs wê demê zarûk bû. Wan miyaketan wî girtin birin asîman. Di nav wan de ma.
Hinka gotine:
- Îblîs, wê demê sereskerê wan milyaketa bû, navê wî "Ezraîl" bû.

**51- Wekî yêk in ev herdu bê şek temam**
**Di rizqîyyetê da helal û heram**

WEKÎ YÊK IN: Weke hev in. Yanî malê helal û heram di rizqbûnê de wekî hev in. Çewa malê helal rizq e, eynî wisa malê heram jî rizq e. Ev redda Mu'tezîiya ye, ku dibêjin: "Malê heram ne rizq e".

"Rizq", li nik Ehlê Sunnetê, tiştê ku Xwedê te'ala sewq dike bi bal ruhbera ve û menfe'etê jê dibînin, çi xwarin be, çi lixwekirin be, çi xeyrê wan.

Mu'tezîlliyan, rizqê, bi du terza tefsîr kirine.
Yek: Tiştê ku mulkê meriv be, çi xweyîyê wî menfe'et jê bibîne, çi na.

Ev gotin, divê ku tiştê kole û heywan dixwin, ne rizqê wan be. Lewra ne mulkê wan e. Hem divê ku rizqê Xwedê te'ala hebe. Lewra her tişt mulkê wî ye, digel ku ji mulkê Xwedê te'ala re nayê gotin "rizq".

Didu: Tiştê ku mani' tune, meriv menfeetê jê bibîne.

Li ser herdu tefsîra jî lazim tê ku kesê malê wî heram be Xwedê te'ala rizq nedabe, em redda wan dikin bi ayeta: "......"

Delîla Mu'tezîliyan weha ye:
- Ê ku rizqa teva dide, her Xwedê ye. Tiştê ku bête nisbetdan bi bal Xwedê ve, nabe (ku-w) heram be û xiroxê wê musteheqê 'ezabê be. Ema xiroxê heramî musteheqê 'ezab

Institut kurde de Paris

e. Lewra heram nayê nisbetdan bi bal Xwedê te'ala ve, heram ne rizq e.

Em, redda wan dikin. Dibêjin: Xuroxê heramî, musteheqê 'ezab e. Ji ber ku xebata wî pîs e. Lewra bi îxtiyara xwe di esbabê heramî de xebitiye û guh nedaye esbabê helalî.

Gotina wan, ku "Heram nayê nisbetdan bi bal Xwedê te'ala, lewra qebîh e", em reda wan dikin, dibêjin: Qebahet di îcadkirinê de tune, ancax di kesbê de heye.

**52- Bibêjim te fedla sehabê Resûl**
**Bi can bike bawer bi dil ke qebûl:**

**53- Ebû Bekrê Siddîqê yar ê şefîq**
**Ew e "Sanîyesneyn" di Xarê refîq**

**54- Ji ewwel di fedlê seramed ew e**
**Kerîm e û sahibkeramet ew e**

**(Di Çapa Destnivîs de, weha ne:**
**52-"Bêjime te fedla sehabê Resûl**
**Bi can bawer e bi dil ke qebûl**
**54-Ji ewil di fedla sehab sermed ew**
**Kerîm û ezîz û sahibkurmet ew"-w)**

SIDDÎQ: Ev leqeb, Pêxember sew lê danî. Lewra tesdîqa resûltiya wî û Mî'raca wî kir bê teredud, çewa ku Tibrî gotiye. Navê wî (Ebû Bekir-w) "Ebdulah Binu 'Usman Ebî Heqafet" e.

YARÊ ŞEFÎQ: 'Elametekî şefqeta wî ev e, ku weqta Hîc-

retê, bi şev digel Pêxember sew derket ji Mekkê, çûn devê Şkefta Çiyayê Sewr. Ebû Bekir re berê çû hundur, destê xwe paland. Çiqas qulik di Şkeftê de dît, zolikek ji cilê xwe kir û xistê heta cilê wî qediyan. Qulikek tenê ma. Nigekî xwe tê de danî. Gazî Pêxember kir, got: "Were min Şkeftê ediland".

Pêxember sew serê xwe danî dawa wî û raza. Marekî bi nigê wî (E.Bekir-w) veda. Tevnegeriya. Lê ji ber êşa wê griya, hêstrê çavê wî bi ser wechê Pêxember sew de hatin xwar. (Pêxember-w) şyar bû, got:

- Çi bûye bi te?

(Ebûbekir-w) got:

- Mar bi nigê min veda!

Pêxember sew nigê wî mesh (mizda-w) kir, weya tûka xwe tê da. Rihet bû.

"SANÎYESNEYN": Ê ku yek ji herduwa ye, di Şkesftê de, Ebû Bekr e re. Bi mûcibê vê ayeta kerîme: "......"

Yanî Xwedê te'ala alîkariya Pêxember sew kir, dema ku kafiran bûne sebebê derketina wî di haletê ku yek bû ji diduwan, dema ku herdu di Şkeftê de bûn. Dema (ku Pêxember-w) ji hevalê xwe re got: "Mehzûn nebe, Xwedê te'ala bi me re ye". Yanî, alîkariya Xwedê û muhafeza wî bi me ra ye.

Rîwayet bûye, ku kafiran li dora Şkeftê geriyan, çav bi wan neketin. Ebû Bekir re got:

- Eger yek li nigê xwe binihêre, wê me bibîne.

Pêxember sew got:

- Eger wana di vir de (di derî de-w) werin, emê di vir(paş-w) de herin.

Ebû Bekir nihêrî ku Şkeft ji alê (paş-w) dî de vebû, behrek pê ve ye gemîyek ê li kenarê Behrê sekinî ye. "Rûh-ul Beyan"

SERAMED: Pêşkêş. Yanî Ebû Bekir re di fedl û keremê de ji her efradê ummetê pêştir e, ji xeyrê enbiya, ji her însanî efdeltir e.

Hedîsa Sehîh dibêje:
- Roj derneketiye û neçuye ava li ser kesekî çêtir ji Ebû Bekir, ji xeyrê Pêxembera.

Murad bi lefzê "etqa" di ayeta: "......" Ebû Bekr e re. Yanî teqwatirê ummetê ye. Lewra malê xwe tev di riya Xwedê te'ala de serf kir digel ku (E.Bekir-w) serekê tucara bû, tiştekî ji xwe re nehişt.

Pêxember sew got:
- (Ebubekir-w) te çi ji ehlê xwe (re-w) hişt?

(E.Bekir-w) got:
- Min, Xwedê û Resûlê wî, ji wan re hişt.

Institut kurde de Paris

**55- Li pê wî bi heq 'Umerê dînpenah**
**Bi fethê di wî şa ne xwendkar û şah**

**56- Xîlafet kemer bû mecala wî best**
**Ji hukmê wî pişta muxalif şikest**

**(Di Çapa Destnivîs de weha ne:**
**55-"Di pey wî bi heqqî 'Umer dînpenah**
**Bi fethê di wî şa ne xwendikar,şah".**

**56-"Xîlafet kem ji bo mecala wî best**
**Ji hukmê wî pişta muxalif şikest"-w)**

LI PÊ WÎ BI HEQ: Yanî piştî Ebubekir, ê ku ji ummetê tevî efedeltir e, 'Umer e re.

DÎNPENAH: Muhafizê dîn. Lewra îslamîyet pê qewîn bû, dema ku musulman bû. Hem dema ku bû Emîr-ul Muminîn, çewa ku di nezmê de ye (Di beyta Xanî de-w).

Ema qewînîya îslamê bi musulmaniya wî ('Umer-w), lewra berya wî eshaban bi dizî limêj dikirin. Piştî ku musulman bû, eşkere limêj kirin.
Ew ket sefekê, Hemze ket sefa dî, îslamîyet xalib gerriya, kafir keribîn bi hesreteke pir. Lewra nema karibûn têkilê eshaba bibin bi ziyanê. Hem şeytan ji wî ('Umer-w) reviya. Çewa ku Hedîsa Sehîh dibje.

ŞA NE: Kêfxweş in.
XWENDKAR: Reîs.
ŞAH: Padîşah.
Lewra li ser kufaran fexrê dikin bi frekirina Dewleta Îslamê û fetihkirina bajarê mezin. Dizanin, ê ku kelehê asê û bajarê zor stendiye 'Umer e re.

MUXALIF: Yanî kafiran.
PIŞTA wan ŞIKEST: Yanî qeweta wan zeîf bû, rê li wan teng bû. Ji bo ku eraziyê fireh û bajarê pir ji destê wan derketin: Ku Misr û Lubnan û Sûriye û 'Iraq û qismek ji Tirkiye û Îranê.

**57- Li pê wî ye 'Usman bi heqqê Hekîm**
**Di 'ilmê 'elîm û di hilmê helîm**

**58- Ji kerrarê efdeltir e bê guman**
**Ev e î'tîqada me der heqê wan**

(Beyta 57 an di Çapa Destnivîs de weha ye:
"Di pey wî ve 'Usman bi heq bû hekîm
Di 'ilmê 'elîm û di hukmê helîm"-w)

LI PÊ WÎ YE 'USMAN: Yanî piştî 'Umer e, di fedl û qenciyê de 'Usmanê Zunnûreyn e; Ji hemî eshaba qenctir e ji xeyrê Ebû Bekir û 'Umer re.

"Zunnûreyn", yanî xweyê du nûra. Lewra du qîzê Pêxember sew nîkah kiribû. Ewela Ruqîye. Ew wefat bû. Paşî Ummukulsûm. Ew jî wefat bû. Pêxember sew got:
- 'Usman bizewcînin. Eger li nik min ya sisiya hebûna, minê wî bizewicanda. Min wî nezewicandiye, îla bi Wehya ji cem Xwedê te'ala.

Çewa ku Tibranî rîwayet kiriye di kitêbê Sîyerê da: Kesî du qîzê Pêxember înkah nekiriye, ji xeyrê 'Usman re.

BI HEQQÊ HEKÎM: Bi wê heqiya ku Xwedayê hekîm îzhar kiriye.

DI 'ILMÊ 'ELÎM: Di sîfetê 'ilmê de pir alimekî mahir bû. Bi delîla ku tertîba Quranê wî daniye. Berya wî jî geleka (Quranê-w) tertîb kiribûn. Piştî ku wî ya xwe deranî, ê wan tev da şewitandin. Temamê alema îslamê qebûl kirin digel ku eshabe tev muctehîd in.
Lewra dema ku ('Usman, Quranê-w) tertîb kir, temamê sehabiya li serê da civandin, ji bo xeletî nekevê.

DI HILMÊ HELÎM: Di exlaqê xweş û nerm de, ji her kesî zêde bû, hingî "heya"a (fihêt-w) wî zêde bû.

Ebû Nu'eym rîwayet kiriye, ku Pêxember sew gotiye: "'Usman heyaa wî bêhtir e ji heyaa hemî ummetê".

Îmam Ehmed û Muslim rîwayet kirine ku, Pêxember sew gotiye: "Qê ez heya nekim ji zilamekî, ku melaîket ji wî heya dikin?"

Îbnû 'Ebbas rîwayet kiriye ku:
- Du xeslet di 'Usman de hebûn, di Ebû Bekir û 'Umer de re tunebûn. Yek: Sebir kir, heta hate kuştin zulmen. Didu: Însan civandin ji bo tertîba Quranê. "Zeynî Dehlan".
Yek ji hilma pir bû, yek ji 'ilmê pir bû.

KERRAR: Hicûmker, ku Elî ye kw. Lewra daîm hicûm dikir ser kafiran, tu carê bi paş nediket, ne di tengî û ne di freyîyê de.
Yanî di î'tîqada me Ehlê Sunnetê de: 'Usman, ji Elî efdeltir e, bê şibhe. Û Ebû Bekir û 'Umer jî, ji wan efdeltir in.

**59- Di pê wan Elî sahibê Zulfeqar**
**Suwarê li Duldul şehê namîdar**

**60- Tefewwuq li ser yê di mayî heye**
**Bi me'na biraê Resûlê me ye**

SAHIBÊ ZULFEQAR: Xweyiyê şûrê ku navê wî "Zulfeqar" e.
Zullfeqar: Şûrê bi feqret e. Lewra "feqar" cem'a "fiqret"ê ye, bi mana movik e. Mana Zulfeqar, yanî xweymovik.

Lewra tê de wek movikê piştê hebûn.

Dibêjin: Hesinekî ji bin erdê derxistine ji ber Ke'bê, Zulfeqar jê çêkirine. Gelekan gotine:
- Zulfeqar, şûrê Munebbih binû Sehmî bû. Di Herba Bedrê de bi kurê wî yê 'As re bû. Elî wî kuşt, Şûrê wî anî da Pêxember sew.

Di rîwayetekê de heye, ku:
- Belqîsê heft şûr hediye dane Suleyman es. Yek ji wan Zulfeqar e. Paşî gihîşte 'As binû Munebbeh.

Di rîwayetekê de jî heye, ku:
- Elî re gotiye: "Cibraîl es gotiye ji Pêxember re sew: 'Li Yemenê senemek heye, hesin lê hatiye alandin. Yekî bişîne, bira Senem hûr ke û hesinê wî bîne'. Pêxember sew min şand. Ez çûm. Min wî Senemî hûr kir û hesin anî. Pêxember sew du şûr jê çêkirin. Navê yekî danî "ZULFEQAR yekî jî MEXZEM. Zulfeqar ji xwe re hişt, Mexzem da min. Paşî Zufeqar jî da min.
Dema ku dît ez Herbê pê dikim, Roja Uhudê got:
La seyfe îla Zulfeqar
We la feta îlla Elî".

Hinka gotiye:
- Ev beyt, a Îbnû Buheyce ye, di Herba Uhudê de gotiye.

Îbnû Îshaq gotiye:
- Di Herba Uhudê de, ba rabû, dengekî xeybanî weha got:
"La seyfe îlla Zulfeqar
We la feta îlla Elî
Fe îza nedebtum halîken
Fe'bku-l wellîyye-bnel welî". "Nûr-ul Ebsar"

Institut Kurde de Paris

DULDUL: Hêstireke spî bû, Padîşahê Misrê ji Pêxember re sew şandibû. Ewelê hêstira ku musulman lê siwar bûne, ew e. 'Umur kir, heta dranê wê ketin û kor bû. Jê re ceh hûr dikirin.
Elî re, lê siwar dibû. Bi xariciya re herb dikir. Paşî Hesen lê siwar bû, paşî Huseyn, paşî Muhemmed Henefî (Hersê kurên Elî ne-w). (Paşînê-w) yekî tîrek berdayê, (wê Hêstirê-w) kuşt.

TEFEWWUQ: Bilindaya Elî kw.
BI ME'NA BIRAYÊ RESÛLÊ ME YE: Yanî tefewuqa Elî re li ser sehabeyê mayî ew e, mana ku "Elî, birayê Pêxember e" sew. Çewa ku di hedîsa de hatiye ev e, ku yanî ji hemî sehabiyê mayî efdeltir e piştî hersê xelîfa.

Wan hedîsê ku dibêjin: "Elî kw bûye birayê Pêxember" sew, delalet nakin ku Elî ji hemî sehabiyan digel hersê xelîfeyan efdeltir e.
Bi vê beyanê hate zanîn, ku hemî hedîsê di munaqibê Elî de kw hatine, wuha têne manakirin.
Mu'temedê Şê'îyan (Wan hedîsan-w) rizandiye. Sade 'esebiyet e, ku lewma tefdîla Elî li ser hersê Xelîfa dikin.

Hedîsê ku ji "biratiyê" xeber didin ev in, digel beyana sebebê wurêda wan:
- Dema ku muslumanê Mekkê hîcret kirin çûn Medînê bûne muhacir, ehlê Medînê jî ku alîkariya Pêxember û muhaciran kirin, bûne "ensar".
Pêxember sew emir kir, ku "Her yek ji muhacira û yek ji ensariya, bira destê biratiyê bi hev din û bibin birayê hev ê axretê, da ku elaqa wan bi hev zêde bibe ku pir ji hev hes bikin". Elî hat. Çavê wî histêr dikirin û got:

Institut kurde de Paris

- Ya Resûlellah, te biratî xiste nav eshaba teva û nexiste nav min û kesekî.

Pêxember sew got:
- "Ente exî fîd'dunya wel axîretî" (Tu birayê min ê di dunya û axretê de-w).

Bi vê hedîsê, Elî re ji eshaba teva veqetiya. Hem bi vê hedîsê jî vediqete, ku Pêxember sew û eshaba çûne xezwekê, Eî hiştin.
(Elî-w) got:
- Ya Resûlellah, te min kire xelîfe digel jina û zarûka?

Pêxember sew got:
"Ema terda en tekûne mînnî bî menzîletî Harûne mîn Mûsa îlla ennehu la nubuwwete be'dî".
Yanî, tu birayê min î. Eger piştî min pêxemberî hebuwa, tê bibûna pêxember. Çewa ku Harûn birakê Mûsa bû û bû pêxember.) "Tac" 3/333 û 3/335.

Neseb û jîna her çar xelîfa weha ye:
EBÛ BEKIR binu 'Usman Ebî Heqafet binu 'Amir binu 'Umer binu Ke'b binu Esed binu Teyem binu Merret binu Ke'b e. Merre, bavê hefta ye ji Pêxember re sew. 'Umrê wî (E.Bekir-w) 63 sa e. Wefata wî: Sala 13 ê h. 23 ê Cemaziyelaxi, bi axivîna birîna ku mar pê vedabû.

'UMER binu Xetab binu Nefîl binu 'Eddy binu Ebdulezîz binu Rîbah binu Ebdullah binu Qert binu Rezah binu 'Eddy binu Ke'b e, ku bavê heşta ye ji bo Pêxember sew. 'Umrê wî 63 sal e.
Ebû Lûlûtê kafir wî kuşt bi xencera jehrîkirî di ser limêja sibehê de. 26 ê Zilhicce, sene 23 ê h.

'USMAN binu 'Efan binu Ebîl'as binu Umeyye binu Ebduşşems binu Ebdumenaf, ku kalikê Pêxember e sew. Hatiye kuştin di 7 yan 8 ê Zulhiccetê, sene 35 ê hicrîyet. 'Umrê wî 80 yan 87 yan 88 yan not (90-w) sal e. Di Beqî'ê de medfûn e, lê qebra wî xefî ye.

ELÎ binu Ebî Talib binu Ebdulmuttelib e. 'Umrê wî 65 yan 63 ê sal e. Îbnu Mulecimê xaricî wî kuşt di deriyê Camiya Kûfayê de bi şûrê jehrîkirî, li ferqa serê wî da wextê fecrê, 13 ê meha Remezanê, sene 40 ê h. Qebra wî xefî ye. Lê dibêjin, li Necefê ye.
Mudeyê xîlafeta wan, s: 17, ji "Nehc-ul Enam"ê.

**61- Şefa'et dikin enbiya, ewliya**
**Bi îzna Xwedê bo kesê eşqiya**

**(Di Çapa Destnivîs de, rêza pêşî weha ye:**
**"Şefa'et dikin ewliya, enbiya"-w)**

ŞEFA'ET: Di luxet de, wesîle û telebe (daxwaz-w) ye.
"Wesîle" kirina 'emelekî ye, ku meriv pê nêzî Xwedê te'ala dibe.
"Şefa'et" di 'urfê de, bi me'na xwestina xêrê ye ji xelkê re.

ENBIYA, EWLIYA: Murad bi "ewliya" kesê salih e. Melaîket jî daxil in. Çiqas kesê qenc û salih hebe, wê di qîyametê de şefa'et bike ji bo wan gunehkarên ku pê ve eleqedar dibû di dunyayê de. Heta heywan jî şefa'et dikin ji wî kesî re, ku qencî bi wan kiriye. Çewa ku 'Ellam Nûbî gotiye.

BI ÎZNA XWEDÊ: Heta ku Xwedê te'ala îzna şefa'et û mehderiyê nede, (ji-w) van kesan (re-w) mehder tune, derê îznê ancax Muhemmed-ul Mustefa sew vedike.

BO KESÊ EŞQIYA: Murad bi "eşqiya" di vir de, gunehkarê ku gunehên kebair kirine. Çewa ku kesên bêemriya hikûmetê dikin, ji wan re dibêjin "eşqiya". Mura bi eşqiya di vir de, ne kafir in. Lewra şefa'et û mehder ji wan (kafir-w) re tune, çiku bêfeyde ye. Çewa ku Xwedê te'ala gotiye: "......", "......"

Ev beyt (nimre 61-w) redda Mu'tezîliya dike, ku înkara şefa'etê dikin, dibêjin:
- Faîde tê de tune, lewra gunehê kebair 'efû nabin bê tewba di dunyayê de. Delîla wan, van ayeta ne û ayeta: "......"

Ehlê Sunnetê dibêjin:
- Van ayeta, xas in bi kafira ve.
Belkî van ayeta -ku herdu ayetê pêşî ne- îsbata şefa'etê ji mumina re dikin. Lewra nefya hukmî ji hinek kesa, dixwaze îsbata wê (hukum-w) ji xeyrê wan ("hinek kesa"-w) re. Hem îsbata şefa'etê tê kirin bi ayeta: "......" û hem bi hedîsa: "We şefa'etî lî ehlîl kebaîrî mîn ummetî". Ebû Dawud, Tirmizî, Beyheqî û sehhehehû.
Û hedîsa: "Yeşfe'u yewm-el qîyametî selasetun: El enbiyaû, summe-l 'ulemaû, summeş'şuhedaû". Û xeyrê vana hedîs di babê "şefa'et"ê de pir in, manayê wan mutewatir in.

**62- Di xeyb û hudûrê du'ayan eser**
**Dibîtin ji bo ra aya ba xeberer**

Institut kurde de Paris

(Dî Çapa Destnivîs de, rêza pêşî weha ye:
"Di xeybê,hudûrê du'a ye eser"-w)

BA XEBER: Kesê ku xebera wî ji tişta heye, eqilmend e, heqiyê qebûl dike.
Yanî ji du'ayê re tesîr heye, qebûl dibin. Çi meriv ji hazira re du'a bike, çi ji xaiba re, çi sax, çi mirî.

Di vê meselê de xîlafa Mu'tezîliya heye, ku înkara tesîra du'a dikin. Li nik Ehlê Sunnetê du'a qebûl dibin, bi şertê ku adabê du'ayê li cih bin.

Îmamê Xezalî, deh adab zikir kirine:
1- Weqta Muşerref: Wek nîvê şevê û berya şeveqê û roja 'îdê û roja cum'ê û meha remezanê.
2- Dihalê Muşerref de: Wek halê herbê û rabûna limêjê û piştî wê û halê secdê û fitirînê û çûna camiyê û navbeyna azan û qametê û halê tengbûna dil bi zikr û xeyrê wê.
3- Berê xwe bide qîble, destê xwe bide ber hev û bilind ke, paşî di serçavê xwe bide.
4- Bi dengê xefî, ne (bi denê-w) bilind.
5- Bi zelîlî û feqîrî, ne bi sic' û kelamê fesîh.
6- Bi zarîn û îştîqaq û îhtiyaciya pir digel xewf û tirsa dil.
7- Yeqîna qebûlê. Bira zen neke ku du'ayê wî qebûl nabe, ji ber ku gunehkar e. Lewra Xwedê te'ala du'a Îblîs qebûl kir, ku wî sax hişt. Ayeta: ".....", ne, xas e bi saliha ve.
Îbnu 'Eta di serê "Hîkmet"ê de gotiye: "Mîn 'eamet-îl î'tîmadî 'elel 'emelî nuqsanun, er'rîcau 'îne wucûdîz'zuelî".
8- Îlhah û îsrar. Bêweku sê cara weya bêhtir tekrar bike û bira ecele neke: "Yustecabû lî ehedîkum ma lem yu'eccîl yeqûlû fe lem yusteceb lî". Rewahu-l Buxarî.
Yekê ji mezina gotiye:
- Ev bîst sal e ku ez du'a dikim, da ku ez "Malaye'nî" biteri-

kînim, hê qebûl nebûye. Lê hêviya min heye ku qebûl bibe.
Eger du'a bi paş ket, bêje: "El hemdulîllahî 'ela kullî halîn".
9- Berî du'a zikir bike, bi desmêj bêje: "Subhane rebbîye-l e'lel wehhab", selewata bide di ser du'a û paşiya wê de.
10- Ev edeba deha, eslê qebûla du'ayê ye û ruknê wê ye. Îbaretê ji sê tişta ye.

Yek: Îxlasa tam e, ku bi qelb û ruhê xwe berê xwe bide Xwedê te'ala, 'elaqa xwe ji hemî şuxlê dunyewî bibire. Lewra ku qelb xafil be, du'a qebûl nabe. Çewa ku Hedîsa Tirmizî dibêje.

Didu: Paqijkirina bedenê bi malê helal û tewba ji hemî guneha. Kesê ku tiştekî wî heram be, tewba wî naqebile. Çewa ku Hedîsa Muslim dibêje. Hem paqijkirina ji kibr û hesed û fesadê, xeyrê wan ji guneha.

Ke'b-ul Ehbar gotiye:
- Nebî Mûsa es digel qewmê xwe sê cara çûne du'a baranê. (Baran-w) nehat. Lewra yekî fesad di wan de hebû. Piştî ku tewbe kir, hê (baran-w) hat.

Sisê: Zivirandina heqê her kesî. Niheqî û tade li kî kiribe bi çi terzî, bira here balê. Çewa emrê wî bike, bira wisa bike. Yan lê helal bike.

Sufyanê Sewrî gotiye:
- Heft sala li Benî Îsraîla bû xela. Çiqas zarîn û du'a kirin jî, nediqebilî. Xwedê te'ala got: "Heta hûn heqê hev eda nekin û tadeya xwe neterikînin, ez rehmê li we nakim". (Piştî ku-w) wisa kirin, Xwedê te'ala baranê da wan.

Yekî tewbe kir, bi mal û canê xwe şixulî, heta heqê her kesî ji stuwê xwe deranî. Malê wî qediya. Du zêrê yekî Yahûdî lê man. Çû balê got:
- Min tewbe kiriye, min heqê her kesî eda kiriye, maye du zêrê te di stuwê min de. Ka te çewa divê, ezê wisa bikim?

Cihû got:
- Here filanderê bikole, du zêrê min tê de ne, bîne, ezê li te helal bikim.
(Ew yek-w) çû, kola, du zêr dîtin, anî dayê.

Cihû got:
- Tewba te qebûl bûye. Lewra zêrê min di wir de tune bûn. Min tecrîba te kir.

TEWRAT dibêje: "Kesê ku ji dil tewbe ke berê xwe bide Xwedê te'ala, ax di destê wî de dibe zêr".

Cewaba du'a û qebûla wê, ne yek in. Dema 'ebd bêje: "Ya Reb!", Xwedê te'ala dibêje: "Lebê, ya 'ebdê min!". Lewra Xwedê te'ala we'de daye, ku cewaba du'ayê dide, bê şik û şibhe.

Ema qebûla du'a bi mana daîna murada meriv e û carna derhal dibe, carna piştî zemanekî ye, carna dimîne axretê, carna bi hawakî dî qenciyê dike, weya belayê def' dike, ne bi hawayê ku meriv dixwaze. Lewra Xwedê te'ala çêtir dizane, çewa ku hedîs dibêjin. "Rûh-ul Beyan".

Di Hedîsa Beyheqî de:
- Du'ayê sê kesa muheqqeq qebûl dibin: Hakimê 'adil, kesê bi rojî, kesê mezlûm gerçî fasiq be. Belkî gerçî kafir

be, çewa ku Hedîsa Îmamê Henbelî dibêje. "Şerhu 'Eyn-ul 'Ilm".

(Li gor vê hedîsa ku bihurî, du'ayê kesên bindest her çiqas fasiq û kafir bin jî, qebûl dibin. Li dinê ji miletê Kurd pê ve, bi miletî, kesên wisa jî nemane. Lê mixabin ne du'ayên me qebûl bûne, da ku em dewleta xwe ava bikin û ne jî, ehlên her çar pirtûkên Îlahî destên paqij bi me ve drêj kirine.-w)

Yekî Fileh nifirîn li qaziyekî kir, ku zulm lê kiribû. Xwedê te'ala wî qazîya mesix kir, gerande kevir. "Rûh-ul Beyan".

Tu bizan! Ev beyt (nimra 62-w), qeziya muhmele ye di quwa cuzîye de. Yanî gerçî hinek du'a qebûl dibin, hinek jî qebûl nabin, dema muxalifê "Qezaa Ezelî" be.
Ema "Qezaa Mu'elleq" ew def' dibe bi du'ayê. Çewa ku Hedîsa Tirmizî: "La yeruddu-l qezae îlled'du'aû" hatiye tefsîrkirin bi qezaa ku mu'elleqê bi tiştkî ye, wek du'ayê mesela. Ne qezaa "mubrem" e. Yanî mehkema "Lazîm-ul wuqû' e". Ayeta: "....." ji vê qebîlê ye.

**63- Bi fê'lê di qenc da nekî minnetê**
**Bi fedla Xwedê dê biçî cennetê**

(Di Çapa Destnivîs de, rêza pêşî weha ye:
"Bi fê'lê di qenc tu meke minetê"-w)

DA: 'Illet e ji bo ku çûna cennetê bi fedla Xwedê ye, ne bi 'emel e.
Yanî î'tîqad bike ku dixûla cennetê bi fedl û kerema Xwedê te'ala ye, ne bi ta'et û 'emelê qenc e, da tu bi 'emelê

xwe ne pesinî, minetê nekî, nebêjî: "Ez bi 'îbadetê xwe musteheqê cennetê bûme".

Pêxember sew gotiye: "Len yedxule ehedukum el cennete bi 'emelîhî we înnema tedxulûne ha bi rehmetîllahî we bi fedlîhî".
"Qalû: We la ente ya Resûlellah"
"Qale: We la ena îlla en yetexemmedenîyellahû". Rewahu-l Şeyxan.

'Abidek hebû, 'îbadetê Xwedê dikir, da ku Xwedê menfe'etekê lê bike. Bîst salî dewam kir, tiştek jê re peyda nebû. Ma heyirî. Got:
- Ev çewa dibe, ev bîst sal e ez yek tiştî ji Xwedê dixwazim û neda min?

Xwedê te'ala wê demê nefsa wî û ef'alê wî pê da naskirin. Hişyar bû, got:
- Ez ehmeq im. Dema ku Xwedê te'ala zatê min û ef'alê min û siheta bedena min xuliqandiye, mekanê 'îbadetê min û ava desmêja min û cilê ku ez pê disitirim û zemanê ku ez tê de 'îbadet dikim, tev mexlûqê Xwedê ne. Ka min çi 'emel kiriye, heta ku ez bibim musteheqê ecrê (xêr-w)? Na welehî min tiştek nekiriye. Mi ef'alê Xwedê hisab dikir, ku ê min in û bi wan min teleb kir. Min tewbe, ya Reb min tewbe!
(Piştî ku wî 'Abidî-w) tewba sehîh kir, Xwedê te'ala wek diê wî dayê û marîfeta xwe jê re zêde kir. "Ebrîz bî Îxtîsar", 158.

Di hedîsê de hatiye, ku: Di zemanê pêşî de 'abidek hebû, pêncsed salî 'îbadetê Xwedê te'ala kir di cezîrekî (grav-w) behrê da. Xwedê te'ala jê re kanîkî ava şêrîn deranî û da-

reke hinarê hêşîn kir; rojê hinarek digirt, wê hinarê dixwar, jê re kafî dihat.
Xwedê te'ala siheta bedenê dayê 'îbadet kir bêkeslanî, westayî. Ji Xwedê xwest ku di halê secdê de wefat bibe.
Di qiyametê de wê Xwedê te'ala bibêje:
- Vî 'ebdê min bibne cennetê bi rehma min.
Ew ê bêje:
- Bi 'emelê min.
Wê Xwedê te'ala bêe:
- Ev qas ni'metê pir ku min li te kirine, temamê 'îbadetê te şukrê yek ni'metekî tenê dernaxe. Îbadetê pêncsed salî bi nî'metê dîtina çav tê qiyaskirin, lê dernayê.
(Piştre-w) Xwedê dibêje:
- Wî têxin agir.
Melaîket wî kaş dikin. (Ew 'Abid-w) gazî dike:
- Ya Reb. Bi rehma xwe min têxe cennetê.
Xwedê te'ala dibêje:
- Wî bizivirînin, wî têxin cenetê bi rehma min.
Ev hedîs dirêj e. Hakim rîwayet kiriye û sehîh dêrandiye. Çewa ku di
"Muxtesera Tuhfet-ul Murîd"ê de ye.

Ehmed binu Mûbarek di "Ebrîz"ê de gotiye:
- Îmamê Syûtî (Ev mesela ku bihurî-w) di kitêba "Bedweres'safîre" de zikir kiriye.

Welhasil. Her tişt bi teqdîr û îcada Xwedê ne: "......". Teqdîrat jî beriya mexlûqata hatine nivîsandin: "......" (Berî ku Xwedê erd û asîman çêbike bi pêncî hezar salî qedera xelkê nivîsîbû-w). Muslim û Tirmizî.
Ehlê cenetê wê demê hatine naskirin, çewa ku ehlê agir jî wê demê hatine naskirin.

"Qîle: Ya Resûlullah, e'lem ehlul cennetî mîn ehlînnarî?
Qale: Ne'em.
Qîle: Qefîmu ye'mel-ul 'amîlûne?
Qale: Kullun muyesserun lî ma xulîqe lehu" Buxarî û Muslum.
Yanî her kes hatiye sehilkirin ji wî 'emelî re, ku jê re xuliqiye. Kesê se'îd, 'emelê ehlê se'adetê jê re sehl e. Kesê şeqî, 'emelê ehlê şeqawetê jê re sehl e.
'Emel her metlûb e, çewa ku Xwedê te'ala emir kiriye. "Tac" 1/38.

Hate zanîn, ku ta'et nake lazimê xwe sewabê, guneh nake lazimê xwe 'ezabê. Ancax ta'et û gunehkarî, du heb 'elamet in; delalet dikin li ser sewabdana mutî'a û 'ezabdana gunehkara. Ne ta'et menfeetê dide Xwedê te'ala û ne gunehkarî zerarê didê. Çewa ku Şeyxê nazim (E.Xanî-w) gotiye di MEM Û ZÎNê de:

**"Yekrû ne li nik te kufr û îman**
**Yeksû ne li nik te xuld û nîran**
**Haşa ji kemalê re'feta te**
**Dûr e ji celalê rehmeta te**
**Kufr û gunehan bikî behane**
**Layiqê te bitin ev şehane"**

Ema ayeta: "......" Yanî bikevin cennetê bi sebeb wî 'emelê ku we di dunyayê de kiriye, yan di bedêla wî 'emelî de.

Zahirê ayetê: Divê ku, çûna cennetê bi 'emel e; çi bî ji bo sebebîyet be, çi ji bo bedelîyet be, wehareng e emsalê wê ji ayeta.
Wê demê, di navbeyna ayetan û hedîsan de muxalefet çêbû.

Lihevderketina ayet û hedîsê, çewa ku "Rûh-ul Beyan" dibêje, weha ye:
- Çûna cennetê, ne ji bo nefsa 'emel e, belkî ji bo ku Xwedê te'ala we'de daye ji 'emeldara re ku: Fezl û îhsanê li wan bike, wan bibe cenetê.
Wê demê 'emel dibe wekî sebeb, ne ku sebeb e di heqîqetê de ah.

Kesê ku 'emel bike, dikeve ber we'da Xwedê te'ala, ku rehmê lê bike. Kesê ku neke, nakeve ber. Lê ku dîsa rehmê lê bike, mani' tune, ku îman hebe.

Yan lihevderketina ayet û hedîsê weha ye:
Murad ji çûna cenetê, di ayetê de: Teqsîma dereceyê û menzîla ye li gor 'emel. Kesê çiqas pir 'emel bike, li wê gorê qesr û baxçe û horiyê wî pir in. Çewa ku Elî Qarî û Rûh-ul Beyan gotine.

**64- Bihişt û cehennem hene vê demê**
**Fena nabin û naçine 'edemê**

(Di Çapa Destnivîs de weha ye:
"Bihişt û cehennem heyîn vê demê
Fena nabin ew, naçine 'edemê"-)

Hikimkirina bi hebûna cennet û cehennemê di halê hazir de, redda ser Qederiyan û Necariyan û Cehmiyan û gelekê Mu'tezîliyan e. Ku dibêjin:
- Vêga (bihişt û doje-w) nîn in. Wê Xwedê te'ala wan di qîyametê de îcad bike.

Gotina wan, muxalifê ayet û hedîs û îcma'ê ye. Wekî niha ayeta: "......" Yanî cennet hatiye hazirkirin ji mumina re.
Û ayeta: "......" Yanî cehennem hatiye hazirkirin ji kafira re.
Tiştê ku hatibe hazirkirin, lazim e aniha hebe. Û delîla li ser tunebûna wan tune.

FENA NABIN: Lewra Xwedê te'ala di heqê wan de gotiye: "......" (Wê daîmî tê de bimînin-w). Çewa ku Se'dedînê Teftezanî û Seyelkûtî gotine.
Ev gotin, a pirê aliman e.

Şeyxê nazim (E.Xanî-w), li ser vî qewlî meşiyaye. Ema ayeta: "......", mana wê ev e: Her tişt, çi cennet çi cehennem çi xeyrê wan tune ye di hedê zatê xwe e. Lewra hebûna tişta, ne bi zatê wan û nefsa wan e. Belkî bi spartina bi bal Xwedê te'ala ve ye. Hebûna wan 'erzî ye, ji tune peyda ye bi îcada Xwedê te'ala. Xwedê te'ala wan ragirtiye.
Murad bi tuneyê -di vir de- tiştê ku hebûna zatî jê re tune.
Lewra hebûna wê, wekî nehebûnê ye. "Şehab".
Yanî gerçî di zahir de heye jî, lê tune tê hesêb.

Se'd gotiye:
- Durust e ku murad bi ayeta: "......" kullê (tev-w) mumkina halik e di heddê zatê xwe de.
Yanî wucûda mexlûqa (tiştan-w) bi nezer bal wucûda Xaliq (Xwedê-w) ve, wek 'edemê (tune-w) ye, ne muteber e.

Îmamê Xezalî gotiye:
- "Mumkin", daîm halik e di heddê zatê xwe de, ne ku wê here hîlakê û fena bibe: "......" ji xeyrê zatê Xwedê te'ala. Ew bi tenê heye di heddê zadê xwe de. Lewra: "Wacîb-ul

wucûd" e, her heye, wê her hebe.

Ev tiştê ku me neqil kir, di beyana ayetê de îhtîmaleke ne qet'î ye, lewra tewîl e. Ema zahirê ayetê: Divê ku tişt fena bibe ji xeyrê zatê Xwedê, çi cennet, çi cehennem, çi xeyrê wan.
Ev jî qewlek e. Hinek alimê mezin li serê meşiyane.

Seydayê Mele Xelîl (ê Sêrtî-w) qebûl kiriye. Lewra gotiye: "Digel hindî eşya fena dê bibin".

Ema ayeta: "......" Yanî, piştî ku ehlê cennet û cehennemê çûne cihê xwe, êdî nema fena dibin û namirin û dernayên. Lê beriya çûnê, wê fena bibin.
Weya emê bêjin: Di tewfîqa herdu ayeta de, wê fena bibin. Lê zemanekî hindik, miqdarê lehzekê, wê zû vegerin. Ew fenabûn, îtîbar jê re tune, ne mani'ê ebedîbûnê ye.

Xîlafa ku di fenabûna cennet û cehennemê de ye, di hinek tiştê dî de jî carî dibe. Tevde heşt in: 'Erş, Kursî, Qelem, Lewhilmehfûz, cennet, cehennem, ruh, hestiyê qarçikê. Çewa ku Îmamê Syûtî beyan kiriye.

Cennet û cehennem vêga li kê der in?
Nessa serîh (delîl rast-w), di te'yîna cennet û cehennemê de tune. Lê ekserê 'ulema gotine: "Cennet li asîmanê hefta ye, cehennem li bin erdê ye".
Delîlên ku li ser cihê cennetê ne, ayeta: "......" û hedîsa: "Seqf-ul cennetî 'erşûr'rehman" (Banê bihiştê, asîmanê Xwedê ye-w). Rewahu-l Buxarî fîl Cîhad.

Ev hedîs delalet dike ku, cennet di ser Kursî re ye û ne munafî ye ji gotina ekserê alima re. Lewra, mana gotina

wan: "Cennet, di seriya asîmana re ye", li jora wan e. Lakin muxalif e ji bo zahirê ayeta: "......"
Zahirê ayetê ev e: Ku fireyina cennetê wek fireyina hef asîmana û erdê be, ku tev bi ser hev ve bibin.

Cennet ku li ser Kursî be, lazim e ku pir mezintir be ji asîmana û erdê. Belkî ku di ser asîmana re be jî. Wisa lazim tê. Lewra ayeta: "......", divê ku cennet kurrewî be, çewa ku asîman û erd kurrewî ne. Cennet dibe kurrekî muhît ê bi asîmana û erdê.

Cewab ji pêş wê muxaefetê ve ev e: Ku Ayet, ne li ser zahirê xwe ye. Belkî kînayetê ji mezinaya cennetê ye.
Yanî, cennet ji asîmana û erdê wasi'tir e (firetir-w). Lewra Ereb, gelek cara wesfê tişta bi 'erzî dikin, dema ku îrada wes'etê bikin.
Ev beyan, ekserê wê, ji gelenbûya Haşiya Celal e.
Delîlên li ser kewna cehennemê ku li bin erdê ye, bihurîn di "Rehberê "Ewam" de, s. 28.

Ustad Bedî'uzzeman di "Mektûba Ewel" de gotiye:
- Cehennem, li gor hinek rîwayeta, li bin erdê ye: "......", "......". Kurreya erê bi hereketa senewiye daîrekê li dor meydanekê çêdike, ku wê bibe mecme'ê heşrê. Cehennem bû di binê wê medara senewiye de, di nêv agirekî perdekirî yê bênûr de ye, ku nehatiye dîtin û hîskirin. Ew mesafa mezin ku bi seyaheta erdê tê meydanê, tê de pir mexlûq hene, nayên dîtin. Lewra bê nûr in. Çewa ku hîv dema ku nûra wê jî tê kişandin, digere xaib. Eynî wisa pir kurreyê mexlûqata hene, bê nûr in, li hember çavê me ne û em nabînin.

Cehennem didu ne: Sexîrî (piçûk-w) û kebîrî (mezin-w).

Institut kurde de Paris

Esxerî, çewa ku di hukmê denga ekberî de ye û wê înqîlab bibe bi wê, eynî wisa wê bibe menzilek ji wê. Cehennema sexîrî, di bin erdê de ye. Yanî di merkeza wê de ye, binê kurreyê merkeza wê ye.

Di 'ilmê "Tebeqat-ul Erd"ê de, malûm e ku ekseriyen di kolana her 33 metra de derecek ê heraretê zêde dibe. Heta merkezê ku nîvê "Qetr-ul Erd" e ji şeş hezar û kusûr kîlometir e, 200.000 dereceyê heraretê tîne meydanê.
Yanî, agirekî muwafiqê hedîsa ku dibêje: "Bi dused carî ji agirê dunyewî şedîdtir e".

Ev cehennema suxra (piçûk-w) ku di hedîsa de tê îşaretkirin û di dunya û axretê de û di alema berzex (Mesafa di navbera dinya û axretê de, yan mesafa di navbera mirin û saxbûna di pey de-w) de gelek wezîfeyên cehennema kubra dide dîtin.
Di axretê de wê kurreya erdê bi sebeb sekna xwe di medara senewiye de birêje meydana heşrê -yanî wê ji hev bikeve bibe cuzê layetecezza- û bi emrê Îlahî wê cehennema suxra teslîmê cehennema kubra bike.
Qedîrê zulcelal mulkê wî pir fire ye, cehennema kubra li kê der bi cih bike wê bike.

Hem qudreta zatê zulcelal ji hikmeta wî ne dûr e, ku cehennema mezin veşêre di dendika cehennema -"îdafetul'lamîye"- biçûk de, ku di qelbê kurreya erdê de ye. Çewa ku dareka wek çiya vedişêre di dendikeka qasê neynokekê de.

Di "Îşarat-ul Î'caz"ê de gotiye:
- Cehennem tewandî ye -li hev hatiye pêçan- di hindurê merkeza erdê de. Di qiyametê (de-w), wê înfîlaq bike -ji

hev vebe, mezin bibe ah.

Xatîme! Hireqil mektûbekê şand ji Pêxember re sew. Tê de got:
- Tu de'wa min dikî bi bal cennetekê ve, (ku-w) fireya wê (mîna-w) erd û asîman e. Ka agir (doje-w) li kê derê ye?

Pêxember sew got:
- "Subhanellahî, fe eynelleylu îza caenneharû?" (Subhan ji Xwedê re, lê şev li ku ye gava ku roj tê?-w).

Eslê sualê ev e: Sabit e ku cennet li asîmana ye, cehennem li bin erdê ye. Dema ku heft asîman û erd fireya cennetê bin, cihê cehennemê namîne.

Hasilê cewabê li ser teqdîra teslîma ku cennet û cehennem di alema eflaka de îcad bike, qudreta Xwedê pir e. Kare cennet û cehennemê di yek cihekî de îcad bike. Çewa ku şev û rojê îcad kiriye û wan daxilê hev dike.

Xwedê te'ala gotiye: "......". Yanî tarîtîya şevê datîne cihê ruhniya rojê û ruhniya rojê datîne cihê tarîtîya şevê. Wekî ku tu momekê di hindurekî tarî de vêxî û bitefînî. Çewa ku "Keşşaf" dibêje.

Di kitêbê Fiqhê de sabit e, ku: Sî (sih-w), ne bi tunebûna tavê çêdibe. Yanî jxwe heye. Bi derbûna tavê, ji hîssa (hisîdrak-w) me xaîb dibe.

**Şeyxê Xanî ji vê manayê gotiye:**
**"Qehra xwe bikî eger tu zahir**
**Cennet li me dê bibîte agir**
**Wer feyzê bikî hesabê rehmet**

Institut kurde de Paris

Dozex li me dê bibîte cennet"

Qudreta Xwedê çewa ku li ser tedaxula şev û rojê heye, wisa li ser tedaxula cennet û cehennemê jî heye. Tedaxula ecsama ku mehal e, çewa ku di nezeriyatê hikmetê de heye, ew ancax bi nezer bi bal qudreta me mexlûqa ve ye. Ji ber vî qasî Pêxember sew kelîma te'eccubê îstimal kiriye. Lewra Hireqil bi qudreta Xwedê zanibû. Delîleke vê, tedaxulê dîtina Pêxember e sew ji cennet û cehennemê re li asîmana di Şeva Mî'racê de. Vê beyanê qenc bigre!

**65- Yeqîn dê bibîtin di yewma qiyam**
**Hîsaba helalê 'ezaba heram**

HÎSABA HELALÊ: Îşaret e bi bal hedîsa Beyheqî û Îbnu Ebîddunya rîwayet kirine: "Helaluha hîsabun we heramuha 'ezabun".

Ev mesele bi meqala Îmamê Xezalî hel dibe. Gotiye:
- Mirin, ne tunebûn e. Belkî cudabûna ji hiskirina duyayê ye û çûna bi bal hizûra Xwedê te'ala ye.
Wê demê salikê rahê axretê, ew kes e ku dixebite di esbabê fikr û zikr û 'emelê ku dunyayê digerrîne dijmin û meriv ji lezzeta wê dibirîne bi yekcarî. Van hersê tiştan digel esbabê wan îmkan nabin, îlla bi rihetî û selameta bedenî. Rihetiya bedenê jî nabe, îlla bi qewet û lîbas û xanî. Ji wana re jî sebeb hene. Divê ku meriv bixebite mîqdarê ku lazim e ji meriv re. Eger merivek wî mîqdarî ji dunyayê bigire, ji bo axreta xwe ew meriv nabe ji ewladê dunyayê, dunya di heqê wî de dibe mezra axretê. Eger wî miqdarî bigire ji bo para nefsê û qesda lezzet û ni'meta, ew dibe ji ewladê dunyayê ku miştaq in ji para wê (dinya-w) re.

Para dunyayê li ser du mesela ye: Yek, xweyê xwe dike musteheqê 'ezab. Navê wê "heram" e. Yek jî dibe mani'ê dereceyên bilind, hîsab li ser xweyê xwe drêj dik. Navê wê "helal" e.
Kesên eqilmend û qewînî'tîqad zane, ku sekna drêj ji bo hîsabê di 'eresa qiyametê de 'ezab e.

Pêxember sew gotiye: "Men nuqîşe fîl hîsabî 'uzzîbe". (Yanî kesê ku munaqeşe di hîsab de pê re bê kirin ji teref Xwedê te'ala ve, yanî tengî lê çêdibe. Bêweku suala her tiştî jê bê kirin, temamê gotin û ef'alê wî bêne hîsabkirin, tiştek ji gunehê wî yê biçûk û mezin neyêne terikandin. "'Ezab" yanî wê ew meriv bê 'ezabdan. Yanî ew munaqeşe û sekna di hîsab de li serê dibe 'ezab, yan dibe sebebê 'ezabdana bi agir. Lewra însan xalîba teqsîratiyê dikin. Kesê ku pê re îdare û musamehe neyê kirin, wê bê 'ezabdan. "Munawî" 6/234.
Kesê ku hemî ni'metê Xwedê te'ala li serê werin hîsabkirin, bêweku di hember wan de Xwedê te'ala ta'et û şukrê bixwaze, wê were 'ezabdan. Gerçî gunehê wî tune bin. Çewa ku bihurî di s.179-180. - muelif).

Lewra (Pxmber-w) gotiye: "Helaluha hîsabun". Hem dîsa gotiye: "Helaluha 'ezabun".
Lakin 'ezabê helalê, xefîftir e ji 'ezabê heramê. Belkî eger hîsab tune be, wê fewtandina dereceyên bilind di cennetê de û hesreta li ser fewtandina wan ji bo hinek pariyê pîs bibin 'ezab. Lewra çiqas ni'metê dunyewî hene, welew nihêrtina hêşînayî û vexwarina ava cemidî nuqsaniyê ji para axretê çêdikin sê qat û zêdetir.
Çewa ku hedîsê sehîh dibêjin: Heram û helalê dunyayê çi pir çi hindik tev mel'ûn in, îlla tiştê ku ji bo qeweta îbadet

û teqwayîyê be, ew ne ji dunyayê ye. Lewra çi tiştê ku ne ji bo Xwedê te'ala be, ew ji dunyayê ye. Ema tiştê ku ji bo Xwedê te'ala be, ew ne ji dunyayê ye. "Ehya-ul 'Ulûm" s. 3/274.

**66- Ji bo ehlê xeyran necat û riza**
**Ji bo ehlê şeran 'îqab û ceza**

**67- Di qebrê dibîtin ji xelqê mirî**
**Suala Nekîr û digel Munkerî**

(Di Çapa Destnivîs de beyta 67, rêza pêşî weha ye:
"Di qebrê da dê bit ji xeqê mirî"-w)

DI QEBRÊ: Yanî kesê ku bimre, wê du heb melaîket bikevin qebra wî. Navê wan: Munker û Nekîr in, wê sualê jê bikin. Yanî wê jê bipirsin, bêjin:
"Rebê te kî ye? Pêxemberê te kî ye? Dînê te çi ye? Îmamê te çi ye? Qîbleya te çi ye? Birayê te kî ne? Xwişkê te kî ne?"

Munker û nekîr, du heb melaîket in, hatine te'yînkirin ji bo suala miriya.
S: Çewa du melaîket ji hemî miriyan pirsê dikin di her derê de?
C: Melaîketê sualê pir in. Navê hineka "Munker" e, ê hineka "Nekîr" e. Her mîrîkî du heb ji wan diçine ser. Çewa ku "Reqîb" û "'Etîd" jî wisan in. Gotina ku dişibihe rastiyê ev e. Çewa ku Îmamê Helîmî û Îmamê Syûtî gotine.

Hatiye sehkirin, (eger-w) ku: Esera îslamê li (kesê-w) mirî zahir bibe, Munker sualê jê dike. Eger esera kufrê be, Ne-

kîr dipirse.
Navê wan wisa ye, lewra hogirî bi wan çênabe. Şiklê wan 'ecêb û xerîb e, naşibihe melaîketan û însana û heywana. Lê Xwedê te'ala lutf û rehmetê li mumina dike, her yekî bi şiklekî tîne ser li gor 'emel û î'tîqada wî (ê mirî-w).

Di Hedîsa Îbnu Mes'ûd de çewa ku Îmamê Xezalî zikir kiriye:
- Însan ku dimire, ewela milyaketek gazî wî dike. Navê wî (Milyaket-w) "Rûman" e, zûlikekê (tîzol-w) ji kefenê wî dike û dibêje:
- 'Emelê xwe li serê binvîse! Ev kaxeza te, û tiliya te qelema te û tûka te hibra te ye!

(Mirî-w) dinivîse. Paşî Rûman wê zûlikê bi stuwê wî ve dike: "We kulle însanîn elzemnahu taîrehu fî 'unuqîhî","ey 'emele hu".
Paşî herdu fitnebazê qebrê daxil dibin, du milyaket in, reş in -çavhêşîn in- erdê qul dikin bi qîlê (dran-w) xwe, porê wan li ser erdê kaş dibe, dengê wan wek brûskê ye, çavê wan wek berqê ye, nefesa wan wek bayê gurr e, cinûhê hesin bi wan re ne, (ku-w) li çiya didin dihedime.

Dema ku ruh (ê mirî-w), wan (milyaketan-w) dibîne, direve dikeve herdu qulê poz (û mirî-w) ji singê berjor sax dibe, lê nikare tevgerê bike, ancax dibihîze û dibîne.

(Ew milyaket-w) bi hişkî û stûrî diçinê. Ax, jê re (mirî-w) dibe wek avê, çiqas bilive (gor lê-w) firek dibe, sualê jê dikin. Hedîs drêj e!

Suala qebrê ji pêxembera nayê kirin, ji şehîdê herba kafira nayê kirin, ji zarûka nayê kirin di esseh de. Wehareng e

kesê ku roja înê û şeva înê bimre.
Bi delîla hedîsa Ehmed û Tirmizî: "Ma mîn muslîmîn yemûtu yewm-el cum'etî ew leyl-el cum'etî 'ela weqahullahu fîtnet-el qebrî".

Elî Qarî di "Şerha Mişkat"ê de gotiye: "Mîn" (a di hedîsa li jor de-w) feyda 'umûmî dide, şamilê fasiqa tê, îlla ku "tenwiya" muslîmîn ji bo te'zîmê be ah.
Lê ekserê aliman gotine: "Sual her heye, murad bi fitnê 'ezab e".

Çewa ku "Î'ane" û "Cemel" û xeyrê wan dibêjin:
- Meha remezanê, wek înê ye. Murad bi qebrê, alema berzex e.

Di "Cemela Fiqhê" de, ekserê aliman gotine:
- Sual, ji kafiran re tune ah.

Îmamê Syûtî gotiye:
- Hinek însan ji hemî 'emelê wî (xwe-w) tê sualkirin, hinek jî ji be'dekî (hinek-w), ne wek hev in.

Di Hedîsa Buxarî de:
- Herdu milyaket, wî (mirî-w) didine rûniştandin. Dibêjin: "Te çi digot di heqê vî zilamî de, Muhemmed?

Ema kesê mumin dibêje:
- Ez şehde didim ku ew (Pêxember-w) 'ebdê Xwedê ye û resûlê wî ye.

Dibêjin:
- De li cihê xwe binere di agir de, Xwedê wî bedel kir bi cihekî di cennetê de! (Ewê mirî-w) dinihêre, herduwa (ciyê

nav agir û yê li bihiştê-w) jî dibîne.

Di Hedîsa Îmamê Ehmed û Ebu Dawud de: "Qebra wî, fireh dibe heftê gazî". Di hineka de jî "çil gaz". Di hineka de "Miqdarê ku çav dibîne".

Îmamê Qurtebî gotiye:
- Ev îxtîaf, li gor 'emelê pir û hindik e. Ema kesê munafiq di cewaba sualê de, dibêje "Ez nizanim". Bi çakûçê hesin lê didin. Qêrîn jê diçe, her kes dengê wî dibihîze ji xeyrê însana û cina.
Çewa ku însanek li nik meriv razay be û di xew de mar pê vede diqîre û meriv dengê wî nabihîze. Çewa ku di Hedîsa Buxarî de ye.

SUAL(A GORÊ-w) BI ÇI ZMANÎ YE?
Qestelanî gotiye:
- Zahirê hedîsa "Ma kunte teqûlû fî hazîhîr'reculî" divê ku bi Erebî be.

Bacûrî gotiye:
- Her kes, bi luxet û zmanê xwe tê sualkirin.
Suala Ereba, bi Erebî. Ya Kurmanca, bi Kurmancî ye û hakeza (herweha-w). Qewlê sehîh ev e ah.

Teqwiya Qestelanî hatiye kirin, ku: Hinka guhdarî kirine, dengê "sual"ê bi Erebî hatiye wan. "Cemel".

Belqînî gotiye:
- Sual, bi Suryanî ye.

Îmamê Syûtî gotiye:
"We mîn 'ecîbîn ma tere-l 'eynanî

**Ennes'suale-l qebrî bîl Suryanî**
**Efta bî zalîke şeyxune-l Belqînî**
**We lem ere lî xeyrîhî bî 'eynî"**

Li ser gotina ku "Sual, bi Suryanî ye" çar kelîme ne: "utruhîn" (Bi tîpa "h"a di serê navê Harûn de-w), "utruhîn" (Bi tîpa "h"a di serê navê Hemîd de-w), "karihîn", "salihîn".
Mana wan:
1- "Qum ya Ebdulah!"
2- "Fî men kunte?"
3- "Men rebbu ke we ma dînu ke?"
4- "Ma teqûlû fî hazer'reculî ellezî bu'îse fîkum we fîl xelqî ecme'în?"

Warid bûye, ku hifza (jberkirin-w) van her çar kelîma, delîla xatîmeya hesene ye. "Bacûrî".

Şeyx Ebduezîz el Debbax gotiye:
- Sual, bi Suryanî ye. Lewra luxetê melaîket û erwaha Suryanî ye. Evê ku cewaba Munker û Nekîr dide, ruh e, ne cesed e.

Sual: "Mmezaz hu?"
Cewaba meyit (mirî-w) ku mumin be: "Mmerad ezîr hu".
Her herfekî ji sualê û cewabê, îşaret e bi bal çend mana ve.
Tefsîl, di "Ibrîzî" de ye 121.

Piştî sualê, qebr li merî tê hev. Kes ji guvaştina qebrê xilas nabe, heta bi zarûka jî. Lewra Îbrahîmê kurê Pêxember sew, jê xilas nebûye, ku Hedîsa Ebû Ne'îm dibêje.

Di Hedîsa Nesaî de:
- Se'd binu Me'az dema şehîd ket 'erş hejiya, derê asîman

vebû heftê hezar melaîket nazilê ser cenazê wî bûn. Digel wî qasî, qebr lê hate hev parûxanê wî di hev re bihartin ji (bo-w) peşkê mîzê.
Tefsîl di "Şerh-ul Sudûr"a Îmamê Syûtî de ye.

'Ezabê qebrê, ji fesadî û ji peşkê mîzê ye. Çewa ku di Hedîsa Buxarî û Muslim de ye.

Di Hedîsa îbnu Şeybe de: "Tenezze hû mînel bewlî fe înne 'ammete 'ezabî-l qebrî min hu" (Xwe ji mîzê biparêzin, lewra pirê ezabê di gorê de jê ye-w).

FEWAÎDUN (Piraniya "feyde"-w):
1- Zikra qebrê li gor xalibî ye, sual û 'ezab ji miriya re heye. Çi di avê de bixeniqe, çi di zikê heywana de be, çi bişewite bi ber bayê keve. Lewra dibe ku ruh bikeve cuzekî tenê û dibe bikeve tevî. Em, bi ehwalê alema berzex nizanin.
2- Di Hedîsa Tirmizî de: Qebr yan bexçekî cennetê ye, yan goreke (kûre-w) agir e. Murad pê "bexçe" û "agir" alema berzex in, ne cennet û cehennema heqîqî ne.
3- Kesê salih ku ruh lê dizivire, li nik sualê zen dike, ku roj li ber ava ye û ji xew şiyar bûye. Dibêje: "Bisekinin, (da ku-w) ez limêj kim".
4- Însan ku dengê 'ezabê qebrê bibihîzin, li ser halê xwe namînin. Lewra ji dengê brûskê şedîdtir e. Hem wê kafir tev misilman bibin. Lewra dibe 'eyanî, hikmeta -ku îmana bi xeybîye -îlahî dikeve tehtîlê
5- Înkara melaîketa kufr e, ji xeyrê Munker û Nekîr. Lewra xîlaf di (hebûna-w) wan de heye. Înkara wan fisq e, ne kufr e. "Tenwîr-ul Qulûb".
6- Ev beyt (a 67 an-w) redda hinek Mu'tezîliyan û hinek Rafiziyan dike, ku 'ezabê qebrê û sualê înkar kirine. Çima

Institut kurde de Paris

ku bi çav nabînin! Digel ku ayet û hedîs pir îsbata wê dikin.

**68- Di heşrê terazî û mîzan heye**
**Xerabî û qencî û kêşan heye**

(Di Çapa Destnivîs de,rêza pêşî weha ye:
"Di heşrê terazû û mîzan heye"-w)

HEŞR: Kombûna însana û heywana û cina di erda axretê de, ji bo hîsaba 'emelê qenc û xirab.

TERAZÎ Û MÎZAN: Herdu yek in; navê aletê weznê ne. Murad pê, aletê ku 'emelê qenc û xirab pê tê wezinandin.

Mîzan: Heqîqî ye, du kefê wê hene û zmanê wê heye -ku stûna nîvê wê ye- çewa ku Îbnu 'Ebbas gotiye:
- Kefa rastê ji nûrê ye cihê hesenata (qenciyan-w) ye, li hember cennetê ye. Kefa çepê cihê seyyîata (xirabiyan-w) ye, ji zulmetê ye li hember cehennemê ye.

Mîzan, yek e li nik Cumhûr. Cem'a wê di ayeta: "......" Ji bo mezinaya wê ye, weya ji bo ku pir 'emelan pê têne wezinandin.

Îmamê Şe'ranî li ser mewazîna (mêzînan-w), xeber daye. Bi delalî ku te divê, here li "Waqîyet"ê binhêre.

XERABÎ Û QENCÎ: Yanî 'emelê qenc û xirab ku însan di dunyayê de dike, di axretê de heye, îsbatkirî ye. Lewra tiştek ji 'ilmê Xwedê te'ala xaîb nabe: "......"
Hem lewra hemî 'emelê 'îbada di defterê melaîketa de ni-

vîsandî ne ji bo cerya ser 'adetê. Çi ef'al, bi delîla ayeta: "......". Çi eqwal, bi delîla ayeta: "......". Çi niyet û tesewwurat, bi delîla ayeta: "......"
"Sirr" (bêjeyek di ayetê de-w) hedîsa nefsê ye. "Necwa" (bêjeyek di ayetde-w) peyva bi dizî ye.

S: Melaîket bi xeybê nizanin bi delîla ayeta: "......". Çewa niyet û sirra dinivîsin?

C: Ji her tiştî re 'elamet heye. Însan ku qesd û niyeta wî qenc be, bihna miskê ji devê wî tê, ku xirab be bihna genî ji devê wî tê. Melaîket bi bihnê zanin weya keşf ji wan re çêdibe, wekî ewliyayê ummetê.

Di vir de xîlafa Îmamê Henefî heye, ku gotiye:
- Melaîket, esrarê qelbiye nanivîsin. Lakin hîsab her heye, bi delîla ayeta: "......" û ayeta:"......"

KÊŞAN HEYE: Yanî wezinandina 'emela heqq e, sabit e.

Mu'tezîliyan înkar kirine. Lewra (gotine-w): "'Emelan, 'erz û me'anî ne, qebûla wezinandinê li xwe nakin".

Cewab: Defterê 'emela têne wezinandin, ne 'emel bi xwe. Çewa ku di Hedîsa Tirmizî de dibêje:" Not û neh defterê zilamekî ji ummetê tev ji guneha ne, têne danîn di fereke mêzînê de, paşê kaxizekî biçûk tê de kelîma şehadetê heye tê danîn di fera dî de, wan deftera dadigerîne.
Weya emê bêjin: Hersê qismê 'emelan dibin ecsam. 'Emelê qenc dibin cismên nûranîye, ê xirab dibin cismê zulmanîye têne wezinandin. Her kes 'emelê xwe bi çavê xwe dibîne, çi pir çi hindik. Bi delîla ayeta: "......"

Eksерê mufessira "mudaf"ê teqdîr dikin, dibêjin: "yere hu", "ey yere cezaehu, ey cezau 'emelîhî".
Lakin hemla ayetê li ser zahirê wê qenctir e. Lewra şerrê biçûk tê 'efûkirin, cezayê wê tune. Bi delîla ayeta: "......" û hedîsa ku dibêje: "Gunehên biçûk bi ava desmêjê 'efû dibin". Çewa ku kitêbê Fiqhê dibêjin.
Îlahim, ku murad bi dîtina ceza, dîtin û zanîna bi teswîra ceza di hisa wî de, bê elem û eziyet e. Lewra esil di kelama de, 'edemteqdîr e. Hem lewra muwafiqê nezeriyatê hikmetê ye.

Se'dedînê Teftezanî di "Şerh-ul 'Eqaîd"ê de îsbat kiriye, ku:
- Durust e dîtina hemî mewcûdata, çi wacib ku Xwedê te'ala ye, çi mumkin ku hemî mexlûqat in wek deng û te'm û bihn û -'ilm û îradetê. Lakin em nabînin.
Lewra Xwedê te'ala dîtina wan bi hawayê ku bibe adet, îcad nekiriye di 'ebda de, ne ku dîtina wan memnû' e. Dîtin mumkin e, belkî waqi' bûye. Lewra sabit e bi hawayê xarîqul'adet, ku ehlê keşfê suretê 'emelan dibînin di 'alema mîsalî de. Heta zanin ku hersê qismê 'emela sabit in, di dunyayê de dewam dikin.

Ustad Bedî'uzzeman di "Mesnewiya 'Erebî" de gotiye / 174:
- Esil di tişta de beqa ye, heta umûrê seyyale ku zû zail dibin wekî kelîmat û tesewwurata. Ji wan re jî hinek cihê dî hene, di wan de muhafeze dibin ji zewalê, lakin sûreta diguhurin -ji sûretekî dikevin sûretekî, heta ku goya hemî tiştan hatine wezîfekirin ji hifza tişt re bi temamî yan bi wechekî bi îhtîmama kamil, lez dikin ji bo wî (tişt-w) birgrin û di qelbê xwe de (wê girtinê-w) deynin.
Hikmeta cedîde li vî sirrê ha, hişyar bûye, lakin bê beyan.

Loma ku xeta kir bi efratî û got: "'Edem tune mutleqa, belkî terekkub û înhîlal e". "Kella" belkî terkîb e bi sin'etê Xwedê te'ala û tehlîl e bi îzna wî û îcad û î'dam e bi emrê wî: "......" ah.

Wehîduddîn Xan di kitêba xwe de "El Îslamu Tehte Dewîl 'Ilmî" îzahek daye vê meselê. Tê de îsbat kiriye bi sûretekî qet'î, ku: Niyet û qewl û ef'alê însana tev mewûd in, di qezaê de baqî dimînin. Delîlê wî di vir de hilnayên. Gotiye:
- Zanayê 'Esrî dişixulin ku aleta çêkin, ji bo ku herekatê kesên zemanê pêşî bibînin û dengê wan bizivirînin, ku her kes bibihîze. Lê hêj negihîştine wê meqsedê. Ancax aletekî çêkirine, ku herekatê zemanekî kin çend saetî pêşiyê kare nîşan bide. Lê herekatê kevin, ji ber ku pêlê herareta wan zeîf bûne nîşan nade. Ev alet di Ingilîz û Emêrîka de tê îstî'malkirin; sûretê her tiştî dikşîne, çi di ruhniyê de çi di tariyê de. Heta şevekê di semayê Newyorkê de firokeke mechûl bihurî. Paşê bi wî aletî pêlê herareta wê teyarê tesbît kirin û şikl û new'ê wê fehm kirin ah. Ema teyb û radyo û sînema û telefizyon, ancax deng û hereketê halê hazir muhafeze dikin û neşir dikin û nîşan didin.

Ji van beyanata tê zanîn, ku nezeriya axretê ne durê vê qiyasê ye. Bêweku Xwedê te'ala hemî 'emelê 'îbada, ji zarûtiya wan heta mirina wan bi wan bide dîtin di hukmê fîlimê sînema û telefizyonê de, di ber çavê wan de bide derbskirin, da ku ji înkarê re çare nemîne. Çewa ku Ustad Bedî'uzzeman di "Buyuksozler" de gotiye.
Hem ne dûr e, ku Xwedê te'ala hemî 'emelan bigerîne ecsamê giran û bi teraziyê bikşîne.
Weya emê bêjin: Meqsed bi wezna tişta, ku mîqdarê wan xuya bibe. Ji wî qasî re alatê muxtelîfe hene, wek mêzîn û

qapanê ji bo beyana tiştê giran û saet ji eczaê şev û rojê re û îstirlab ji beyana miqdarê hereketê rojê û stêra re û termometir ji beyana dereceyê sar û germê re. Hem wek 'Erûzê ku mîzana şi'rê ye û 'ilmê Nehwê û Mentiqê ku mîzana kelamê ne.

**69- Sîrat ew pira pir bi xewf û xeter**
**Cemî'ê xelaiq dikin lê guzer**

Yanî SÎRAT ku behsa wê di hedîsa de heye, navê wê "Pira ku pir bi xewf û xeter" e. Yanî tirs û heybeta wê pir e. Lewra li ser wê, cehennema ku ji Behra Mûhît firetir e bi hezar caran, ji mû ziravtir e, ji şûr tûjtir e. Çewa ku di Hedîsa Muslum de ye.

Mu'tezîliyan înkar kirine, gotine:
- Nabe ku xelq di ser de herin, digel ku ev qas zirav e û tûj e.

Ehlê Sunnetê gotine:
- Xwedayê ku qewetê daye teyra di hewa de seyr dikin, kare însana jî li ser Sîratê bide meşandin.

'Izz binu 'Ebdusselam û Şeyxê Qurafî û Zerkeşî ev hedîs tewîl kirine, gotine: - Kînayetê ji meşiqqet û zehmetiya pir e.

Wê demê, dibe muwafiqê hedîsê ku dibêjin:
- Li herdu teniştê wê melaîket hene û tê de "Kelllûb" çengelê mezin hene, ku xelq bi wan ve dieliqin disekinin, weya di Sîratê de werdibin bi wan (kelûb-w) ve dimînin, pêtîyê agir wan dişewitînin, heta şefa'et bigehîje wan.

Institut kurde de Paris

Li ser Sîratê sitirî û dirik hene, ezyetê didin xelqê, tev 'elaqê dunyayê ne. 'Ededê wan, bi miqdarê xeta û guneha ne. Lez û paşketina xelqê li ser Sîratê, li gor cehda wan e di merdîyatê Xwedê te'ala de.
Kesê ku di dunyayê de lez bike di merdîyata de, wê li ser Sîratê zû here. Kesê ku keslanî bike, wê dereng here. Kî li dunyayê bihurandina ser sîrata îslamê kiribe adet, wê bi sehlî li ser Sîrata axretê here. Ê ku nekiribe adet, wê bi zehmetî here û nigê wî bişemite.

Alima gotine:
- Hewz û Sîrat teşkîl dibin li gor 'emel û 'ulûman. Hewz (a Kewserê-w) 'emelê şerî'etê ye, Sîrat 'emelê wî ye.
Kî çi miqdarî 'emelê şer'ê bigre û çi miqdarî pê 'emel bike, bi wî miqdarî ji Hewzê vedixwe li ser Sîratê dimeşe.
Sîrata şerî'etê li dunyayê me'newî ye, wê li wir bibe hissî, ji wê pê ve tu rê naçin cennetê: "......"

Şeyx Muhyeddîn gotiye:
- Sîrat fireh dibe û zirav dibe, bi miqdarê ruhnaya 'emelê salih. Fireya sîrata her kesî, bi miqdarê belavbûna nûra 'emelê wî ye. Lewma ji hineka re zirav e, ji hineka re fire ye, digel ku (Sîrat-w) yek tenê ye.
Û (Ş.Muhyeddîn-w) gotiye:
- Sîrata ku te digehîne cennetê, sîrata hîdayeta ku te ji nefsa xwe re çêkiriye ji 'emelê salih. Dema tu (sîrat-w) bibînî, tu nas dikî ku sin'etê te ye, te bi destê xwe bîna (ava-w) kiriye.
Wehareng e horî û qesr û baxçeyê cennetê, emelê salih in. Menazil û derkat û agirê cehennemê, netîceyê gunehkarî û bêemriya Xwedayê te'ala ne.

Institut Kurde de Paris

Di hedîsê de hatiye: "Men sella kulle yewmîn îsnetey 'eşerete rek'eten, benel'lahu lehu beyten fîl cennetî", "We men qale, subhanel'lahî -mesella- xerese lehu şecereten fîl cennetê".
Û (Ş.Muhyeddîn-w) gotiye:
- Cennet û cehennem vêgavê hene, lê bînaa wan temam nebûye. Lewra ji 'emelê mukellefan têne bînakirin. Kengê dunya qediya û zemanê teklîfê xilas bû, wê avakirina wan jî temam bibe. "El Yuwaqîyetu lî Şe'ranî".

CEMÎ'Ê XELAIQ: Temamê mexlûqatê ku îbaretê ji mumin û kafira ne.
DIKIN LÊ GUZER: Derbasî li Sîratê dikin. Yanî emrê wan tê kirin, ku di ser de derbs bibin.

Herçî kafir û gunehkarê mustehеq, wê tê werbin bikevin agir. Wê werin xwarê, wekî ku zeratê nava tîrêjê rojê têne xwar. Herçî muminê qenc, wê di ser de herin li gor 'emelê xwe; hinek wek "Terfet-ull'eyn" (Girtin û vekirina çav-w), hinek wek berqê, hinek wek bayê, hinek wek beza hespê, hinek bi beza piya, hinek bi meşê, hinek li ser çoka.
Piştî ku ji Sîratê xilas bibin, wê bikevin pirekê tê de heft 'eqebe hene. Di 'Eqeba ewel de, pirsa Kelîma Şehadetê ji wan dikin. Di ya diduwa de, pirsa limêjê dikin. Di ya sisiya de, pirsa rojiya remezanê dikin. Di ya çara de, pirsa zekatê dikin. Di ya pênca de, pirsa Hec û 'Umrê dikin. Di ya şeşa de, pirsa desmêj û xuslê (tahfîlkirin,şûştin-w) dikin. Di ya hefta de ku ji teva zehmettir e, pirsa zilm û niheqiya li mexlûqa dikin.
Kesê ku di van 'eqeba teva de cewab bide û sûcê wî tune be, wê here cennetê. Kesê ku di yekê de qisûr kiribe, wê di 'eqeba wê de bimîne heta ku Xwedê te'ala hukmê xwe li ser carî bike. Lê nakeve agir. Lewra ji Sîrata Mezin xilas

bûye. Çewa ku Îmamê Xezalî û Şe'ranî gotine.

Gelek alima gotine:
- Sîrat, ji bo îmtîhana muminê qenc û xirab e. Yanî kafir naçine serê, wê ji ewel ve herin agir. Lewra musteheqê ceza ne, îmtîhan ji wan re tune. Lakin esseh ew e, ku Şeyxê Xanî gotiye ku: Wê her kes here ser Sîratê, îla wanê ku sutûkî ji agir dertê û wan ji nav ehlê mehşerê hiltîne, dixe cehennemê. Weîlla wanê ku bê hîsab diçine cennetê. Lewra hedîsê sehîh di heqê wan de hene.

**70- Cehennem di bin da û cennet li pêş**
**Li ser wê Îlahî tu destim bikêş**

**71- Wegerne ezî mucrimê bed'emel**
**Dizanim ku dê bête pê min zelel**

**72- Bi zenb û qusûrê di min tu nekî**
**Digel min bi îhsan û lutfa xwe kî**

**73- Min û cumleyê ummeta Mustefa**
**Bibî cennetê tabi'ê Mustefa**

**(Ev beyt di Paça Destnivîs de weha ne:**
**70- "Cehennem li bin da û cennet li pêş"**
**71- "Dizanim ku dê bête ser min xelel"**
**72- "Bi fê'lê di min ya Îlah tu nekî"-w)**

LI SER WÊ: Li ser Sîratê.
WEGERNE: Eger tu destê min negrî bi rehmeta xwe min derbas nekî, ya Îlahî.
EZÎ MUCRIM: Ez ê ku xweysûc im.

Institut Kurde de Paris

BED'EMEL: Ez ê 'emelxirab.
ZELEL: Şemitandin.
Yanî: Ez dizanim ku wê nigê min ji ser Sîratê bişimite, ezê bikevim cehennemê. Lewra musteheqê 'ezab im.

Di hedîsê de hatiye: Ê ku li ser Sîratê dişimitin, pir in. Pirê wan, jin in. Û hatiye: Dema ku xelk diçine ser Sîratê, dengek ji bin 'Erş dibêje:
"Herçî mumin bibhurin li ser Sîratê, herçî bêemriya Xwedê kirine bira bisekinin: Fe ya leha mîn saetîn".

Û hatiye (gotin-w) ku: Kesê di 'irzê birayê xwe yê mumin de peyivî be, tê hebskirin û jê re dibêjin: "Îsbat bike wî tiştê ku te di heqê birayê xwe de gotiye". Eger îsbat neke, wê bişemite nav agir. "Tezkîret-ul Îmam-îl Qurtebî".

DIGEL MIN: Yanî bi min re mu'amele bike ya Reb bi îhsan û lutfa xwe.
TABI'Ê: Pê re. Yanî me bibe cennetê bi peyrewiya Muhemmed Mustefa sew. Teme.

Bi alîkariya Xwedayê kerîm û hekîm, me te'lîfa vê Şerha delal û nefîs temam kir, di meha Cemazîyelewel da 1404 h. Sibat 3/1399 romiye. Şubat 16/1984 mîladiye, yewm-el xemîs.

Institut kurde de Paris

٥ دحشري ترازو وميزان هيه ؛؛ خرابي وقنجي وكيشان هيه ٥

٥ صراط اوپراپ بخوف خطر ؛؛ جميع خلائق دكن لي نظر ٥ كذ دبر

٥ جهنم لبنڌا وجنت ليش ٥ ؛؛ لسراوي الٰهي تو دستم بكيش ٥

٥ وكرنه ازي مجرمي بدعمل ؛؛ دزاتم كودي بيته سرمن جلال ٥

٥ بفعل دمن يا الٰهي نكي ؛؛ دكل بلطف باحسان لطفا هوكي ٥

منو جمله امتا مصطفى

بهي جنتي تابع مصطفى

٢٢٢٢٢٢
٣٣٣٣٣
٢٢٢٢٢
٢٢٢
٤٤
٤

Institut kurde de Paris

◦ دپی ویقه عثمان بحق بو حکیم ۞ دعلم علیم دحلم حکیم ◦

◦ ژکرار افضلتره بی کا ن ۞ اقه اعتقادا مه درحق وان ◦

◦ دپی وان علی صاحب ذو الفقار ۞ سوار لدلدل شهی نامدار ◦

◦ تفوق لسری دمای هیه ۞ بمعنی برای رسول میه ◦

◦ شفاعت دکن اولیا و انبیا ۞ باذنا خدی بو کسی اشقیا ◦

◦ دغیبی حضوری دعایه اثر ۞ دبیت ژبورا ایا با خبر ◦

◦ بفعلی دقنج تو مکه منتی ۞ بفضلا خدی دی بچی جنتی ◦

◦ بهشت و جهنم هبن فی دمی ۞ فنا نابن او ناچنه عدمی ◦

◦ یقین دی ببیتن دیوم القیام ۞ حسابا حلالی و عذابی حرام ◦

◦ ژبو اهل خیران نجات و رضا ۞ ژبو اهل شران عقاب و جزا ◦

◦ دقبریدا دی بت ژخلقی ری ۞ سوالا نکیری دکل منکری ◦

Institut kurde de Paris

٥ بطاله تناسخ محاله حلول ، مګه اتحاد دویتشتان قبول ٥

٥٥ اګر تشتګی پر مجزا بکن ، قبول ناکت ایدی تجزا بکن ٥

٥٥ هیولا تنین عدیم عدیم ، دنی کافر ای دیثرن قدیم ٥

٥٥ بمکه لج دلقمان و اسکندری ، ژبو وان نه معروف پیغمبری ٥

٥٥ یزیدی مری لعنتی لی مګه ، پلید خبیث خو تیکل مکه ٥

٥ ملایک شیاطین جنان وجود ، هین تا نګی بوناوان مجود ٥

٥ وکی یکن اف هر د بثیک تمام ، درزق تید حلال و حرام ٥

٥ بیژ مته فضلا صحاب رسول ، بجان باوره بدلکه قبول ٥

٥ ابوبکر صدیقه یاری شفیق ، او تانی اثنین دغار رفیق ٥

٥ ژاول دفضلا صحاب سرمداوه ، کریم عزیز صاحب کرامتاوه ٥

٥ دلی وی بحق عمر دین پنا ، بفتحی دوی شانه خوندکار ٥ شاه

٥ خلافت ګمر ژبو مجالاوی بت ، ژحکم وی یشتا مخالف شکست ٥

٥ لموافق ببن قول نیت عمل ،، لبا مه دبیت ایمان به خلل ٥

٥ مروفی بایمان د دوزی بقیم ،، تا سیبت بزان تو حکیم ٥

٥ مسلمان بقتل و زنا یی توجار ،، نه کافر دبت نه مخلد دنار ٥

٥ ژ معصیتان واجبه توبه زو ،، کنه نینه توبه دقیتن لدو ٥

٥ نه معذوره جاهل کو غافل بتن ،، ژ خالق بجهلا خو غافل بتن ٥

٥ مروفی نزانه دلیلان درست ،، دبیژن بتقلید ایمان درست ٥

٥ د وقتی عذابا خدی کت نزول ،، بر کافران دانینه ایمان قبول ٥

٥ وکی ژ بو عاصیان نینه توبه رجوع ،، ژ وقتا کی روژ ژ مغرب به طلوع ٥

٥ ژ فعلا کناهان له نبی نه بری ،، ژ قسم ژنان نینه پیغمبری ٥

٥ ولیان کرامت دکن ژی ظهور ،، دکن حرف عادت کلا ژی صدور ٥

٥ خدی دی ببینن مسلمان بچاف ،، وکی لصایی بتن هیفا اشتقاق ٥

٥ ژ بیر دی بکن نعمتا جنتی ،، وکی بدستکفه دولتا رؤیتی ٥

Institut kurde de Paris

۰ محقق بزانن وی خذی دیتیه ۰۰ نهایت نزانت حقیقت چیه ۰

۰ ژبووی تنینه نه مثل و تشبیه ۰۰ کسی وصف بکت دیچه بنزت ۰

۰ صفات دسبعه ژبوذوالجلال ۰۰ بزانن ای حفتن ای عارف بالکمال ۰

۰ حیات و زانین قدرت و فین کلام ۰۰ بهستن دکل دیتنی بو تمام ۰

۰ قدیمن وکی ذات جمله صفاته ۰۰ نه عینی ذاتینه نه غیر ذات ۰

۰ خذی نینه جوهر نه جسم نه عرض ۰۰ نه کل نه بعض بزانن بی غرض ۰

۰ اگر بی گنه مه معذب بکت ۰۰ ژبووی هیه مه مودب بکت ۰

۰ روایه بکت او لعبدی مشاق ۰۰ بقهرا خو تکلیف ما لا یطاق ۰

۰ نطلبی اگر او تکلف بکت ۰۰ د ملکی خدا او تصرف دکت ۰

۰ لیه فرضه هرچی ژبووی بکیر ۰۰ نه فرضه لوی یا ژبو مه بخیر ۰

۰ ارادت دکت او بخیر و شر ان ۰۰ رضا نینه اما بفعلا شر ان ۰

۰ بزان بنده مختار فعلا خویه ۰۰ نه خالق نه مجبور فعلا خویه ۰

Institut kurde de Paris

۰ رسول دوی جمله حقن تمام ۰۰ خصوصا محمد علیه السلام ۰

۰ کو سر دفتر جمله عالم اوه ۰۰ بنوته مکتوب وخاتم اوه ۰

۰ خدی افریناند ژبو وی فلک ۰۰ ژبو خدمتا وی شهاندی ملک ۰

۰ کو قران ژ عرشان دگل وی هنار ۰۰ ژبو حبیبی خوه اختیار ۰

۰ ژ بال خو براقک ژوی راشیاند ۰۰ لزینک مزین اورو نیاند ۰

۰ براق دگل رفرف دست بدست ۰۰ بامری خدی اوبرن بیشی دست ۰

۰ د حفت اسمانان خدی اوکراند ۰۰ بقاسی دو قوسان بال خو کهاند ۰

۰ هلا نین خدی پرده ژ الکر نقاب ۰۰ جمالا خدی دیت اوی بی حجاب ۰

۰ دو جاران بچاقان جمالا وی دیت ۰۰ لضر هلاء دبیژن نه دیت ۰

۰ مبه سببی منکری قدر ژای ۰۰ ژ خلقی تمارون علی ما یری ۰

۰ اگر تو دبیژی لکو دی خدا ۰۰ خدی کو لنک سدرة المنتهی ۰

Institut kurde de Paris

في بيان العقيدة ه والله سنة ١٢٧٨ ه صيد ذكره احمد الخاني دي

ه لباته محقق بتن اقجواب ه دهي كوته من هاتفي لي بجاب ه

ه سا حمد ثنا ك بقول صحيح ه لتوحيد باري بلفظ فصيح ه

ه خدي بكه بي هثر بو بي مقال ه نه معزوليه نه من نه زوال ه

ه نه اصل و نه فصل نه د ونه باه هيه ه وهيناوي نابت حساب ه

ه ز بووي تنين جهات مكان ه نه ماند و مثل و نه همتا نشان ه

ه مكانان مبينه ز بووي روا ه نهايت على العرش قد استوى ه

ه لوير ابنورن نه وقت و زمان ه نه سال و نه ماه و نه حين و نه ان

ه ابد وي هبتين ازل هر هيه ه د دنيا و عقبى خداني ميه ه

ه اوي افرينانند مو جمله خلق ه نهين غير وي فقط تو خالق بحق ه

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris